

FOLKLOR Û ZIMAN

Kovara Akademîk û Navneteweyî ya Xebatên Kurdî

International Academic Journal of Kurdish Studies

Cild/Volume: 3 Hejmar/Issue: 2

Çirîya Pêşîn, 2022



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ

Folklor û Ziman

Cild: 3

Hejmar: 2

Sal: Çirîya pêşîn, 2022

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê Selim Ölçer

Berpirsa Nivîsan: Gevriye Atlî

Edîtor: Mustafa Aslan, Mikail Bûlbûl

Redaksîyon: Mikail Bûlbûl

ISSN: 2667-6435

Mîzanpaj: Ali Gümüşel - aligumusel@gmail.com

Berg: Ali Gümüşel

Navnîşan: Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađlık ve Kùltür Vakfı

Urfa Yolu Üzeri, Çeysa Serhat Plaza. A Blok Kat:11 No:29

Çapxane: Bizim Büro Matbaacılık Zübeyde Hanım Mahallesi, 1. Cd. Sedef

Sok. 6/1, 06070 İskitler-Altındađ / Ankara

Numraya Sertifikayê: 12469

Edîtor

Doç. dr Mustafa Aslan (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Mikail Bûlbûl (Weqfa Mezopotamyayê - Tirkîye)

Lijneya Edîtorîyê

Prof. dr Celilê Celil (Institut für Kurdologie - Awisturya)

Doç. dr Necat Keskin (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Mehmet Tayfun/M. Malmîsanij (Zanîngeha Mardin Artukluyê -Tirkîye)

Dr Hemin Omar Ahmad (Zanîngeha Soranê - Kurdistan/ Îraq)

Dr Ramazan Pertev (Zanîngeha Rouen Normandîyê - Fransa)

Lijneya Şêwirmendîyê

Prof. dr Ebdulwehab Xalid Musa (Zanîngeha Newrozê - Kurdistan / Îraq)

Prof. dr Sabah Reşîd Qadir (Zanîngeha Raperînê - Kurdistan / Îraq)

Prof. dr Farûk Îsmail (Frei Universität Berlin - Almanya)

Prof. dr Şukrîye Resûl Îbrahîm (Zanîngeha Tîşkê - Kurdistan/ Îraq)

Prof. dr Tahirhan Aydın (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Prof. dr Bahîz Omar Ahmed (Zanîngeha Duhokê - Kurdistan / Îraq)

Doç. dr Abdurrahim Özmen (Zanîngeha Dicleyê -Tirkîye)

Doç. dr Bextiyar Secadî (Zanîngeha Kurdistanê - Îran)

Doç. dr Mehmet Zahir Ertekin (Zanîngeha Bîngolê - Tirkîye)

Doç. dr Mustafa Öztürk (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Shahab Valî (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Süleyman Şanlı (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Canser Kardaş (Zanîngeha Mûşê - Tirkîye)

Hekemên Vê Hejmarê

Prof. dr Tahirhan Aydın (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Doç. dr Mustafa Aslan (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Doç. dr Canser Kardaş (Zanîngeha Mûşê - Tirkîye)

Doç. dr Mustafa Öztürk (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

Dr Ramazan Pertev (Zanîngeha Rouen Normandeyê-Fransa)

Dr Şehmus Kurt (Zanîngeha Mardin Artukluyê - Tirkîye)

NAVEROK

Gotar

Şopên Gireyên Derûnî di Dastanên Kurdî yên Folklorî da

Omeed Sagvan Ahmed 145-170

Dengbêjîya Jinan di Radyoya Erîvanê da

Habibe Polattağ 171-199

Wergêran

Pêveberên kompleks ên nav+kar di kurmancîyê da.

Geoffrey Haig 201-248

Paşeroja Zimanê Kurdî

Michael L. Chyet 249-258

Nasandina Pirtûkan

Kitabê “Deyîranê Qerebegan û Sîwanî ser o”.

Bilal Zilan 261-266

Nasandina Pirtûka “Meryemîgare”yê

Mustafa Zengin 267-271

Ji Edîtoran

Em bi hejmareka nû li pêşberî we ne. Di vê hejmara nû da gotarên zanistî, analîza berheman û nirxandina pirtûkan hene. Em dikarin bi kurtî wan weha vebêjin:

Omeed Sagvan Ahmed, di gotara xwe da, ku bi navê “*Şopên Gireyên Derûnî di Dastanên Kurdî yên Folklorî da*”yê ye, li ser çar destanan folklorîk; Zembilfiroş, Hesoyê Şivan, Edûla Mistefabegê û Narîna Binefşî sekinîye û di van destanan da, di çerçoveya teorîya psîkoanalîtîk da analîza rengvedana kompleksên derûnî kirîye.

Habibe Polatdag jî di gotara xwe da ku bi navê “*Dengbêjîya Jinan di Radyoya Erîvanê da*”yê ye, li ser dengbêjîya çar jinên dengbêj, Fatma Îsa, Aslika Qadir, Belga Qado û Zadîna Şekir sekinîye û bi firehî hem behsa dengbêjîya wan kirîye hem jî nirxandina astengî û derfetên ku ji bo wan çê bûne, kirîye.

Di hejmarê da me cih daye du gotarên li ser zimanî ku ji îngilîzîyê hatine wergêran ku her du jî pir giring in. Ya pêşî gotara Geoffrey Haigî ye ku ji bo rêzimana kurmancî gelekî nirxdar e û ji aliyê akademîsyen Umran Altunkiliçî ve hatiye wergêran. Haig di gotara xwe ya bi navê “*Pêverên Nav+Kar di Kurmancîyê da*”yê da li ser pêveberên kompleks ku ji navekê û kareka alîkar pêk tê, sekinîye analîza rewşa wan ya argumentî û morfosentaktîk kirîye.

Gotara din a wergêranê jî ya Michael Chyetî ye û wî bi xwe jî îngilîzî wergerandiye kurmancîyê. Cyhet di gotara xwe ya bi navê “*Paşeroja Zimanê Kurdî*”yê da li ser stratejîyên nêzîkkirina kurdîya kurmancî û kurdîya soranî sekinîye û bal kişandiye ser helwestên negatîf û cudaker ku zîyanê dide prosesên standardîzasyonê.

Di beşa nasandina pirtûkan da jî du nivîsar hene ku yek bi kurdîya kirmanckî, yek jî bi kurdîya kurmancî ye û her du jî li ser folklorê kurdî ne. Ya kirmanckî li ser pirtûka Îdrîs Yazarî ya bi navê “*Deyîranê Qerebegan û Siwanî Ser o*”yê ye û ji aliyê Bilal Zilanî ve hatiye nivîsîn. Ya din jî li ser pirtûka “*Meryemnîgarê*”yê ye ku xebateka berhevkarîya çîrokan e, nivîskara pirtûkê Evîndar Şevîn e û Mustafa Zengîni li ser nivîsiye.

Ji bo vê hejmarê jî gelek kesan ked dan û alîkarîya me kir. Bi taybetî em spasîya hemû hekeman dikin ku bi xêra wan û têbînîyên wan gotar gelekî baştir bûn.

Edîtor

Mustafa Aslan, Mikail Bülbül

Sagvan Ahmed, O. (2022). Şopên gireyên derûnî di dastanên kurdî yê folklorî da. *Folklor û Ziman*. 3(2), 145-170

Wergirtin/received: 07.09.2022

Qebûlkirin/accepted: 27.09.2022

ORCID: 0000-0002-3417-520X

ŞOPÊN GIRÊYÊN DERÛNÎ DI DASTANÊN KURDÎ YÊN FOLKLORÎ DA

Omeed Sagvan Ahmed*

Kurte

Ev xebat lêgeryaneka derûnşikarî ye li jêr nav û nişanê şopên girêyên derûnî di dastanên folklorî yê kurdî da. Ji bo vê xebatê çar dastanên folklorî hatine hîlbijartin (Zembilfiroş, Hesoyê Şivan, Edûla Mistefabegê û Narîna Binefşî). Bizav hatîye kirin, kesayetên evan dastanan çî wekî leheng yan jî karakter ji layê girêyên derûnî ve bihên şirovekirin. Berhemên folklorî bi taybetî janrê vegêrankî nimûneyên baş in bo evan core xwandinan, ji ber ku hemû mijarên tabû yê ku girêdayî bi hezên kîpkirî û evîndariya qedexê bi şeweyeka nerasterast, xwe di van vegêranan da dibînin, çî efsane, dastan, çîrok û hikayetên folklorî bin yan jî berhemên hunerî yê nivîskaran bin. Jixwe ev janrê vegêrankî cihê veşartina girêyên derûnî ne û navê gelek girêyên derûnî ji van efsane û hikayetên folklorî yê yunani û cihanî hatine û bûne kereste bo rêbaza derûnşikariyê.

| 145

Ev xebat li jêr bîr û boçûnên Sigmund Freudî û hevalên wî hatîye encamdan, herwesa mifa ji boçûnên derûnnasên serdemê hatîye wergirtin, û hindek cihan jî mifa ji rêbaza hevberkirinê hatîye kirin.

Peyvên Sereke: Folklor, dastanên kurdî, rêbaza derûnşikarî, girê, seks.

* Peymangeha Teknik a Taybet a Rewandîzê, Liqê Zaxoyê. Kurdistan/Iraq
E-mail: omed.zamdar@yahoo.com

**TRACES OF PSYCHOLOGICAL COMPLEXITIES
IN KURDISH FOLKLORE EPICS**

Abstract

This research focuses on the psychological complexities in four Kurdish folklore epics; (The Basket-Seller, Hasso, The Shepherd, Adol, The Daughter of Mustafa Beg, Narin of Binafsh). Each of the characters of these epics will be analyzed so that their psychological complexities could be detected. Kurdish narratives in folklore tales are the best examples for explicating various psychological desires especially when such desired are buried in the unconscious part of the brain. Such folklore narratives, whether they are stories, myths, epics, or artistic writings of authors were intrinsically being taken from Greek mythical stories, while in fact such stories are imbued with complicating psychological conflicts to be analyzed in terms of the theory of psychoanalysis. The researcher heavily relies upon the theory of psychoanalysis by Sigmund Freud. The researcher further makes use of the theories of the other modern psychologists to analyze the characters of the four major epics.

Keywords: Folklore, Kurdish epics, psychoanalysis, complex, sex.

Destpêk

Hemû deman zanista derûnîyê, ji bo bi serhîlbûna raz û nepenîyên mirovî, berê xwe daye edebiyat, efsane û hikayatên folklorî. Folklor ji bo xwendingeha derûnşikarî meydana xebatê û vekolîne bû. Sigmund Freud (1939-1856) bi xwe di pirtûka “Totem û Tabû”yê da wê çendê dihînite ziman û dibêjît: “Em bi rêka jibermayî, amraz, kereste, berhemên hunerî, aydoloji û ayînî yê ku mirovê ji berî mêjûyê bo me bi cih hêlane, rasterast yan nerasterast bi rêka vegêrana efsane, çîrokên cinan, perîyan em ji wan agahdar bûne” (Freud, 2005, r. 22). Anku bi rêka evan vegêranan em zanyarîyan li ser mirovên ji berî xwe dizanin û xwe da dihêlin nav jîyana wan û derûnîya wan. Herwesa “ji bo naskirina derûnîya civakan pêwîst e ku lêkolîner bi rêya rêbaza derûnnasîya modern kesayetiyên folklorî analiz bike û awayê derûnîya civakê derxe hole”. (Yıldırım û yd, 2013, r. 36) Me jî xwast bi rêka evê xebatê berê xwe bidin dastanên folklorî û kesayetiyên wê ji aliyê kêşeyên derûnî ve şirove bikin û bi ser rewşa wan hil bin. Me bi fer dît, em dastanên folklorî helbijêrin ji ber ku wekî tradîsyon di nav çanda gelî da berbelav e û yekî bo yekî hêlaye û heta gehîştîye roja me ya îro. Ji milek din ve folklor û berhemên folklorî gencîneya raz û nihênên civakî û derûnî ne û herwesa ev berhem dihêlin civak derbirinê ji hest û xerîzeyên xwe yê tabû bikin û bi rêka vegêranên folklorî evan xwastekan têr bikin. Ji bo vê vekolîne, ji bilî jêderên resen me mifa ji jêderên din jî wergirtine ku ew jî “Rehendî Derûnî le Şîrekanî Letîf Hellmet da” ya Hawjîn Sîlwe û “Nalî û Saykolojiyay Şîr” ya Rêbiwar Mehemd Melazade ye. Bi rêka van berheman me berê xwe daye nêrinên qutabxana derûnşikarîyê.

147

Ev xebat ji du beşan pêk dihêt, di beşê yekê da me behsa çemkê girêyên derûnî kirîye û herwesa corên wan jî me dîyar kirine. Di beşê duyê da me çar dastanên folklorî (Zembîlfiroş, Hesoyê Şivan, Edûla Mistefa Begî û Binefşa Narînî) helbijartine û me kirine meydana xebata xwe û me bizav kirîye şopên girêyên derûnî li gor boçûnên rêbaza derûnşikarî û derûnnasên serdemî di evan her çar dastanan da şirove bikin. Herwesa mifa ji rêbaza hevberkinê jî hatîye wergirtin

1. Girê, Çemk û Pênase

Girê yan jî girêya derûnî, hizrek yan komeka hizrên têkel û hevgerî ne, enerjîyek sozawî tê da derbaz dibit û paşî tûşî tepisandin û kipkirina beşî yan giştî dibit û dibit sedemê kêşe û nakokîyan. Di zimanê îngilîzî da ji vê çemkê ra dibêjin “Complex” û di zimanê erebî da “Iqde Alnîfsîye” dibêjin. (Şerîf, 1985, r. 33). Di zimanê kurdî da jî “Girêya Derûnî” û “Alozî” dihêt bilêvkerin (Bokanî, 2004, r. 14).

Dîroka bikarînan evê termê bo derûnnasê nemsawî Sigmund Freud vedigerit. Ew yekem kes bû ku behsa evê termê bi awayekî têt û tesel kirîye û xistiye ber tîşkên lêkolînê û vekolînê, bi merema vedîtî û perdeladan li ser hez û tirs û girêyên nestî (binhişî). Ewî rêbazeka taybetî di vî bîyavî da afirand, ew jî rêbaza “derbirîna azad” ku şîya di rûniştinên xwe yên şirovekirina derûnên nexweşan da bi kar bihînit û şîya gelek eger û hokarên veşartî yên nestî xuya bikit (Freud, 2017, r. 55). Li gor nerîna Freudî, girê cihê xwe di nava nestê mirovî da çê dikit û bandorê li ser reftar û kiryarên mirovî dirust dikit, bê ku çi zanyarî li ser hebin. Anku kogeha evan girêyan nest e û ew der cih û warê wan e (Freud, 2017, r. 55).

Girê berpêşek nestî ye û haya mirovî jê nîne, dîsa tak û rihên wê jî nahêt zanîn. Bi rêya binhişiyê dihêt aşkerakirin û bi taybetî bi rêya xewnan û reftara mirovî ya neasayî. Wekî hezkirina zêde ya kurî bo dayikê, yan jî kerbek zêde ya kurî bo babî, xuşk bo birayî, bira bo xuşkê. Ji bo vê yekê bi nerîna Freudî xewndîtî û berhemên edebî baştirîn belge ne. Ji ber ku girêyên derûnî bi rêya binhişî dihêne aşkerakirin û binhişî jî beşê herî kûr ê eqlê mirovî dihêt hijmartin û sindoqa zanyarî û rûdanên bihorî û hezên kipkirî û tepisandî ne (Freud, 2017, r. 55). Dîsa Freud tekezê li ser hindê dikit ku çi mirov nîne bê girêyek derûnî û raman jî girêyê babetek vebire (Freud, 2017, r. 60).

148

Li vê derê bo me ew çende diyar dibit, hebûna girêyên derûnî li nik her takekesekî, ne bi arezû û îrada wî ve girêdayî ye, belkî xala bingehîn li vê derê binhiş û xwastekên tepisandî ne. Lêbelê ev xwastek û pêdawîst e zû bi zû nahête hestpêkirin, gelek ji wan di binhişî da dimînin, qet carekê jî reng e nehên diyarkirin, lê hindê jî bi rêka reftar û xewndîtî dihêne penîkirin. Lewra xewndîtî di rêbaza derûnşikarî da gewherê şirovekirina reftar û kesayetîya veşartî ya her takekesekî ye û herwesa amrazê aşkerakirina girêyên derûnî ne. “Xewn pêşbînî ji dahatûyê nakit, belku fênomênek e perdê li ser hevrikîyên seksî yan wijdanî radikit yan wijdanê vedimalit û di xewê da bîner li wî çaxî di destî da dinalit yan derbirîne ji wan pêwîstên tepisandî yên serdema zarokîniyê dikit.” (Slîwe, 2013: 67- 68). Girêyên derûnî jî piraniya caran jêdera xwe ji serdema zarokîniyê werdigirt, bi taybetî Girêya Odîpî.

2. Corên Girêyan

Corên girêyên derûnî gelek in, hindê jî wan nêzîkî hev in û hindê jî berûvajî hev in û ji yek dûr in, em dê li xwarê corên girêyan rêz bikin û yek bi yek behsa wan bikin.

1.2. Girêya Odîpî (Oedipus Complex)

Girê yan jî em bibêjin aloziya Odîpî, yek ji wan karên herî giring yê Freudî ne. Ev term ji şanogerîya Kral Odîpî ya Sofuklisî hatîye wergirtin û bûye çemkeka giring di cihana psîkoanalîzê da. “Girêya Odîpî ji aliyê zanistî ve dihêt hêjmartin, corek ji şepirzebûn û têkçûna derûnî li ba zarokî ku du caran tûş dibit. Bi taybetî di geşekirina derûnî û seksî da, bi wî awayî dikevit pêşbazîyê, ji bo ku berî babê xwe bikevit û dayikê wekî dîyarîyekê bi destê xwe ve bihînit.” (Freud, 2017, r. 101) Ji ber hindê jî gelek caran bi navê (girêya dayikê) dihêt binavkirin, ji ber ku dema gorankarî bi ser zarokî da dihêt, zarok gelek ji dêya xwe hez dikit û bi çavekî dijinkarî li babê xwe dinêrit (Bokanî, 2004, r. 43). Zarok di temenê sê heta çar salîyê da, heza seksî li nik wî beramber diya wî dirust dibit û xirê ji babê xwe radikit û kerb jê vedibin (Slîwe, 2013, r. 64). Di vê aloziyê da, bab û kur dikevin mîlmilanê û kêş û vekêşê. Kur hemû bizava dikit, diya xwe ji bavê xwe bistînit û bi awayekî binhişî ji xwe ra bikit mîrat.

2.2. Girêya Elektra (Electra Complex)

Girêya Elektrayê berûvajî girêya Odîpî ye, dîsa ev terme ji efsaneyek yûnanî hatîye wergirtin. Di vê girêyê da, meyla keçê bo babî diçit û kerb ji dayikê ve dibit. Bi taybetî heger hat û babî pêgehek mezin di civakî da hebit, yan jî, pitir bab giringîyê bi keçê bidit. Freud vê vîyanê bo serdema zarokîniyê dizivîrînit, dema ku keç hest bi cûdahîya regezî di navbera xwe û birayên xwe da dikit, bi taybetî ji aliyê fîzyolojî ve, ew cûdahî jî ew e ku keçê wekî kuran nêrendam nîne. Herwesa sedemek din jî heye, ev girê li cem keçê peyda bibit, ew jî ew e, dema ku ji dayikê dûr bikevit, yan jî di dema sinêleyê da, ku babî wekî mirovekî tabû dibînit û bi hestek qedexê lê dinêrit, wî çaxî meyla keçê bo wan mêran diçit, yê ku hevtemenê babê wê ne (Eswed, 2015: 353). Ev girê jî piraniya caran di nav civakên girtî û nêrsalarî da peyda dibin, ji ber ku keç babî qedexê û heram dibînit, ev çende jî bandorê li binhişê wê dikit û ev girê tê da çîgir dibit.

2.3 Girêya Mêyatîyê (Femininity Complex)

Girêya mêyatîyê ew e, kur wekî keçê reftarê dikit, bi taybetî dema ku pêkve xwe dişon û mêndamê xuşka wî, ji yê wî cîyawaz e. Di aşopa wî da, dayika wî ev çende aniye serê xuşka wî û nêrendamê wê jêvekirîye, ji bo ku nêrendamê wî jî nehêt jêvekirin, ji tirsan da, wekî keçan reftarê dikit. Ewe jî di nav wan xêzanan da rû didit yê ku dayik tê da desthelatdar û tund bit li gel zarokên xwe (Eswed, 2015, r. 355).

2.4. Girêya Mêranîyê (Masculinity Complex)

Di vê derê da, keç dixwazit wekî kurikan bit, hest bi kêmasîya nebûna nêrendamê kurikan dikit û di nav civakê jî da hest bi pileya kêmasîya keçê dikit. Ji ber hindê naxwazit wekî keç reftarê bikit, xwe neçar dikit, wekî kuran reftar û livînan bikit, pora xwe kurt dikit, cilikên wekî yê kurikan dikit ber xwe û wekî wan şerûker dibit (Eswed, 2015, r. 355).

2.5 Girêya Qabîlî (Cain Complex)

Ev girêya girêdayî, milmilanê û kerbvebûnê ye di navbera du birayan da û eve jî ji efsaneya Habîl û Qabîlî hatîye wergirtin (Eswed, 2015, r. 356).

2.6 Girêya Antîgonê (Antigone Complex)

Di vê girêyê da, xuşkê meylek zor bo birayî heye û jê hez dikit. Li gor efsana yûnanî Antîgon keça Kral Odîpî ye, xwe dikit qurban bo birayê xwe (Eswed, 2015, r. 356).

2.7. Girêya Orîstî (Orestes Complex)

Berûvajî girêya Odîpî ye, li vê derê kur ji ber xîyaneta dayikê ya beramber babî, dayikê dikujit û kerb jê vedibin (Eswed, 2015, r. 356).

2.8. Girêya Dîyanayê (Diana Complex)

Ev girêya hindek nêzikî girêya mêyatiye ku di vê girêyê da, keç dixwazit bibit nêr û di reftarên wê da dîyar dibit (Eswed, 2015, r. 357).

2.9. Girêya Mîdya (Medea Complex)

Di vê girêyê da, dayik kerbê ji zarokên xwe radikit û ji wan hez nakit, bi taybetî, ger mêrê wê xîyanetê lê bikit, yan jî jinek din bo xwe bihînit, li vê derê jin wan zarokan wekî dijmin dibînit û arezûya kuştina wan dikevite dilê dayikê. Herwekî di efsana yûnanî da, Mîdya her du kurên xwe dikujit, ji ber ku mêrê wê Cîson keça kralî bo xwe dixwazit (Eswed, 2015, r. 358).

2.10. Girêya Napolyonî (Napoleon Complex)

Ev girêya li nik zelaman heye û ji wan mêran jî, yê ku nêrendamên wan biçûk û lawaz, ev zelum bi rengê din, derbirîne jî wê rewşa derûnî dikit û reftarek şerokî beramber jinan bi kar dihînit û bizavê dikit hêjmarek pir ji jinan kontrol bikit û zorbeya wan bo xwe rabikêşit û cihê xwe di nav dilê wan da bikit. Dibêjin Napolyon bi vî awayî bû û bizav dikir, di yek demijmêrê da li gel hêjmareka zor ya jinan raze (Eswed, 2015, r. 358).

2. 11. Girêya Grîseldayê (Griselda Complex)

Ev girêye jî weku girêyên din ên derûnî xwedan term û bingeh e û ev zarav ji aliyê derûnnasekî emrîkî bi navê James Jackson Putnamî ve (1846-1918) li dûv rêbaza Freudî dahêna û wesfa wê peywendîya babî ya binhişî ya seksî li gel keçê dikit. Dema biryar ji aliyê keçê ve dihêt dan ku şû bi xortekî bikît, ev heste li nik babî çalak dibit. Ev core hestpêkirine, ser bi çîrokên efsaneyî ve diçin. Bo nimûne kralek gelek astengan dihavête ber wî kesî, yê ku keça wî jê dixwazit (Huss, 1986, r. 190). Ev mijar di şanogerîya Tofan ya William Shakespeareî da dihête dîtîn, dema ku Prospero dudil e destan ji keça xwe berbidit. Eve jî dikevit jêr çemkê Freudizmê û jê ra dibêjin kompleksa Grîseldayê (Huss, 1986, r. 190) û cihê xwe weku hemû girêyên din di nav derûnşikariyê da kiriye.

2. 12. Girêya Xwekêmdîtîne (Inferiority Complex)

Ev girêye, hestê xwekêmdîtîne li cem takekesî dirust dikit, ew jî dema hest pê bikît bê desthelat e yan hest bi desthelatek ji xwe mezintir bikît. Ev hest jî li qonaxên zarokîniyê li cem kesan çê dibin. Li gor dîtina Alfred Adler (1870-1937) hemû zarok di hesta xwekêmdîtîne da hevbeş in, li gor pêkhata cesteyî û nekamilbûn û bêhêziyê hest bi xwekêmdîtîne dikin, îcar dema geşe dikin û temenê wan mezin dibin guhorîn bi ser evî hestê wan da dihên. Jêderên vê girêyê zortir û aloztir dibin. Îcar hind faktorên din dibin sedema dirustbûna hesta xwekêmdîtîne, wekî; kêmendami, rewşa civakî (Melazade, 2016, r. 282).

| 151

2. 13. Girêya Narsîzmê: (Narcissus Complex)

Narsîzm têgehekê zanistî ye li cem Freudî ji têgeha xweperistin û xwevîyanê aloztir e, di vê têgeha Freudî da mirov bi rêka objeya ji derve dişêt narsîzmê nîmayîş bikît (Loran Ason, 2012, r. 147). Freud narsîzmê bo ser du coran dabeş dikit; narsîzma seretayî girêdayî bi zarokan e û ser bi prensîba çêjê ye, corek e ji egoîstiyê. Narsîzma duyê; ser bi geşedana nav prensîbên waqî ye (ketwar) û ya mezinan e û obje senter e (Loran Ason, 2012, r. 148). Ev nexweşî yan jî em bibêjin girê dîsa bo serdema zarokîniyê vedigerit, bi taybetî zarokên ewan malbatan ewên ku bi nazdarî dihêne perwerdekirin. Dayik û bab çavên xwe li ser çewtîyên wan digirin û berdewam wan mezin dikin û pesna wan didin û kuçeka şahane bê bingeh bo wan dirust dikin (Şerîf Qereçetanî, 2010, r. 183).

3. Şopên Girêyên Derûnî di Dastanên Kurdî yên Folklorî da

3. 1. Dastana Zembîlfiroşî

Dastana Zembîlfiroşî ji wan dastanên navdar e di zargotina kurdî da. Bi taybetî di nav derwêşan da berbelav e û berî ku ji layê hozanvanê kurd Feqîyê Teyranî ve bihêt nivîsîn, ew li ser zarê dengbêj û derwêşan dihate gotin. Çîroka vê dastanê serinca gelek vekoler û rojhelatnasan kêşaye û hatiye wergêran bo çend zimanan wekî rûsî, erebî, swêdî û elmanî (Samur, 2015, r. 75). Ev dastan li hemû deverên Kurdistanê berbelav e û her yek bi şeweyekê vê dastanê vedigêrin, lê çîrok û serhatiya hemûyan wekî yek e, ku ew jî Zembîlfiroş lawekî ciwan û berketî ye û dilê Gulxatûnê dikevitê û wî bi hiceta kirîna zembîlan bangî wî diket bo qesrê. Gulxatûn di vê hewla xwe da sernakevit (Cindî & Evdal, 2008, r. 306-310).

Dema em varyantên vê dastanê dixwînin, em yekser li ser qehremanê dastanê Zembîlfiroşî radiwestin û kesayetîya wî ji bo me aşkera dibit ku xwedan hindêk giriftên derûnî ne. Ji wan jî girêya xwekêmdîtîne heye. Girêya xwekêmdîtîne ji ewan girêyan e giringîyek mezin pê hatiye dan. Xwedanê vê tîyorîyê Alfred Adler ku bo cara yekê wî giringî bi vê girêya derûnî daye, “bi rêka vî hestî siruştê mirovayetiye êxistiye ber tîşkên şirovekirinê” (Melazade, 2016, r. 279). Herwesa hestê xwekêmdîtîne bi şeweyek giştî li cem hemû mirovan heye, dema mirov rûbirûyê arîşeyek destnîşankirî dibit, bi wî rengî amade nîne û neşet derbirîne ji bîr û bawerên xwe û çarserîya arîşeya xwe bikit, li vir girêya xwekêmdîtîne dirust dibit” (Melazade, 2016, r. 279). Ev girêye, hesta xwekêmdîtîne li cem takekesî dirust dikit, ew jî dema hest pê bikit bê desthelat e yan hest bi desthelatek ji xwe mezintir bikit. Ev heste ji li qonaxên zarokîniyê li cem takî çê dibin. Hemû zarok di hesta xwekêmdîtîne da hevbeş in, li gor pêkhata cesteyî û nekamilbûn û bêhêziyê hest bi xwe kêmdîtîne dikin, îcar dema geşe dikin û temenê wan mezin dibin, guhorîn bi ser vî hestê wan da dihên. Jêderên vê girêyê zortir û aloztir dibin. Îcar hind faktorên din dibin sedema dirustbûna hesta xwekêmdîtîne. Adler bi çavekê kêmlî vê girêyê temaşe nakit, belku bi awayek siruştî vê girêyê dibînit û her wekî Hawjîn Sliwe di pertûka xwe da ewa bi navê “Rehendî Derûn Leşîrekanî Letîf Helmet da”yê boçûna Adlerî bo me vedigêrit: “ji bo ku em hest pê bikin ku em mirov in, divêt em di naxê xwe da hest bi kêmasiyê bikin.” (Sliwe, 2013, r. 84)

Di dastana Zembîlfiroşî da, em kesayetîyek bi vî rengî dibînin, ku li beramber jinan xwe kêmlî dibînit. Ewe jî li gor hizra psîkoanalîzê girêya xwekêmdîtîne ye. Em hestek bi evî rengî li cem Zemîlfiroşî dibînin, reng e ji ev heste ji ber pişeyî wî bit, ku kesek hejar û kêmderamet e. Her çawa bit, ev xwekêmdîtîna wî li cem derwêş û dengbêjan ve, ji dilpakî û derûna wî yê pak dihêt, lê ji aliyê derûnşikarî ve, ne weha

ye, hindek egerên din hene ku ev heste li cem wî dirust dibit. Di dastanê da weha hatîye ku Gulxatûn wî li kolanê dibînit û bi hiceta kirîna zembîlan wî vedixwîne qesrê:

*“Go: Zembîlfiroş, were li pêş,
şekir bigir, lêvan bimêj,
qîmetan selikan bibêj,
ya biçûk biha bibêj,
ya mezin bîne zêran ber bikêş.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 306)

Bi van gotinan Zembîlfiroş diçit li ba Gulxatûnê û paşî dergeh li ser wî dihêt girtin û Gulxatûn xwe nêzikî wî dikit û dibêjitê:

*“Zembîlfiroş nav bi şahîne,
tu were ser textê mîr rûne,
xerc û xeracan bistîne
li mîr heram be, li te helal be.*

*Zembîlfiroş got:
ez nayê ser textê mîr rûnanê
xerc û xeraca nastînim,
li min heram be, li mîr helal be.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 306).

Di van gotinan da em hesta xwekêmdîtîne li cem Zembîlfiroşî dibînin, ev hest, reng e ji ber van her du hokaran bit, yek ji wan xwe li cihê mîran nabînit li ser textê wî rûnanit, ji ber ku di hizir û bîrên wî da weha hatîye têgehandin ku ew çî caran nabit karekî weha bikit û ev bawerî bo wî çê nebûye. Ev çende ji bo kultur û çanda wî dizivirit ku bi tenê mîr dişên li cihê mîran birûnin. Ya duyem jî ji ber ku laşê wê jinê bo wî qedexe ye û heram e û ew bi xwe kesek dîndare û xwedatirs e. Lê dema em vê reftara wî dixin ber tişkên rêbaza derûnşikarî em girêya xwekêmdîtîne li cem wî dibînin. Ji ber ku ew arîşeya ew ketîyê şerm û gunehê li cem wî dirust dikit. Adler behsa têgehek din beramberî vê hestê dikit ku ew jî “qerebûkirin” e. Ew dibêjit dema kes hest bi xwekêmdîtîne dikit, bizavê dikit vê hestê bitepisînit û li xwe dîyar nekit, ew yekser penayê bo qerebûkirinê dibit. Li gor dîtina Adlerî xebat û têkoşana mirovî hemû berhemê vê xwekêmdîtîne ye. Adler pitir dêna xwe didit dahênan û afirandinê, ev tîyoriya wî pitir bi hunermend û nivîskaran ve girê daye. Hawjîn Sliwe dişa bo me gotina wî vedigêrit û dihînit ziman: “Hêza dahênanê bi hêza xwekêmdîtîne ve peywendîdar e, ne ku bi hêza seksî ve” (Sliwe, 2013, r. 84).

Bi zarê Zembîlfiroşî em vê hestê baş dibînin, di varyanta Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîlî da, Zembîlfiroş bi vî awayî derbirîne ji xwe dikit:

*“Zembîlfiroş, lawê feqîr,
kerem ke ser doşeka mîr
xwe ra şabe li zilf û herîr,*

*xatûn, li min tove doşeka mîr
ez li hev naxim zilf û herîr,
ez kesîb im xwe ra feqîr.”* (Celîl & Celîl, 2018, r. 130)

Reng e ev girêya Zembîlfiroşî ji ber rewşa wî ya aborî bit. Ji ber ku ew bi xwe danpêdanê dikit ku kesek hejar e, ne hedê wî ye biçit ser doşeka mîran rûne xwarê û dest bikit jina wî. Ji milek din ve ew daxwaza xatûnê bi erê dibînit, lê ne hêjayî wî ye, ji milek din ve ji ber ku ew jin ne hevjinê wî ye û seksa wê ji bo wî heram e û xwe bi hind gotinên din qayil dikit û qerebûya vê hestê xwe dikit û penayê bo xweparêzîyê dibit:

*“Go Zembîlfiroş, tu were ser misletê,
tu bike sefayetê,
hêj dûre roja qiyametê.*

*Go: wî herameto, wî herameto,
tu bes bike vî qiseto,
te ez birim helaketo.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 308).

Zembîlfiroş ji bo vê kiryarê hicetan digirit, ku dê bibit sedemê helaket û abrûcûnê li cem xwedê, neçar dibit vê hestê bi rêkeka din vedişêrit, ku ew jî penayî bo xwedûrkirin û tirs ji xwedê dibit, her wekî di vê nimûnê da xuya ye:

*“Go: xatûnê, ez nayê m ser misletê,
tirs min ji roja qiyametê.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 307).

Tirs ji roja qiyametê bihaneyeka mezin e, Zembîlfiroş pê vê hestê nepen dikit. Ew li berahikê xwe hêjayî textê mîran nabînit, paşî hicetan digirit, ku dê li roja qiyametê baca vê çendê bidit. Ji bo me ew hestên wî yê destpêkê giring in, dema xwe feqîr û nehêjayî Gulxatûna jina mîrî dibînit. Reng e jî ev xwekêmdîtin li gor boçûna Freudî ji encamê sistî û lawazîya endamê wî yê zayendî bit. Slîwe vê carê di pertuka xwe da amaje dikit boçûna Freudî sebarete vê girêyê û dihînit ziman ku hestkirin bi xwekêmdîtinê ji ber lawazî û sistî û neçalakîya endamê zayendî ye ku

takekes tûş dibit û hest bi xemgînî, tirs û stresê dikit (Slîwe, 2013, r. 86). Em van saloxetan li cem Zembîlfiroşî jî dibînin, lê ji ber nerîtên civakî ev hest hatîye veşartin û kirasek exlaqî lê hatîye kirin. Heger ji ber van egeran nebit, reng e çî bihanyên din nebin Zembîlfiroş xwe nêzikî xatûna jina mîrî nekit. Armanca Zembîlfiroşî ew e pareyekê bi dest xwe ve bihînit, xatûn jî bi heman hizrê reftarê digel dikit ku dê wî bi pareyekê mezin padaşt bikit heger xwasteka wê bi cih bihînit:

*“Go: Zembîlfiroş, şuxul bike xêra te tê,
Zembîlfiroş te çî hewal,
hingî tu dikarî,
zêra bidime te, tu bivî mal.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 308).

Zembîlfiroş bi vê padaştê jî razî nabit, ew bersiva wê bi vî rengî didit:

*“Go: xatûna gerden bi mor,
şuxul nabe kotek û zor,
molet bide heta hingor,
xwedê qedere li jor,
ew xatûn sing bi sinî,
ew xeber xêr-xêr kenî”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 308).

Kesayetîya Zembîlfiroşî wekî dastaneka folklorî gelek dîyar û aşkera nîne, her yek bi rengê li gor şert û mercên xwe yê civakî ev dastan veguhastîye û parastîye. Lê ev çenda hatî diyarkirin têra hindê dikit ku em girêya xwekêmdîtîne li cem wî bibînin, ji ber ku mijara girêyên derûnî jî ne weha çalak e, belku bi rengê veşartî û hindek helwest û reftaran da li cem takî dîyar dibit. Ji milekê din ve Feqîyê Teyran pitir li ser saloxetên kesayetîya Zembîlfiroşî kar kirîye û kirasek sofîzîzmê li ber kirîye. Lê xebata me li ser varyantên folklorî ye, me dastana Zembîlfiroşa folklorî kirîye hêvêna xebata xwe. Bi her rengê li gor çemka derûnşikarî Zembîlfiroşî girêya xwekêmdîtîne heye û ew neşet xwe nêzikî jina mîrî bikit û pêş vê çendê ve penayê bo qerebûkirinê dibit. Ew jî penayê bo hesta xwe ya dîndarîyê ve dibit û di encamê da xwe ji banê kelê dihavêjit û bêyî ku tu zîyan bigehê rizgar dibit.

3. 2. Dastana Hesoyê Şivan

Dastana Hesoyê Şivan yan jî Hesênîko, ku ji layê dengbêjan ve gehîştîye roja me ya îro. Heso heft salan li mala axayî şivanîyê dikit û dilê qîza axayî dîkevite Hesoyî. Ji wî daxwaz dikit ku wê birevînit, lê Heso vê çendê rewa nabînit û xwe hêjayî keça axayî nabînit. Paşî axa bangî wî dikit, da ku heqê şivanîya wî bidetê, lê Heso çî heqê xwe li nik axayî nabînit, ev çende jî dibit cihê gumanê bo axayî û

xelk û alem ji axayî ra dibêjin; dilê Hesoyî ketiye keça te, ji ber hindê heqê xwe naxwazit. Axa jî bawer dikit, ji ber vê çendê wî dikujit û bingor dikit (Cindî & Evdal, 2008, r. 371-376).

Dema em varyanta vê dastanê dixwînin, em dîsa pêrgî girêya xwekêmdîtîne dihên li cem qehremanê wê. Keça axayî bizavê dikit bawerîyê bo Hesoyî çê bikit ku wê birevînit û ew evîndar e, lê Heso vê çendê li asta xwe nabînit û hest bi xwekêdîtîne dikit, ev heste dîsa wî tûşî arîşeyeka din dikit ku di xwe ra nabînit heqê xwe ji axayî bistînit.

Keça axayî weha ji Hesoyî ra dibêjit:

“Siwar be min bavêje terkûya zîne,

xurce zêr ezê bînim,

orta min û xwe da bişidîne.

Heso go: Gulxanimê, weleh nave,

tu qîza axanî, ez şivanim,

ev xebera orta min û te da çî nabe” (Cindî & Evdal, 2008, r. 371-372).

Heso mîna Zembîlfiroşî xwe li asta keça axayî nabînit ku birevînit. Ev heste dîyar e hêj di zarokîniyê da li cem Hesoyê şivan çê bûye, ji ber ku dihêt dîyarkirin ku ji malbateka hejar û şivan in. Şivan jî karê herî zehmet û renc e. Dema kesek heft salan xwe şivanê mala yekê bibînit, béguman ev hesta xwekêmdîtîne dê hemû caran li cem wî peyda bit. Bi taybetî di babeta zewac û evîndariyê da. Yek ji hokarên vê girêyê li cem vî qehremanî, rewşa abûrî û civakî ye, dê bo wî bi zehmet bit ku bişêt biryareka bi vî rengî bidit, heger xwe çend ev babet bi hêsanî çareser bit, yan jî destê axayî negehit wî. Ji milek din ve Heso hest bi tirsê dikit ku dê ji destê babê Gulxanimê ve bihête kuştin, her wekî di evê nimûnê da:

“Gulê go: Heso, xelqê me yê here Şamê,

ezê qola zêrê xwe ji te ra bişînim,

bidim deste çekê vê nezamê,

wekî tu vê xeberê min ra nekî,

ezê herim bin pîya oda mala bavê xwe,

boxdanekê bavêjime te,

bavê minê te bikuje,

wî dengê me yê belav be li dinê û li 'alemê.

Heso go: Gulxanimê wele nave,

bavê te min bikuje,

*pişkê min serê darê darimê va bave,
wekî usane, goştê min xurê teyr û tûyafe,
eva xebera orta min û te da tu cara çê nave.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 372).

Keça axayî ji ber daxwaza xwe ya tund berê xwe didit boxtan û bêbextîyan. Vê çendê jî wekî gef li ser jîyana Hesoyî dibînit. Lê dîsa Heso di xwe ra nabînit daxwaza wê erê bikit. Wê çendî jî dihînit ziman ku dê zêran ji bo wî bifiroşit û pê çekê nîzamê bikirit, ji bo hindî bişêt xwe ji bab û birayên wê biparîzit û wê birevînit. Bi vê çendê Heso ditirsit û pê qayil dibit û biryarê didit wê birevînit. Her di heman şevê da wekî di dastanê da dîyar, Heso diçit nav nivînên wê:

*“Heso go: Gulixanimê,
îşev şeve, şeva mine,
tu perê orxanê hilde,
ez bêm bine,
kes nizane ez û tu ne.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 374).

Heso diçit nav nivînên Gulixanimê, dema hişyar dibit û dikilê sipêdê bang didit, Heso diniciqit û dîsa ew hesta xwekêmdîtîne li cem dîyar dibit:

*“Heso go: Gulixanimê,
berê sibê li min çal bû,
dîkê nivê şevê li min lal bû,
wexta tu qîza axa bûy,
ez şivan bûm.”* (Cindî & Evdal, 2008, r. 374).

Di vê dastanê jî da em qehremanekê xwedan arîşeyên derûnî dibînin. Girêya xwekêmdîtîne li cem Hesoyî jî di evan helwestan da dîyar dibit. Ev çende jî bi jîyana wî ve girêdayî ye, ji ber ku şivan di civaka kurdan da ji çîna xwarê ne, bawerî li cem wan kê m e, serederîya wan hemû deman di gel pezi ye, heta ku fêrî reftar û dengên wan jî dibin. Lewra dema dikevin di evan helwestan da, her yekser xwe kê m dibînin û pişeyê xwe jî kê m didin dîyarkirin.

3. 3. Dastana Edûla Mistefa Begê

Ev dastan ne ji wan dastanên dirêj in û rûdan ji ne aloz in, pitir dişibit dramayekê. Lê em di vê dastanê da pêrgî du girêyan dibin. Li cem qehremanên dastanê ji wan Şerîf Beg mîrê Mewalîya û yê duyê babê Edûlê Mistefa Beg e.

Çîroka vê dastanê li ser Şerîf begê û Edûlê ye. Rojekê Şerîf beg ji xew hişyar dibit û li ser banê qesrê berê xwe didit berîyê, dibînit kerek pez, li ser devê bîra (Hêlê)

mexel ketiye. Aqil di serî da namînit û bangî xulamê xwe dikit, da ku hespê wî Bozê zîn bikit û berê xwe bidit ew kerîyê pezî yê kê ye. Dema diçit şivanekî dibînit, pirsê jê dikit, ka ew pez yê kê ye û çewa li ser devê bîra wî, Hêlê mexel ketiye. Ew dibêjîtê, eve pezê Mistefa Begî ye. Xulamî li pişt xwe dihêlit û diçit ser devê bîrê, çavên wî bi jinek ciwan û berketî dikevit, ji ber ciwanîya wê qîzikê sewdaser dibit û dil dikevitê. Her yekser Şerîf beg eşqa xwe ji wê ra dihînit ziman û daxwaza xwastinê jê dikit, lê Edûl weha bi sanahî qayil nabit û ji wî daxwaz dikit, bi helalî wê ji babê wê Mistefa Begî bixwazit. Piştî borîna heyamekê, dîsa Edûl dihête bîra Şerîf Begî. Şerîf Beg radibit li hespê xwe siwar dibit û diçit bin konê babê Edûlê, da ku Edûlê bi helalî ji xwe ra bixwazit. Lê Mistefa Beg weha bi hêsanî razî nabit û şert û mercên giran dihavêjit ber, ji qeweta Şerîf Begî mezintir in û li dûmahîyê bi zorî Edûlê direvînit û ji xwe ra dibit (Celîl & Celîl, 2018, r. 207-214).

Li gor rêbaza derûnşikarî Mistefa Beg, ji aliyê derûnî ve xwedan kêşe û girêya Grîseldayê li cem heye. Ji ber ku xwastîyê keça xwe asteng dikit û şert û mercên giran dihavêt ber sînga wî. Ev çende jî li gor derûnşikarîyê bo eşq û evînek nepen ya babê vedigerit û ew keça xwe ji hejî kesê nabînit. Bingeha vê girêyê ji bo kesayetîya Grîseldayê vedigerit, Grîseldayê kesayetîyek bû di çîrokên romansî yên çerxa naverast, pesna wê wekî jineka baş û ji aliyê seksî ve pak dihat kirin. Helbijartina Putnamî bo vî zaravî ji ber wê çendê ye, “bab keça xwe pak û kamil dibînit û kesê ji hejî nabînit ku keça xwe bidit wî. Ji ber hindê pesna wê bi awayekê neberhuş didit û qet naxwazit li pêş çavan berze bit û her tim arezû dikit bi wî ra bit û nevêt ji layê zelamên ser zemînî ve bihête pîskirin. Ev girê girêdayî bi xeyala babî ye sebarek keça wî û roj bi roj keça wî di serê wî da mezin û balkêştir dibit” (Huss, 1986, r. 190).

Caran çareserîya vê girêyê dikevit di destê keçê da, ew jî dema ku keç giringîyeka berdeyam didit babê xwe û wê çendê bo wî aşkera bikit ku dê her dem arîkarîya wî bikit û bi xwe ew şû bikit jî. Li vê derê helwest û çalakîya babê hinek sist dibit û wî dîwarê di navbera keça xwe û zewaca wê da avakirî dipelixînit û nahêlit. Zaraveka rohîntir û berçavtir bo girêya Grîseldayê, Girêya Lîr e, ewa ku ji aliyê Arpad Pauncz ve hatiye nivîsîn, weku layê din yê girêya Odîpî dihêt pejirandin. Pauncz torebûn û hêrsa Lîrî ya beramber daxwazkerên keça wî Kordelayê şirove dikit, vê çendê jî bi hevrikîya seksî ya binhişî, li gel mêrên keçên wî dîyar dikit. Her çawa bit, şêwazê bersiva wî ya kerbê weku bergirîyêkê, li dijî wê evîna yekalî û hesta babîniyê têk dişêlit. Girêya Lîrî ta radeyekê ne wekî ya Grîseldayê guncayî ye beramber hestên seksî yên binhişê babê beramber keçê (Huss, 1986, r. 190). Heger di Girêya Odîpî da, kur û dayik mijara serekî bin, di girêya Grîseldayêyê da berûvajî, bab û keç e û li cihekê jî wekî rexek ji girêya Odîpî dihête hêjmartin. Belê di vê girêyê da helwesta dayikê nahêt zanîn, ka gelo ew dikevit çi rewşê da beramber hestên zelamê xwe

yên ku girêdayî bi evînek binhişî ya seksî beramber keça wê. Bêguman eve jî dişêt bibit cihê alozîyê wekî girêya Elektrayê, ka çawa dayik û keç dikevin milmilanê ji bo bidestxistina mêrî. Reng e li vê derê jî, core kerbek li ba jinê beramber keça wê derbikevit holê û bibe egera kêş û vekêşê û bi hemû awayan bixwazit keçik şû biket û li cihê din bab beramber vê arezûyê bit û dibit perjanek di navbera keçê û şûkirina wê da. Em di vê dastanê da çî helwestên dayika Edûlê nabînin, bi tenê bab biryarê li ser didit û ka keça wî dê bi çî merc şû biket û divêt xwastîyê wê, wan mercan bi cih bihînit. Heger ne, ew neşêt bibit hevjinê keça wî, her wekî di vê nimûnê da diyar e:

*“Mistefa Beg dibê, Şerîf Begê lawo,
Herêkirina Edê barekî girane
Bîst û pênc lokê devane,
Bîst û pênc çapiliyê tivengê li milane
Bîst û pênc ebayê Besrayî yê milê Şêxane
Bîst û pênc demaçe çeka xal û birane
Eger tu bêjî “herê” ye ev destûra Edê ye
Hezar zêrê qelenê Edê ye...” (Celil & Celil, 2018: 211).*

Mistefa Beg van şertên giran dihavêt ber sîngê Şerîf Begî, eve jî yek ji nişanên daxbarbûna Şerîf Begî ye bo keça wî. Reng e ji ber mezinîya nav û dengê xwe vî qîmetî bi keça xwe dibexşit, lê di gotinên wî da core daxbarbûnek pê ve diyar e. Di girêya Grîseldayê da, daxbarbûn bi keçê xala bingehîn e. Bab keça xwe kamil û bê kêmasî dibînit. Her dem pesna wê bi awayek nesiruştî didit û keça xwe ciwantirîn û hêjatorîn keç li ser rûyê zemînî dibînit. Helbet ev çende jî ji hestek asayî derbazî hestek neasayî ya binhişî dibit. Reng e pirs jê bihêt kirin ew bi xwe jî nizanit ka ji ber çî hinde keça xwe ciwan û bedew dibînit. Lê heger bi çavekê Freudîyane li mijarê binêrin, em yekser pêrgî peywendîya seksî ya binhişî dibin, ji ber ku binhişî zû bi zû di reftarên normal da naderkevit pêş, bi tenê di hindek rewşan da, wekî xewnditin, kiriyara seksî, dahênan û hwd ... Ev layenê ne diyar yê mirovî, caran guhorînên nesiruştî bi awayekê sîmbolî li nik mirovî dirust dikit. Bi zehmet e jî egerê van guhorînan bihêt zanîn li nik wî kesî. Wekî diyar Freudî demek dirêj xwe bi vê mijarê ve xerik kirîye. Binhişî mezintirîn rehendê kesayetîya her mirovekî hêjmartîye. Pêk dihêt ji wan hemû tiştan ku ne bi sanahî ye bi awayekê huşdarî li bîr bihînin, rih û rişalên wê bo wan palner û xerîzeyan vedigerit, mirov nikarî bi hêsanî temaşe biket. Wekî wan soz û bîranînan, yê ku me tûşî gohşînê dikin. Bi nerîna Freudî binhişê mirovî jêderên palnerên wê sade bin, wekî arezûya xwarinê û seksî, yan palnerên hunermend û zanayane bin. Lê em hemû caran bo wan palneran dibin rêgir, ji ber hindê bi şêwazeka din li me derdikevit (Kemal, 2016, r. 38.)

Li gor van boçûnên jorîn, kesayetîya Mistefa Begî ya mistîk dîyar dibit, heger helwesta wî çend kiz û neçalak bit. Bab hemû deman hez dikit keça xwe bi baştirîn şêwe bidit zewicandin, belê di rêbaza derûnşîkarî da pirs bi rengêkê din e, hemû tevgerên mirovî dikevin ber lêkolînê. Mistefa Beg jî bi rêka vê zewacê vîyana xwe beramber keça xwe Edûlê aşkera dikit. Ji bilî van şert û mercan, ew astengeka din jî dihavêt ber vê prosesê, ew jî divêt her heft birayên Edûlê jî razî bibin. Mistefa Beg weha ji Şerîf Begî ra dibêjit:

*“Paşî, ezê heft birayî Edê binim, ji wan bikim sualê ye
Eger heft bira bêjin herê ye
Ezê hêja bidim te Edê ye”* (Celîl & Celîl, 2018, r. 211).

Ev daxwazîyên ku Mistefa Begî ji Şerîf Begî dikit, nîşanên astengkirinê ne, Şerîf beg ji van şert û mercan hêrs dibit û dibêjit:

*“Şerîf Bego go Mistefa Begê ye,
tiştê tu dibêjî, qeweta tu kesî nagehêye,
Derket ji odê, siwar bû li Bozê ye...”* (Celîl & Celîl, 2018, r. 211).

160 | Heger em bi hûrtir li gotinên Mistefa Begî bikolin, ew qet hez nake ev zewac pêk bihêt, ji ber ku ew ji bo helwesta xwe penayê bo erêkirina heft kurên xwe dibit. Dîyar dibit ev proses pêk nahêt û em astengkirinê di gotinên wî da dibînin. Nîşaneka din ji girêya Grîseldayê astengkirin e di zewaca keçê da. Bêguman eve motîfeka berbelav e di efsane, çîrok û dastanên folklorî da, dema ku kralk yan hakimek şert û mercên asê dihavêjit ber xwastîyên keça xwe ku gelek caran ev merc ji hişê mirovan derdikevin û qet nahên cîbicîkirin. Wekî mînak di dastanên mezin ên mîna Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrîn, Tahar û Zuhre, Cembelî û Binefşê, Sîyabend û Xecê da em li vê motîfê rast dihên. “Di dastana Leyla û Mecnûn de, diya Leyla motîfa astengêriyê teşkîl dike. Çunkî dema ku ew fêr dibe ku meyla Leyla û Mecnûn ber bi hev ve heye, ew, Leyla ji mektebê digire û nahêle ku Mecnûn wê bibîne; li pêşîya hevdiatîna evîndaran dibe asteng. Di dastana Ferhad û Şîrîn de, çîyayê Bêstûn, motîfeke astengêr e. Ferhad ji bo ku bikaribe bigehê Şîrînê, mecbûr e ku wî çîyayî kun bike û avê tê da derbaz bike. Di çîroka Tahar û Zuhre de, Erebe Reş û Diya Zalim motîfa astengêriyê teşkîl dikin” (Pertev, 2015, r. 157).

Li vê derê mebesta me ji van mînakan ew e ku astengkirin bi xwe motîf e û di girêya Grîseldayê jî da motîfek serekî ye ku bab bi her awayekî û bihaneyekê astengîya dixit ber zewaca keça xwe, ji ber ku naxwazit jê dûr bikevit û hemû hewla didit ku bi wî ra bimînit.

Beramber eva me gotî, em hinde şopên girêya narsîzmê li cem Şerîf Begî dibînin. Ji ber ku reftar û axiftinên wî vê çendê pesend dikin. Narsîzm wekî Girêsildayê ji navê qehrimanek efsaneyî yûnanî hatiye. Dibêjin carekê Narsîs ew kurê ciwan û efsûnî ser û çavên xwe di bîra avê da dibînit, pê daxbar dibit û evîndar dibit. Bizavê dikit destê xwe li rûyê xwe bidit, lê hewla wî ser nakevit û dikevite nav avê da û dixeniqit. Ruha wî dibit gulek nêrgizê û şîn dibit. (Alhac, 1987, r. 135) Narsîzm ladaneka seksî ye kes laşê xwe dikit objeke serekî bo arezûya xwe her wekî Narsîs wêneyê xwe yê di avê da, li cihê wêneyê kesekê din dibînit û lê evîndar dibit (Loran Ason, 2012, r. 144).

Reng e narsîzma Şerîf Begî jî ji ber çîna wî ya bilind û perwerdekirina wî ya xêzanî bit. Ev derûnî reng e li cem hemû axa û begên kurdan hebin. Ji ber ku sistema perwerdekirina wan li ser hêz û mezinahîyê ye. Narsîzma Şerîf Begî li wê çendê diyar dibit dema ku bi tenê qesta koşka Mistefa Begî dikit û Edûla keça wî jê dixwazit. Ev tenêbûn, berjengên narsîzmê lê diyar dibin ku xwe li asta Mistefa Begî dibînit û bi tenê rûbirûyê wî dibit. Yek ji nîşanên narsîzmê ew e “zêdetir ji ya pêdivî ji xwe razîye û xwe mezin dibînit” (Sadiq, 1999, r. 183). Em vê hestê li cem Şerîf Begî dibînin. Herwesa dema bi şev diçit bin konê Edûlê û bi kotek û zorê wê razî dikit da ku birevînit, Edûl razî nabit û ji kuştinê ditirsit, lê Şerîf Beg bi vî rengî bersiva wê didit:

*“Dilêşîya min lê hayê
Dilê min dilekî dîne
Tu vê şîva xizêran bi çavên xwe bibîne
Ezê bi kezyê te bigirim, ji bin çîta te bikşînim
Ezê laşê te bi vê şivê bikim reş û şîne
Ezê te bi darê zorê ji kûçikê bavê te û heft birayê te bistînim,
Bila mêr bêne kuştin, bibe qetilxwîne”* (Celîlê & Celîl, 2018, r. 213).

Ji bo ku Şerîf Beg xwasteka xerîzeyên xwe dabîn bikit, amade ye hem Edûlê bikujit hem jî komkujî çê bibit. Em li vê derê jî naveroka narsîzmê di vî qehremanî da dibînin. Herwesa kesekê berjewendîperist e û eve jî yek ji nîşanên giring yê girêya narsîzmê ye. Kesê ku bi girêya narsîzmê ketî, peywendiyên dewrûberê xwe jî bo berjewendîya xwe bi kar dihînit. Hevalê kesî nîne û her carê komeka kesan hevalên wî ne (Sadiq, 1999, r. 183).

Şerîf Beg jî heman saloxet lê diyar in, qet hestê Edûlê li ber çav nagirit, Edûl jî wî daxwaz dikit û tika dikit wê neşkênit:

*“Ez qîzikim, darê şkestî me
Heqê te li bav û birayê min heye*

*Heqê te li min tu nîne
Şerîf begê mîrê Mewalîyan go,
Lê, lê, lê, lê, lê hayê
Bejinbilinda min lê hayê, çavreşa min lê hayê
Li min tê fikefîka bayê sibê ye
Pê re tê kulîyê berfê ye
Befrê daye navtenga bozê ye
Hemî ji bona xatirê wê be jinê, wê ballê ye” (Celîl & Celîl, 2018, r. 213).*

Ew çî giringîyê bi jîyana wê wekî jin nadit, ew pitir bi xwastekên xwe ve girêdayî û normal jî dibînit ku ew negehit wî, komkuji û xwîn bihêt rijandin. Kesên bi vî rengî hemû deman xwedan saloxetên narsîst in û ji xwe pêvetir çî hesabana bo kesî nakin. Li dûmahîyê jî Şerîf Beg wê bi kotek ji xwe ra dibit û direvînit.

3. 4. Dastana Binefşa Narîn û Cembelî

Dastana Binefşa Narînî û Cembelîyê Hekarî, yek ji wan dastanên balkêş û navdar in. Ji ber wê hezkirin û vîyana kûr li hemû deverên Kurdistanê belav bûye û ketîye ser zarê dengbêjan. Çîroka vê dastanê li ser du evîndaran e, yek ji wan Binefşa Narînî keça Fariz Begî ye û yê din Cembelî kurê Mîrê Hekarîyan e. Rojekê Derwêş Axa berê sipêdê radihêjit misînê avê û derdikevit derê û çavên xwe li êl û eşîrê digêrînit, demek ji wan keçeka ciwan mîna karxezalan dibînit, her yekser dilê wî dikevit wê keçê. Radibit gazî xulamekê xwe dikit û jê ra dibêjit ew qîza ciwan kî ye? Xulamê wî dibêjitê: Ew qîza Fariz Begî ye, navê wê Binefş e. Mexreb bi ser wan da dihêt, babê Binefşê Fariz beg diçit diwana Derwêş Axayî. Derwêş Axa jî keça wî Binefşê bo xwe dixwazit. Fariz Beg razî dibit, lê divêt her sê birayên wê jî razî bin. Paşî Fariz Beg vê çendê bo her sê kurên xwe dibêjit, ew yekser vê zewacê qebûl nakin, radihêjin konê xwe ji wî warî diçin. Sipêdê Derwêş Axa berê xwe diditê Fariz Begî konê xwe rakirîye û ji wê derê bar kirîye, Derwêş Axa pêncî siwarên bi şûr û mertal didit peyî xwe, diçin rêka wan digirin. Dema digehin cem wan, her sê birayên Binefşê radihêjin şûrên xwe dikevin cengê digel siwarên Derwêş Axayî. Ji wan her pêncî siwaran, çil bi destên birayên Binefşê dihêne kuştin. Derwêş Axa baz didit û gazî eşîrê dikit, roja paştir du sed siwaran dihînit. Vê carê ji wan du sedan sed dihên kuştin û du birayên Binefşê jî dihêne kuştin. Bi tenê birayekê wê dimînit û şerê sed siwaran dikit. Gencekî nêçîrvan bi navê Cembelî, derketiye seydê, dibînit sed siwar diçine xortekî, wijdana wî qebûl nakit, radibit milê xwe didit ber birayê Binefşê, harî wî dikit û wan siwaran dişkênin û Derwêş Axa dîsa paş ve dizivirit. Dilê Cembelî dikevit Binefşê û ji wan dixwazit êdî digel wan bijîn û dê ew jî evro pê ve parastî bin. Babê Binefşê û birayî wê razî dibin û Cembelî

qesta warê xwe dîkî û roja paştir Derwêş Axa pênc sed siwaran didit pey xwe dîsa diçin ser konê Fariz Begî. Vê carê serê Fariz Begî jê dîkin û birayê Binefşê dikuvin û Binefşê direvînin û dibin. Cembelî jî xulam û xizmetkarên xwe bi rê dîkin da ku konê mala Fariz Begî bihînin cem xwe, belê serkêşê xulaman Omo dema digehit bin konê Fariz Axayî, berê xwe diditê kes li wan deran nîne û kirasê Binefşê bi tenê maye. Radibit kirasê wê li xwe dîkî û dizivirî cem Cembelî. Dema ku Cembelî, Omo dibînit kirasê jinan li ber xwe kirîye, matmayî dibit û hal û meseleyê Omo bo wî vedigêrit û Cembelî dikevit heyfa Binefşê û bab û birayên wê vedîşêrin û sozê didit ku Binefşê bi dest xwe ve bihînit. Derwêş Axa jî bi eşîra xwe bar dîkin û ji ber Cembelî diçin cih û warekî din. Li dumahîyê Cembelî dikevit dûv Binefşê. Piştî salekê zarokek Binefşê dibit û navê wî dîkî Cembelî û sebir û hedara xwe pê dihînit. Piştî Cembelîyê kurê mîrê Hekarîyan bi ser konê Derwêş Axayî hil dibit, cilên xwe bi şivanê Derwêş Axayî ra diguhorit û xwe dêxî di şiklê şivanekê pergende da, bi merama ku xwe bigehînit Binefşê. Binefş wî dinasit û şev li cem dimînit û li roja paştir Binefş zarokê xwe Cembelî di landikê da dihêlit û xwe digel Cembelîyê mezin didit revandin (Celîl & Celîl, 2018, r. 109-128).

Heger em bi çavek derûnşîkarî li reftarên kesayetîyên vê dastana folklorî binêrin, em dê li pêrgî mijarên gelek hestiyar bin. Hêjayî hindê ye ku ev girên derûnî bihêne diyarkirin. Dema em çîroka dastanê dixwînin, hevrikîyên dijwarî yê derûnî li cem kesayetîyan dihêne dîtin. Hindek ji wan hevrikîyan girêdayî bi mijarên civakî û rewîştî ne, hindek jî girêdayî derûnî ne. Di vê dastanê da, kesayetîya sê karakteran gelek giring e, Derwêş Axa, Binefşa Narînî û Omoyê Xulam.

Ji reftar û helwestên Derwêş Axayî diyar e ku bi girêya narsîzmê ketîye û xwîna sedan mêran ser xatirê hezên xwe yê zayendeyî dirijînit Ji milekî ve temenê wî 90 sal e û xwe hêjayî keçekê ciwan û terwend, wekî Binefşê dibînit, qet bi awayek lojîkî nahizirî û eve jî wê narsîzma wî diyar dîkî. Dema ku Fariz Beg pêşniyaza kurên xwe dîkî ku Binefşê bi Derwêş Axayî ra bizewicînit ew her sê bira weha ji babê xwe ra dibêjin:

“Bavo, ev tu dîn bûyî?

Bi xwedê em nabêjin herê ye.

Xwa me piçûke, zaroke, em nadine Derwêş axa,

Derwêş axa extiyare, emrê wî nod sale li dînê ye” (Celîl & Celîl, 2018, r. 113).

Di gelek dastanên kurdî da, ev girê dihêt dîtin, heta hind şopên vê girêyê li cem Binefşa Narînî jî heye. Dema bab û birayên Binefşê rêçareyekê dibînin ku xwe ji Derwêş Axayî qortal bikin, ji Binefşê dixwazin, cilên qetiyayî li xwe bikî û xwe

bêxî di şiklê keçeka dîn û aqilsivik da, da ku dilê Derwêş Axayî jê reş bibit, wekî di dastanê da dîyar e:

*“Bila Binefş cilê pertî û qetiyayî, cilê feqîra li xwe ke,
Xwe pêxas ke û rahêje cerê avê ye,
Waye Derwêş Axa mîrê êlê sekiniye li ser devê kaniyê ye,
Bila Binefş ji mal derê û here avê ye,
Gava nêzîk bibe ber kaniyê ye,
Bila xwe kor ke, xwe seqet ke, bilikume bikeve çoka,
Cerê wê ji milê wê bikeve erdê ye,
Bila cerê wê bişkêye,
Ê Fariz Beg wê bêje, wey li min,
Ev sêwiya ha, ev qîzika şilûşehet, ev Fariz Begê ye?
Ê dilê wî sar bibe ji Binefşê ye, belkî law, em ji xwe ra bimînin li vê derê
ye.” (Celîl & Celîl, 2018, r. 113).*

Ev plan ji bo hindê ye, da ku tu arîşe di navbera Fariz Begî û Derwêş Axayî da rû nedin û li wî cihî bimînin, ev jî ji neçarîyê dihêt, ji ber ku Fariz Beg xwîndar e û ji cih û warên xwe revîye û hatine di nav cih û warê Derwêş Axayî da konê xwe vedane. Binefş qet guhdarîya van gotinan nakit û nabit harîkar ku ev plan bi ser bikevit. Ewe jî bo kubarî û mezinahîya wê dizivirit û li ser xwe qebûl nakit keçeka wekî wê ciwan, cilên qetiyayî bikit ber xwe û temsîla keçeka dîn û şelê bikit. Ew li dijî hizra babê xwe radiwestit û bi vî rengî hestê xwe yê narsîst dihînit ziman:

*“Binefş dibê, Fariz Beg, bavo, ez cilê feqîra li xwe nakim,
Ranahêjim cerê avê ye,
Ez naçim kanîka biniya malê ye,
Ez xwe kor nakim, ez nalkumim,
Bira çokê min nekeve erdê ye,
Bira cerê min neşkê ye,
Emrê min çarde salî ye,
Emrê Derwêş Axa nod salî ye,
Derwêş Axa bav û birayê mine,
Li ser doşeka pêxemberê xwedê ye.” (Celîl & Celîl, 2018, r. 113).*

Ev helwesta Binefşê dibit egerê kuştina her sê birayên wê û babê wê. Heger Binefşê bi ya babê xwe kiriba reng e ev plan bi ser ketiba, belê ji alîyekê ve, da Binefş bibit qurban, reng e jîyana xwe hemû bi wî rengî derbaz kiriba. Belê ev

çende ne hind hizrek pesend e, dibit ku derfet bo wan rexsaba ji wî cihî çûban û cihek baştir bo xwe dîtiban. Ev girêya narsîstî, di hindek mijaran da girêdayî girêya Mîdya ye, wekî xwebawerîbûn, tolvekirin û nebûna hestê poşmanîyê.

Pitir girêya Mîdya li Binefşê dîyar dibit ji narsîstê, belê wekî me li jor jî amaje pê dayî hindek xalên hevpişk di navbera wan da hene. Girêya Medeayê jî ji şanogerîya Euripides ê yûnanî hatiye. Euripides dewrûberê sedê çarê ji berî zayîne ev şano nivîsîye û çîroka wê li ser evînek dijwar û kûr e û ev evîne diqulipit dibit kerb û kîn. Mîdya ew dayik e ewa zarokê xwe dikujit, ji ber ku zelamê wê xîyanetê lê dikit. Ji bo ku tola xwe vebikit, zarokên xwe dikujit (Gordon, 1998, r. 5). Mîdya wekî dînan ji Jasonî hez dikit, wê babê xwe xapand û piştî zewaca digel Jasonî kirî, li dûmahikê Jasonî Mîdyayê dihêlit û jinek din bo xwe dihînit. Lewra Mîdyayê plan gêran bo tolvekirinê. Kûresê jî gazinde ji xwedawend Aphroditeyê kir, ji ber ku Aphroditeyê ev rûdan xuliqand. Evîni guhart bo kerb û kînê. Di daweta Jasonî da, Mîdyayê ebayek û tacek pêşkêşî bûkê kir. Dema ku bûkê ew dîyarî kirin ber xwe laşê wê sot û bi tundî mir. Dema babê bûkê keça xwe hembêz kirî ew jî digel wê heliya û mir. Piştî Mîdyayê şûrê xwe înatê derê her du zarokên xwe kuştin. Kûris jî ji reftara wê mendehûş bû, çawa dayikê şîya dijî zarokên xwe yê bêguneh karek wesa bikit. Mîdya jî ji Jasonî direvit û li piştî ejdehayekê siwar dibit û difirit. Ew jî Jasonî dixapînit û nahêlit her du kurên xwe hembêz bikit û veşêrit. Kêfa wê bi vê çendê dihêlê û şîya Jasonî biêşînit (Gordon, 1998, r. 5).

Em kesayetîya Binefşê nêzikî ya Mîdyayê dibînin, ew jî bab û birayên xwe û zarokê xwe li ber pê naxwe didit. Piştî Binefş ji Derwêş Axayî zarokek dibit, navê wî dikit Cembelî, wekî wefayek bo hezkirîyê xwe Cembelîyê kurê Mîrê Hekarî. Belê piştî Cembelî lê dizivirit, ev hezkirina wê bo zarokê wê dibit kerb û kîn û nifrînan lê dikit:

*“Ro rehet bû, bû tarî ye,
Cembelîyê biçûk di dergûşê da digiriya,
Binefşê digo, de lorî, de lorî, de lorî,
Cembelîyo de lorî, şewitiyo, de lorî, peritiyo, de lorî,
Ezê îşev Cembelîyê xwe bilorînim,
Ezê Cembelîyê kurê mîrê Hekarîya birevînim,
Bila Cembelîyê biçûk bişewite, biperite, di dergûşê da bimîne.”*
(Celîl & Celîl, 2018, r. 123).

Di van gotinên Binefşê da em li rastî kerbek veşartî dibin, ew wî zarokî êdî bi cegera xwe nabînit, belku ew wî dijmin dibînit û mirina wî dixwazit. Kerba dayikê di girêya Mîdyayê da gelek dijwar û veşartîye. Heger çend dîyar nebit, lê di bingeh

da di naxê wê da çandîye. Fred Pine 1995 amajê bi Mîdyayê dikit, weku nimûneyeka taybet û formeka kerbê di naxê jinan da dibînit, “serbora Mîdyayê ew e, ew di naxê xwe da hatiye birîndarkirin. Ew hest pê dikit, dê di civakî da abrûya wê biçit. Reftara wê jî coreke xweparastinê ji vê şermê. Ew reftara wê ya tund beramber zarokên wê çi hestê pêşemanîyê li nik wê peyda nakit” (Gordon, 1998, r. 6) Her dîsa Pine dibêjit: “reftara wê ya tund beramber zarokên wê, dayika Mîdyayê bi xwe jî reftarak wesa digel wê kiribû bê ku peşeman bibit” (Gordon, 1998, r. 6).

Em van hestan li cem Binefşê jî dibînin, ku heza kuştinê li cem wê heye, wekî tolvekirinek ji Derwêş Axayî, lê derfet bo wê na rexisit vê kiryarê encam bidit, heta ku hezkirîyê xwe Cembeliyê mezin dibînit, ji nû ve hesta wê ya kerb û kînê li zarokê di dergûşê da diyar dibit, her wekî vê nimûnê:

“Ezê îşev Cembeliê kurê mîrê Hekarya birevînim,

Bila hema pey min bibe hewar û qîr û gazî.

De lorî, de lorî, min xêrek jê nedîto, de lorî” (Celil & Celil, 2018, r. 123).

Jakobz (1988) sebarete şanogerîya Mîdyayê dibêjit: “Ev şanogerî nimûneyeka dijwar a psîkodînamîkîya nexweşîya jêkudabûnê ye” û her wesa dibêjit: Mîdya wekî dayik bi şêweyek narsistîkî birîndar e, tiji kerb û kîn e, jineka bixwebawer e. Jinika bixwebawer ew jinik e ewa hewl didit peywendîya di navbera bab û zarokî da qut bikit. Wekî amraz bo tolvekirina wê birîna derûnî ewa li wê hatî kirin ji layê zelumê wê ve, wî ew wekî amûr didit (Gordon, 1998, r. 6).

Derwêş Axa, zilamekê nod salî, dê çi hest bi jinek çarde, pazde salî hebit, heger ne wekî laş û xerîzeyek seksî bit. Ji ber hindê jî helwesta Binefşê her li destpêkê dijî zarokê wî ye, belê ew zarok ji bo valahîya derûnîya xwe bi kar dihîne, li dûmahîyê çi kar pê namîne, ji nû ve kîna xwe aşkere diket û zarokî di dergûşê da dihêlit û digel Cembeliyê Hekarî direvit. Herçende cûdahîyek di navbera helwesta Mîdyayê û Binefşê da heye. Mîdya ji Jasonî hez dikit û tola xwe vedikit, Binefş ji Derwêşî hez naket, lê bi rêka aşkerekirina hesta xwe ya kerbê û hêlana zarokî di dergûşê da tola xwe vedikit. Merem her tolvekirin e çi bi rêka kiryarê bit yan jî sembolîk bit. Herwesa ev saloxetên li cem Mîdyayê li cem Binefşê jî hene. Ew jî birîndar e û bi lojîkî biryarê nadit. Di girêya Mîdyayê da asta kerbê çend mezin bit, ya tolvekirinê jî weha ye. Mîdya ne bes zarokên xwe dikujit, bûkê bi bab ve dikujit. (Gordon, 1998, r. 6). Ew jinên bi girêya Mîdyayê dikevin xwedan kesayetiyên psîkotîk in, ji ber ku ew jinika zarokên xwe dijî babî bi kar dihînit ewê nexweşîya paranoyayê heye û kesayetîyeka psîkotîk heye (Gordon, 1998, r. 7). Binefş jî xem û kîna xwe ya dijwar li wî zarokî dihînit derê û nifrînan lê dikit ku bimirit, bişewtit û bipertit, wekî vê nimûneya li xwarê:

*“Binefş dibê, pîrê, wele, ji qahrê te û kurê te ra,
Ez dîn îm jî, ez bêaqilim jî,
Ez derdê bav û bira ji bîr nakim,
De lorî, de lorî, Cembelîyo, de lorî,
Peritîyo de lorî, şewitîyo de lorî.”* (Celîl & Celîl, 2018, r. 125).

Piştî ku Binefş bêminet dibit û hêza tolvekirinê êdî li cem xwe dibinit û bi cesaret weha ji xesûya xwe ra dibêjit. Heger Cembelîyê mezin jî li wê nebûya xwedan, reng e wê her tola xwe vekiriba, belê dibit ku bi rengê din ba ne bi wî şeweyî. Paşî Binefş Cembelîyê zarok di dergûşê da dihêlit û xwe li gel Cembelîyê mezin didit revandin û diçit.

*“Pîrê di xew ra çûye,
Binefş şîr dide Cembelîê biçûke, Cembelî jî di xew ra çûye,
Cembelîê kurê mîrê Hekarya, her du cilê xwe li xwe kirin, rabûn piya,
Binefşê hûrmûrê xwe civandiye, hevûdinê revandiye,
Nîvê şevê li wan şkestiye,
Xerîbin, Cembelî hê rê nediye,
Çûne binîya malê ji xwe ra di şkeftê da rûniştîye,
Sibe li hazra bû, li wan jî bûye,
Ji şkeftê derketin û dimeşîyan”* (Celîlê & Celîl, 2018, r. 124).

Bi vî awayî Binefş digehit armanca xwe û ji destê Derwêş Axayî rizgar dibit û tola xwe bi rengê sêmbolîk vedikit. Her du digehin yek û dibin jin û mêrên hev. Armanca ji girêya Mîdyayê jî her ew e bigehit armanca xwe û bê ku hesta pêşemaniyê li cem dîyar bit. Binefş qet pêşeman nabit ku zarok hêlatî di dergûşê da, her çende nakujit, lê heger pêwîst kiriba reng e kuştiba, çunkî kîna Binefşê bo Derwêşî tund e, kuştina bab û birayên wê di bîra wê da maye û bûye eger bi Cembelîyê mezin ra şû neket.

Encam

Di vê xebatê da ew çende bo me rohin bû, dastanên folklorî, bêpar nînin ji girêyên derûnî. Herwesa ew çende jî hat aşkerakirin, ku hemû caran mijarên tabû û mistîk û yê girêdayî bi heza seksî, xwe di nav berhemên folklorî da vedişêrin û bi rêka evan çîrok û hikayet û vegêranan derbirin ji wan hestên kîpîrî dihêne kirin. Hindî civak girtî û xwedan hizirek aydîyalîst bit, ev xerîze jî eswqas di nav berhemên edebî û folklorî da dihên veşartin, zû bi zû hest pê nahêt kirin, yan jî dihên bihanekirin bi hind rewîştên din. Ji wan Zembîlfiroş mînakeka baş e, ji

ber ku wî şîyanên hindê nînin kiryara seksî digel jina mîrî bikit, bi mêrekê çak û xwedatirs hatîye bihanekirin û formek din wergirtîye, bê ku zelamek xwedan kêşe û giriftên derûnî bihête nasandin.

Ev dastanên ku me kirine hêvênê xebata xwe, nimûnek baş in bo destnîşankirina girêyên derûnî, herçende hemû cor nehatin destnîşankirin, lê girêyên wekî: xwekêmdîtin, narsîzm, Grîseldayê û Mîdya li cem kesayetî û lehengên evan dastanan hatin dîtin. Di hemû dastanan da me kesayetîyek narsîstî di naxê lehengan da dît. Herwesa hind dastan jî dişibihan çîrokên hind şanogerîyên yûnanî mîna şanogerîya Mîdya ku hind hêmanên wê nêzikî dastana Binefşa Narînî bû. Binefşa Narînî jî layenek mezin yê Mîdyayê bi xwe ve digirit, bi taybetî di mesala kuştina zarokî yan hêlana wî. Xalek din ya giring ku em geştiyên mijara homosexual li cem Omoyê xulam dihêt dîtin, herçende ne weha çalak û aktif bû, lê li xwekirina cilên jinan di çanda kurdî da zû bi zû nahête qebûlkin. Her wesa Omo dema cilên Binefşê dikit ber xwe, ger derbirîne ji xerîzeyê û binhişî nekit, çî meremên din pê nîne. Ewe jî taybetmendîyekî didit dastanên folklorî yê kurdî.

Çavkanî

- Alhac, S. (1987) *Alemraz alnîfsîye*. Beyrot (ciz elewel): Alimkiteb Alaslami.
- Ason, P. (2021). *Ferhengî şirovey firoyd*. (wer: Welîd Omer). Silêmanî: Rahand
- Bekir bokanî, S. (2004). *Ferhengî saykolojî*. Silêmanî.
- Celîl, O., Celîl, C. (2018). *Destanên kurdî* (ç.2). Istanbul: Wardoz.
- Cemal, S. (2012). *Legel saykolojiya da. Silêmanî: berêweberîtî çap û billawkirdinewî Silêmanî*.
- Cindî, H., Evdal, E. (2008). *Folklorî kurmanca*. Hewlêr: Aras
- Ehmed Eswed, N. (2015). *Ferhengî zarawekanî edeb û zanîste mirovayetyekan* (ç.1). Silêmanî: nawendî xezelnûs.
- Freud, S. (2005). *Totem û tabo*. (wer: Reza Menoçihîrî). Slêmanî: Rênma.
- (2017). *Lêkdanewey sêkisyane bo mêjû*. (wer: Selam Seidî). Hewlêr: Awêr.
- Melazade, R. (2016). *Nalî û saykolojiyay şîr*. Hewlêr: Awêr.
- Pertev, R. (2015). *Edebiyata kurdî ya gelêrî (dîrok-rêbaz-lîteratur-berawirdî)*, Istanbul: Avesta.
- Sadq, A (1999) *Fî bitîna merîz nefîsî*. Beyrot: Aldar Al'ribye Almusu'at,
- Samur, E. (2015). *Zembilfroş û Gulxatûn*. Istanbul: Avesta.
- Şerîf Qereçetanî, K. (2010). *Nexoşî û giriftekanî derûnî û komellayetyekan*. Silêmanî.
- Slîwe, H. (2013). *Rehendî derûnî le şîrekanî Letîf Hellmet da*. Hewlêr: Yekêti Nûseranî Kurd.
- Tahir Şerîf, E. (1985). *Qamûsî, derûnnaşî, engilîzî-'erebî_ kurdî* (ç.1). Bexda,
- Yildirim, K., Pertev, R., û Aslan, M. (2013). *Ji destpêkê heta niha folklorî kurdî. Weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn*.

Kovar:

Gordon, R. M. (2008). Medea and Parental Alienation Chapter 5, in: An Expert Look at Love, Intimacy and Personal Growth. (2008). 34-53.

Huss, R. (1986) the mindscapes of art: dmensonis of the psiçe ni ficton, drama and flim. London England, 1986, p. 190.

Kemal, Ş. (2016). Freud û birî mirov. Govarî Aydy, 2016, (36).

Polattağ, H. (2022). Dengbêjîya jinan di Radyoya Erîvanê da.

Folklor û Ziman. 3(2), 171-199

Wergirtin/received: 17.10.2022

Qebûlkirin/accepted: 17.01.2023

ORCID: 0000-0002-1777-0429

DENGBÊJÎYA JINAN DI RADYOYA ERÎVANÊ DA

Habibe Polattağ*

Kurte

Edebîyata dengbêjîyê di salên dawî da bala gelek akademîsyen û vekoleran kişandîye û bûye mijara gelek xebatan. Dengbêjîya jinan ji bûye mijareka sereke. Digel vê yekê afirînerî û îcrakariya jinan di vî warî da zêde nehatiye vekolan. Ev xebat dê vekolanekê di vê çarçoveyê da bike. Gelek berhemên dengbêjîyê ên klasîk ji aliyê jinan ve hatine afirandin. Jin di îcrakirina vê hunerê da ji her tim aktîf bûne lê ji ber şert û mercên civakî her tim gavekê li paş mêran mane. Piştî belavbûna radyoyan jinan derfet dît ku dengê xwe bilind bikin û di vê hunerê da ji pişt perdeyê derbasî sehneyê bibin. Dengbêj û stranbêjên Radyoya Erîvanê Sûsika Simo, Fatma Îsa, Aslika Qadir, Belga Qado û Zadiina Şekir di vî warî da bûne mînakên baş. Me di xebata xwe da pêşî nasandina dengbêjîyê kir, piştra me têkilîya jinan û dengbêjîyê nîrxand û di beşa dawî da ji me ji dengbêjên Radyoya Erîvanê çar mînakên ji jinan dan.

Peyvên Sereke: Dengbêjî, Fatma Îsa, Aslika Qadir, Belga Qado, Zadiina Şekir

* Vekolara Serbixwe. E-mail: polattaghabibe@gmail.com

WOMEN'S DENGBEJ ON YEREVAN RADIO

Abstract

Dengbêj literature has attracted the attention of many academics and researchers in recent years and has been the subject of many studies. Women have also been one of the main subjects of dengbêj, but they have not been studied much as the producer and performer of this literature. This study aims to consider women as producers and performers of dengbêj. Most of the classic dengbêj products are produced by women. Women have always been active in the performance of dengbêj but they have always been one step behind men. After the spread of radio broadcasts, women had the opportunity to raise their voices and brought this art to the stage from behind the curtain. Dengbej and artists of Yerevan Radio Susika Simo, Fatma Îsa, Aslika Qadir, Belga Qado and Zadína Şekir are important names in this field. In our study, first of all, the dengbêj tradition was briefly introduced. In the second part, an evaluation was made on women and dengbêj. In the last part, the four dengbêjs mentioned above were introduced from Yerevan Radio.

Keywords: Dengbêj, Fatma Îsa, Aslika Qadir, Belga Qado, Zadína Şekir

Destpêk

Dengbêjî di salên dawî da bûye mijareka gelek populer. Gelek vekolerên kurd û yên biyanî li ser mijarê sekinîne û xebatên hêja derketine holê lê xabatên ku li ser dengbêjiyê ne, bi piranî behsa dengbêjên mêr kirine. Dema ku behsa jinan û dengbêjiyê tê kirin bi piranî jin wekî temayekê tên nirxandin. Di hin xebatan da jî ji ber sedemên polîtîk rola jinan hatiye romantîzekirin. Mijar carinan jî hatiye ajîtekirin. Erotîzma jinan, bedewîya wan bi berfirehî bûne mijara xebatên edebîyata dengbêjiyê. Xebatên ku li ser dengbêjên jin sekinîne gelek kêmtir in. Ji ber vê yekê me di vê xebatê da, hewl da ku em jinan wekî afirînerên edebîyata dengbêjiyê bikin mijar û astengiyên ku di îcrakirina dengbêjiyê da derketine pêşberî wan, şênber bikin. Gelek dengbêjên jin hene ku li hember keda xwe ya di vî warî da neketine lîteratura dengbêjiyê jî. Yanî keda jinan a li ser dengbêjiyê zêde nehatiye vekolan. Me xwest ku bi vê xebatê balê bikişînin ser vê valahiyê.

Wekî ku tê zanîn Radyoya Erîvanê di muzîka kurdî da û hafizeya gelê kurd da xwediyê ciheka taybetî ye. Vê radyoyê gelek stran û melodiyên geleri tomar kirine û ew ji wendabûnê xelas kirine. Radyoya Erîvanê di serdema xwe da bûye navnîşana muzîka kurdî. Di wê serdemê da dengbêjên jin jî êdî bi saya radyoyan xwe di hunera dengbêjiyê da nîşan dane. Me di vê xebata xwe da xwest ku di minaka Radyoya Erîvanê da jinan, weku îcrakar û afrînerên edebîyata dengbêjiyê binasin û binirxînin. Li gor agahiyên li ber destê me, tenê di derbarê neh jinan da agahiyên birêkûpêk derketin. Me di gotara xwe da cih da Sûsika Simo, Fatma Îsa, Belga Qado, Zadína Şekir û Aslıka Qadir. Lewra hem di derbarê van çar kesan da agahiyên herî birêkûpêk hene hem jî dengbêjiya kurdî bi awayekî baş temsîl kirine.

Em dê di gotara xwe da pêşî dengbêjiyê bi kurtasî pênase bikin. Dûra em dê nîqaşên di derbarê dengbêjên jin da binirxînin û bi çend minakên dengbêjên Radyoya Erîvanê hewl bidin ku dengbêjên jin bidin nasîn.

Me ji bo xebata xwe ji çar hevpeyvînan sût wergirt. Ev hevpeyvîn bi Zeyneb Yaş (H1), Mahmut Begîk (H2), Aslıka Qadir (H3) û Têmûrê Xelîl (H4) ra hatine kirin. Em dê di gotara xwe da van hevpeyvînan bi hejmaran destnîşan bikin. Ji xeynî hevpeyvînan me ji gelek gotar û pirtûkan sût wergirt. Pirtûka Zeyneb Yaş *Şakarên Muzîka Kurdî* (2015), pirtûka Eskerê Boyik *Çanda Kurdên Sovêtê* (2012), Gotarên Selada Oztürk, Rojda Zaman, Canser Kardeşî ji bo nivîsîna gotarê çavkanîyên me

yên sereke bûn. Herweha me ji çavkanîyên dîtbarî û bihîzîyarî jî sûd werdirt û me li ser gelek belgefilm, bernameyên televîzyonan û qeydên Radyoya Erîvanê vekolan kir. Di heman demê da me ji gelek çavkanîyên dijîital jî sûd wergirt.

1. Edebîyata Denbêjîyê

Dengbêjî di edebîyata kurdî ya devkî da xwedîyê cihêkî taybetî ye. Kurd, ji ber ku dereng derbasî çanda nivîskî bûne heta roja me jî çanda xwe û dîroka xwe bi awayekî devkî gihandine roja me. Veguhestina çandê bi berhemên devkî yê edebî pêk hatîye. Yek ji wan cureyên berhemên edebî yê devkî jî dengbêjî ye. Kurdan herçiqas berhemên xwe yê devkî derbasî nivîsê kiribin jî çanda wan a devkî niha jî didome. Wekî ku Selda Oztürkê jî anîye ziman “Dengbêjîya kurdî ji ber kêmasîya çavkanîyan bi Evdalê Zeynikê tê destpekirin lê hin çavkanî behsa dengbêjê Mîr Şeref (Mîrê Hîzanê) Selîm Silêman jî dikin.” (Öztürk, 2012, r. 10).

Hin vekoler dengbêjîyê wekî “dengbêjîya di bin patronajê da û dengbêjîya serbixwe” dikin du beş (Hêja, 2015, r. 39). Dengbêjên ku di bin sîya hamîyekî da bûn hunera xwe di dîwanên mîr û began da îcra dikirin û dengbêjên serbixwe li gundan digerîyan û hem di dawetan da hem jî di şevbuhêrkan da karê dengbêjîyê dikir û debara xwe bi vî karî dikir. Yildirimçakar jî dengbêjîyê wekî dengbêjîya klasîk û ya modern dike du beş. Ew tîne ziman ku bi pêşketina amûrên teknolojîyê, guherînên civakî îmkân daye jinan ku vê hunerê îcra bikin. Li gor tesnîfa Yildirimçakarî dengbêjîya klasîk, dengbêjên dîwanan yan jî yê di bin patronajê da; dengbêjîya modern jî kesên ku berhemên dengbêjîyê piştî hilweşîna patronajê îcra kirine, îfade dike (Yildirimçakar, 2020, r. 88, 89).

Hin dengbêj di dîwanên mîr û began da xwedîyê statuyeka bilind bûn, hin jî wan jî di dawet û şevbuhêrkan da kêfxweşî didan xelkê. Dengbêj di nav gel da xwedîyê îtibarekê bûn. Ew wekî rihsipî dihatin pêşwazîkirin. Dengbêj di nava hemû malbat û eşîran da bi rehetî digerîyan. Dengbêjan karîbû di nava eşîrên dijmin da jî bi rehetî bigerîyana. Wan mijarên rojane û yê dîrokî li gor meqamekî bi enstruman yan jî bêyî enstruman pêşkêş dikirin. Şerê eşîran yê navxweyî, evîn, karesatên xwezayî û hwd. dibûn mîjara berhemên wan. Gelek dengbêj amûreka lêdanê bi kar nayînin. Tenê destê xwe dibin ser kerikê guhê xwe û dibêjin. Li hin herêman amûrên wekî tembûr, ribab, bilûr û kemanê tîne bikaranîn. Dengbêj jî vebêj in. Ew ji îcrakirina hunera xwe çêjeka mezin distînin û bi kêfxweşî distirên (Uzun, 2006, r. 30. ; Kardaş, 2012, r. 201. ; Çiftçi, 2015, r. 110-124).

Dengbêj, serpêhatîyên civakî di stranên xwe da zindî dihêlin. Dema ku stranên wan digihîjin nîfşên nû, ev bûyer jî di hafîzeyê gel da tîn parastin. Bi gotîneka din dengbêjan serpêhatîya gelê kurd, nîfş bi nîfş heta roja me anîne. Dengbêj ji ber fonksiyona veguhestina çandê û bûyerên dîrokî wekî hafîzeyê gel jî tîn pênasêkirin. Dengbêj heta niha bi navên cuda hatine binavkirin: Çîrokbêj, stranbêj, kilamxan, stranvan, qesîdebêj û mitrib hin ji van in.

Di serdema mîrektîyan da mîran dengbêjan hîmaye dikirin. Çavkanîyên nivîskî li ser vê mijarê kêma in lê yê heya tîra xwe agahîyan didin. Ji ber kêmbûna dokumanên nivîskî navên dengbêjên ku di bin patronajê da ne, kêma in. Yê heya ev in: Selîm Silêman, Evdalê Zeynikê, Gula File, Karapêtê Xaço, Dengbêj Çîngo, Şerîfê Çîngo, Biroyê Şerqî, Şêx Silê, Dengbêj Sîdîqo, Ehmedê Fermanê Kîkî û Pero (Gürür, 2014, r. 17-73. Celîl, 2016, r. 613).

Dengbêjên serbixwe yan jî dengbêjên ku ne xwedîyê hamîyekî ne li gundan digerin, di dawet û şevbuhêrkan da hunera xwe îcra dikin û debara xwe bi vê yekê dikin:

Dengbêj her tim li coxrafîyaya Kurdistanê digeriyan. Wan bi vê yekê çanda kurdî ya neteweyî jî di nava gel da belav dikirin. Dengbêjan çîrokên xwe zêdetir, êvaran di şevbuhêrkan da vedigotin. Bi taybetî di şevên zivistanê yê dirêj da. Ji xeynî vana li devera Colemêrgê kesên bi navê dengbêjên dîlanan jî hene û ew havînan diçin zozanan û kîngê bê xwestin stranên xwe dibêjin. Ji bilî ev kesên ku bi navê "Mitrîb" tîn zanîn zêdetir li devera Mêrdînê dengbêjîyê îcra dikin. Mitrîb, stranên xwe bi sazê xwe yê bi navê ribabê dibêjin. Yê ku li tembûr û sazê dixistin jî hebûn. Wan li gundan çîrok, stran yan jî lawîk digotin. Tiştên ku digotin li ser kêf û şahîyê bûn. Dengbêjên ku havînan li zozan û gundan digeriyan jî hebûn. Wan çîrokan xwe digotin û xelat werdigirtin. Dengbêj di şevên zivistanê da li dîwanxaneyê gundan distran (Parîltî, 2006, r. 82, 83).

Dengbêj dema ku diçe cihekî, axa yan pêşengê wê derê kî be li mala wî distirê. Dengbêjên ku li gund diman çîrokên xwe li ber girseyeka mezin digotin. Dengbêjan li hin deveran bi saz digotin li hin cihan jî bê saz digotin. Mînak li Colemêrgê saz nayên bikaranîn. Sazên ku tîn bikaranîn jî li gor deveran diguherin. Li Kafkasan qewal û duduk, li Mêrdîn, Amed û Rihayê saz, ribab û tembûr derdiketin pêş (Parîltî, r. 82, 83).

Berhemên dengbêjîyê li gor hin şert û mercan tîn dabeşkirin. Heta li gor vê dabeşkirinê hin îcrakar wekî dengbêj hin ji wan jî wekî stranbêj tîn qebûl kirin.

Mînak hin kes tenê îcrakarên li dîwanan wekî dengbêj qebûl dikin, hin kes jî li gor naverok û cureyê hunermendan wekî dengbêj yan jî stranbêj qebûl dikin. Gungum, dengbêjî û stranbêjîyê ji hev cuda dike. Li gor wî stranbêj stranên ku berê ji aliyê dengbêjan ve hatine afirandin û hatine îcrakirin di roja me da dibêjin (Gümgüm, 2017). Begik jî pênaseyeka weha dike: “Dengbêj di heman demê de dibe ku stranbêj be jî. Dengbêj stranên berê û yên ku dengbêjên din afirandine dikare bêje û dibêjin jî. Divê bi şertê ku naveroka kilamê neguhêre, bikare kilamên heyî bêhtir bixemilîne, lê zêde jî bike (Beğik, 2013, r. 23). Begik di hevpeyvîna xwe da jî weha dibêje:

Bi min dengbêj ew kes e ku hem stranên xelkê dibêje hem bi xwe jî stranan çê dike. Bi min di dengbêjîyê da ast hene. Ên ku kilamên kesên din dibêjin. Ev astekî ye, ev bi xwe jî jê ra bîrekî lazim e û me'rifetek, hunerek jê ra lazim e. Ên ku bi xwe stranan çê dikin, hene destanan dibêjin çunkî destan bavê helbest û pexşanê ye, bavê romanê ye. Di nava destanê da mîtoloji heye. Li “Memê Alan” binêre tê da mîtoloji heye, gotin heye, behsa bûyerê dike. Bi bûyerê ra jî tu dibînî kilamê dike navê. Dibê Zînê weha got, Memê weha got... (H2).

176 | Li gor mînakên li jor em dibînin ku dengbêjîyê heta roja me guherînên giring derbas kiriye. Dengbêjî ji dîwanan derbasî radyoyan bûye û îro jî ev kevneşopî ne bi halê xwe yê resen be jî tê îcrakirin. Divê ev yek ne wekî dejerenasyonekê lê wekî geşedanekê/adaptasyonekê were nirxandin lewra ku ev adaptasyon nebûya niha dê dengbêjî bi temamî jî holê rabûya. Divê neyê jibîrkirin ku dengbêjî jî bo muzîka kurdî jî bûye hîmek jêneger û ku îro em dikarin behsa muzîka kurdî bikin ev jî bi saya mîrasa dengbêjîyê ye.

Ji ber ku mijara gotara me dengbêjên jin in û hemû dengbêjên ku mijara me ne di radyoyayan da hunera xwe îcra kirine, em dê jî wan li gor dengbêjên modern û yên serbixwe (yên ne di bin patronajê da) binirxînin.

2. Jin: Afirîner û Îcrakarên Dengbêjîyê yên hem Nepen hem jî li ber Çavan

Derbarê dengbêjîya jinan da gelek nîqaş hene. Hin vekoler karê ku jin dikin bi stranbêjîyê sînardar dikin hin kes jî li dijî vê yekê derdikevin. Ku mebest dengbêjîya dîwanan yan jî patronaj be Gula File û Pero di vir da dibin mînak (Celîl, r. 613). Ji keynî Gulê û Peroya Kor navê Hemîde jî di çavkanîyan da derbas dibe. Hemîde di salên 1900an da li Hekariyê jîyaye. Peroya Kor li herêma Bişêriyê dengbêjî kiriye û di dîwanan da straye (Öztürk, r. 109). Ku jî dengbêjîyê meqsed dengbêjîya dîwanan

be ev sê mînak tenê jî bes in ku mirov bikare behsa dengbêjîya jinan bike. Li aliyê din tê zanîn ku jinan di qadên biçûk û civînên navxweyî da dengbêjî kirîye. Li hin deveran jî di konan da dema ku civata dengbêjîyê dihate amadekirin perdeyek di navbera jin û mêran da dihate danîn û jinan li dû vê perdeyê distran (Beğik, 2012).

Di çavkanîyên li ser dengbêjan da, zêdetir behsa dengbêjên mêr tê kirin. Em dizanin ji ber çanda bavkanî, di nava kurdan da jinan karê dengbêjîyê, wekî mêran bi awayekî aşkera îcra nekirine. Ji ber vê yekê jî digel ku navê gelek dengbêjên mêr gihaştîye roja me, lê navê dengbêjên jin gelek kêm in. Vekoler vê yekê bi çanda kurdan a bavkanî û bandora dinê îslamê ve girê didin. Lê wekî ku em dê di beşên din da bibînin di civaka kurdên êzdî da jî gelek astengî li ber dengbêjî û stranbêjîya jinan çê bûne. Herçiqas jin di warê dengbêjîyê da rastî gelek astengîyan hatibin jî, karê dengbêjîyê berdewam kirine û wekî afirînerên berhemên dengbêjîyê di çanda kurdî da cihê xwe girtine.

Dengbêjên wekî Gulê, Hemîde, Pero, Meyrem Xan, Fatma Îsa û Eyşe Şanê nûnerên dengbêjên jin ên pêşî tî qebûl kirin. Îro, şert û mercên jinan li gor serdemên berê baştir bûne lewra jin bi awayekî hêsantir dikarin karê dengbêjîyê bikin (Yıldırımçakar, r. 95). Dîsa jî di nava gel da qismek hê jî bi awayeka neyînî li hunera wan a dengbêjîyê dinihêrin

Weku ku li jor jî hate behskirin, jinan di nav civakê da wekî mêran derfet nedîtine ku bi serbestî karê dengbêjîyê bikin. Jinan ji ber adetên çanda bavkanî, nikarîbûn wekî mêran gund bi gund bigerin û di dîwanan da dengbêjîyê bikin. Ev tê wê maneyê ku jinan ji aliyê aborîyê da ji vî karî sûd wernegirtine. Di heman demê da ew statu û rêzgirtina ku di dengbêjîyê da dibe para mêran jî bi dest nexistine. Çavkanî nişan didin ku digel vê yekê jinan dîsa jî karê dengbêjîyê kirîye û hunera xwe dîrî sehneyê (yan jî dîwanan) be jî afirandîye. Herweha jinan di veguhastina dengbêjîyê û hêmanên devkî yên din da jî roleka aktîf girtîye. Jin berîya serdema modern ji perwerdeya zarokan perpirsyar bûn. Wan zarok bi lorî, çirok û kilaman mezin dikir. Bi vê yekê jî çand vediguhastin nîşên nû û gelek dengbêjên navdar cara ewil ji dêya xwe yan jî ji pîrika xwe berhemên dengbêjîyê guhdarî dikir. Vekoler Zeyneb Yaş li ser mijarê tespîtên xwe weha îfade dike:

Min 110 hunermend di du cildên Şakar (Şakarên Muzîka Kurdî) de nivîsîne. Ez dikarim bêjim ji sedî heştê yê wan rol modela wan dêya wan bûne. Di vir de erê jin ne dengbêjên ku em bêjin civata ne. Em ê vê veqetînin ji dengbêjîya ku jin bi xwe diafirîne, peyda dike... Em ê yekî ji yekî kêmîtir yan zêdetir nebînin lê karê hunerî dengbêjan kirîye ama bingeh û esasê wê jin e lê belê jinan jî ew tiştê ku jinan kirîye mixabin di nav civatê de nehatîye naskirin, nehatîye biqîmetkirin. Ji ber wê yekê navek lê nehatîye kirin. statuyek wan tune bûye (H1).

Ji bo dengbêjîya ku di bin banê patronajê da ye tenê du mînakên jin hene ew jî Gula File û Pero ne lê agahîyên derbarê wan da jî tenê devkî ne yanî derbarê wan da agahîyên nivîskî di dest da tune ne. Em ji ansiklopedîya Celîlê Celîl hîn dibin ku dengbêjeka bi navê Pero di dîwanan da straye û bi Evdalê Zeynikê ra jî stran gotine. Hemû xebatên ku behsa Evdalê Zeynikê dikin behsa Gula File jî dikin û radigihînin ku Gulê di dîwana Surmeli Mehmed Paşa da dengbêj bûye û bi Evdal ra ketîye lecê. Li gor ku Ahmed Aras radigihîne Evdalê Zeynikê di vê lecê da zora Gulê birîye û bi ser ketîye.

Piştî sê roj û sê şevan Gulê dest li ber Evdal datîne, dibê Evdal haza ku tu şairî û şairekî bê emsal î... Evdal dibê: Gulê tu jî şaireke pir mezin î. Heta niha tu kesî li pêşya min ewqasî berxwe nedaye (Aras, 2018. r. 41-48).

178

Ev sê mînak îhtiala hebûna dengbêjên jin ên ku di dîwanan da dengbêjî kirîye tîne bîra mirov. Li aliyê din rastîyek weha jî heye ku Dengbêj Gulê dibe ku ji ber ku ne misilman bûye karîbûye dengbêjî bi mêran ra bike û di dîwanan da bistirê. Mehmûd Evdila (Beğîk) tîne ziman ku dibe ku Gulê kurdeka Mesîhî (Xirîstîyan) be jî (H2). Rastîyeka weha jî heye: Jinên ku ji çîna bilind bûne xwedîyê hêzekê bûne, karîbûne li derveyê adetên civakê tevbigerin. Yanî ku ev hêz dîtîbin îhtîmal çê bûye ku di dîwanan da jî wekî dengbêj cih bigirin. Tiştêkî din jî ew e ku di dîroka wêjeya kurdî da gelek helbestvanên jin hene. Feqî Huseyin Sagnîç jî edebîyata yaresanan navê gelek helbestvanên jin dide: Celale Xanima Loristanî, Rihan Xanima Loristanî, Lîza Xanim, Xatû Mey Zerd, Daye Xanima Serketî, Fatîme Lorîya Goranî, Yay Hebîbeya Şarezûrî, Nazdar Xanima Şîrazî, Nergîz Xanima Şarezûrî, Xatûn Dayrakî Rezber, Xatûn Zerbanuya Derzyanî, Senem Xanima Dewdanî û Mestûre Kurdistanî (Sagnîç, 2014, r.88, 172). Ku jinan wekî şair di wêjeya kurdî da cih girtîbin helbet wekî dengbêj jî girtîne lê ji ber çanda devkî ne tenê dengbêjên jin, yê mîr jî bi demê ra hatine jîbîrkirin û dîroka dengbêjîya kurdî bi çavkanîyan herî dûr gihîştîye Evdalê Zeynikê û Gula Fille. Bazidî jî tîne ziman ku keçên kurdan jî xwendine û

perwerde ji melayan dîtine. Jin di heman demê da bi mêran ra beşdarî dîwanan jî bûne (Bazidî, 2010, r. 58). Digel vê yekê derbarê dengbêjîya wan da agahî tune ne. Helbet zelalkirina vê mijarê vekolaneka berfirehtir dixwaze û ne mijara vê xebatê ye. Niha em dê li ser pirsgirêkên ku jinan di warê dengbêjîyê da jîyane bisekinin.

Em ji çavkanîyan dizanin ku jinan di hemû warên jîyanê da wekî dengbêj cih girtine. Mînak: “Di nava kurdan da şahîyeka ku salê du caran tê pîrozkirin heye. Ev şahî di demsalên payîz û biharê da tê pîrozkirin. Navê vê şahîyê *serûn* e. Ev şahî, şahîya jinên kurd a herî girîng e. Di van şahîyan da jinên ji rêzê û yên ku ji çîna serdest in bi hev ra ji mêran dûr, heta êvarê stran digotin, govend digirt û xwarin dixwarin” (Mojab, 2013. r. 268). Li gor agahîyên ku Bazidî dide, di nav civaka kurdan da pîrejin, ciwanan li dora xwe dicivînin û li ser kar û barê dinyayê, li ser dîrokê (şer, serhildan, bûyerên xwezayî), li ser adet û rusumatên kurdan heta tecrubeyên xwe ji wan ra dibêjin. Yanî wan perwerde dikin (Bazidî, r. 57). Ev rola jinan a li ser perwerdeyê û li ser veguhestina çanda devkî nîşan dide.

Ew jî mewlud didene xwendin, mêr cuda û jin cuda zad û te’aman tedarik diken û bixuran disojin. Dawetên wan zaf bi deng û bi stran in ew berîte dibêjin, bi govend stran û bi reqs dikin. Jin û mêr, keç û law hemû bi hev ra di destê hev da govend digirin û keç û bûkên wan dilizin û stranan dibêjin (Bazidî, r. 50, 60).

Jinan di van civînan da mêwlûd xwendine û dua kirine. Herwiha wan di dawetan da jî gelek stran afirandine û gotine. Yıldırımçakar radigihîne ku “Di jîyana rojane da bi tenê jin lorî û zêmar/şînî’yan dibêjin. Ev cure bi tenê malê jinan in. Jin van cureyan diafirînin û dibêjin. Mêr ne vana diafirînin ne jî dibêjin (Yıldırımçakar, r. 92).

Ji agahîyên li jor jî dîyar e ku jinan karê dengbêjîyê di nava civatên jinan da, di dawetan da li şahî û pîrozbahîyên gelerî û di şînan da kirîye. Yanî di her warê jîyanê da jinan berhemên dengbêjîyê ava kirine û hem bi afirandina berhemên xwe hem jî bi veguhestina van berheman bûne parçeyek çanda devkî ya kurdî. Lê belê di civaka kurdî da ji bo dengbêjîyê karê jinan ne hêsan bûye. Ji ber zextên civakî jinan wekî dengbêjên mêr nikarîbûne bi rehetî dengbêjîyê bikin û berhemên xwe belav bikin. Ew, rastî gelek astengî û zextan hatine. Li gor agahîyên di dest da berîya îslamîyetê jin azadtir bûn û karê dengbêjîyê jî beryî ku werin astengkirin îcra kirine. Pariltî li ser mijarê weha dibêje:

Di nava kurdan da dengbêjên jin hebûne lêbelê ew derneketine pêş. Jin, heta ku kurdan dîne îslamîyetê qebûl kirîye bi mêran ra xwediyê heman şert û mercan bûne. Piştî îslamîyetê bi zextên dinî ev wekhevî kêm bûye lê bi temamî tîk neçûye lewra kurd ji hin adetên xwe qet venegerîyane. Îcrakarên kilaman bi piranî jin bûn. Îro niha jî gelek kilamên ku berbelav in ji devê jinan hatine gotin. “Lawikê Metîni”, “Derwêşê Evdî” û “Ehmedo Ronî” ji vana hinek in (Parlî, r. 21, 22).

Dîsa em ji Pariltiyî hîn dibin ku berîya îslamîyetê jinan li ba mêran jî stran gotine lê piştî îslamîyetê tenê di civatên jinan da strane. Piştî îslamîyetê dema ku jinekê li cihê ku mîr lê ne stran bigota, konên wan bi perdeyan dikirin du cih. Ev rewş di nava kurdên êzîdî da cuda bûye. Jinên kurd ên êzîdî di warê dengbêjîyê da ji yên din azadtir bûne. Lewra dengbêjên jin di nava wan da zêdetir in û ev jinan dikarîbûn bi mêran ra jî kilamên xwe bigotina (Parlî, r. 21, 22). Wekî ku em dê di beşên din da bibînin ev rewşa jinên êzîdî bi demê ra guherîye û di serdema Radyoya Erîvanê da jinên êzîdî jî ji ber dengbêjî û stranbêjîyê rastî gelekî zextan hatine.

Ji ber tunebûna çavkanîyan, niha nayê zanîn ku di serdemên berê da jin di warê dengbêjîyê da rastî pirsgirêkên çawa hatine. Wekî ku li jor jî hatîye behskirin dengbêjên jin ku navê wan tê zanîn yên herî kevn Gulê, Pero û Hemîdeyê ne. Piştî wanên ku navên wan tên zanîn û di derheqê wan da çavkanî hene, yên herî kevn Eyşe Şan, Meyrem Xan, Nesrîn Şerwan, Aslıka Qadir û Fatma Îsa ne. Pirsgirêkên ku di warê dengbêjîyê da derketine pêşîya wan ji xebatên ku li ser wan hatine kirin, tên zanîn. Em derbarê pirsgirêkên dengbêjên jin ên serdema dawî da yanî yên di roja me da jî ji teza Selda Oztürkê û belgefilma Rewşan Çelikerê hînî agahiyên giring dibin (Çeliker, 2014). Oztürkê ji bo teza xwe li Wanê bi dengbêjên jin ra hevpeyvînek kirîye. Dengbêjên wekî Gazin (Raziye Kızıl), Dengbêj Meryem (Meryem Tuncer), Dengbêj Mukaddes (Perihan Yıldırım), Dengbêj Muhacir (Muhacir Adsız) û Kevser Ersoz pirsgirêkên ku derketine pêşberî wan, anîne ziman û digel van pirsgirêkan jî karê xwe yê dengbêjîyê bînavber meşandîye.

Pirsgirêkên herî mezin ji ber çanda bavkanî û ji ber hincetên dinî derketine pêşberî jinan. Jin bi qedexekirin û zextên curbibur ra rûbirû mane. Dengbêjî, bi hinceta ku guneh e li jinan hatîye qedexekirin. Dengbêj Muhacirê tîne ziman ku ji ber gunehbûnê, dev ji dengbêjîyê berdaye. *Min xwe neda vî karî, min xwe da dîne xwe û Qur'ana xwe. Kalê min li Îranê xelîfe ye, wê çavê min kor bibe* (Öztürk, r. 164). Dengbêj Mukaddes dema ku behsa qeydkirina dengê xwe ya cara yekem ya di teybekê da dike, weha dibêje:

Bi bûka malê ra, me xelkên malê di xew ra kir. Qedexe ye, dê çawa jinek di teybê da dengê xwe qeyd bike, stranan bibêje. Tişteki wisa tune ye, qedexe heyê, mirin heyê. Wê te bê dudilî ser jê bike wele [ji bo mêrê xwe dibêje]. Dikin yanî. Me jî bi nepenî dengbêjî kirîye (Öztürk, r. 159).

Li Bakûrê, “Îro çanda bavkanî bi temamî nebe jî di çanda kurdî da berbelav e. Pergala eşîretê, bi mudaxeleyên sîyasî û tevgerên civakî qels bû.” (Zaman, 2019, r. 25). Vê qelsbûnê di civakê da cihê jinê jî guherand. Zextên ku li ser jinan hebûn bi temamî ranebûbin jî hinek sivik bûn. Dengbêjeka wekî Eyşe Şanê bi saya vê guherînê li bajarên Tirkîyeyê xebatên xwe domand û dengê xwe li hemû erdnîgarîya Kurdistanê belav kir. Wê dîsa jî gelek zehmetî kişandin lê ji guherînên civakî sûd wergirt û nav û dengê xwe li hemû welatî belav kir.

Dengbêj Muhacir Adsız jî derbarê mijarê da weha dibêje: “Piştî ku ez zewicîm strîna min qedexe bû, dema nezewicî bûm min digot. Min li dîwanan digot lê bavê min nedihîşt ku derkevim dîwanên mêran.” (Öztürk, r. 115). Ji van mînakên dîyar e ku mêr bi du awayan li dijî dengbêjîya jinan disekinîn. Ya yekem ew e ku mêran jin di hunera dengbêjîyê da ji xwe ra wekî reqîb dîtine lewra bi kêmi behsa wan kirine. Ya duyem jî jinekê dema ku bi karê dengbêjîyê mijûl bûye di civakê da pêşîya her kesî yan mêrê wê yan jî bavê wê li hember wê derketiye.

Astengîyeka din jî helwesta dewletên serdest a li hember ziman û çanda kurdî ye. Dewletên serdest bi taybetî di mijara ziman da gelek tund in û dengbêj jî rastî vê tundîyê hatine û hîn jî tîn. Helbet ev zextên hêzên serdest ne tenê ji bo jinan jî bo hemû dengbêjan bûn lê ji ber ku mijara me dengbêjên jin in, em dê tenê behsa astengîyên li ber jinan bikin. Piştî ku li Îranê Xumeynî dibe desthilatdar li hember stranbêjan, bi taybetî jî li hember jinan pêşî tê girtin. Îran Xanim jî yek ji wan e. Ew jî ber zextên dewletê mecbûr dimîne ku xebatên xwe bi nepenî bimeşîne (Yaş, 2020 r. 49, 50). Dengbêj Gazin di salên 1990an da ji ber ku stranên kurdî gotine sê doz lê hatine vekirin û ceza lê hatiye birîn. Ev zextên li ser wê di wan salan da namîne û di cotmeha 2010an da dîsa salek ceza lê tê birîn. Sebeba vê yekê jî dîsa du stranên kurdî ên bi navê “Megrî” û “Lo Lawo” ne. Hozan Canê (Saide Înac) di 20 salîya xwe da ji ber ku stranên bi kurdî dibêje tê girtin. Ew di 2018an da dîsa tê girtin û bi endamîya rêxistinê tê sîncarkirin. Digel ku parêzerên wê bêsûcbûna wê îsbat dikin dîsa jî ceza lê tê birîn. (Dündar, 2020). Canê piştî îtiraza parêzerên wê hat berdand lê di vê navberê da du salan di girtîgehê da ma (Rudaw, 2020).

Di derbarê jinan da mijareka din jî ew e ku gelek stranên ku ji aliyê jinan ve hatine afirandin ji aliyê mêran ve hatine gotin û belav bûne. Hemû çavkanî li ser vê mijarê li hev dikin. Ji ber ku jinan nikarîbûne wekî mêran bi rehetî derkevin nava civatan û li gund û bajaran bigerin, nikarîbûne hunera xwe di nava gelî da belav bikin. Stranên ku ji devê jinan tên gotin bi piranî mêran ji jinan guhdarî kirine û di nav gelî da belav kirine û gihandine heta roja me. Li ser mijarê mînakêka şênber jî heye: Dengbêj Reso li Qereziyê li gundê Qizqaniyê stranekê ji jineka bi navê Cewê guhdarî kirîye û ji ber kirîye. Dema ku Reso stranê ji ber dike û ji Cewê ra dibêje, ew kêfxweş dibe ku dê strana wê bi saya Reso belav bibe û neyê jibîrkirin (Badıkanlı, 2020). Gelek stranên ku ji devê jinan hatine gotin bi vî awayî gihîştine roja me û bûne anonîm. Lê pirseka weha heye “gelo hemû stranên ku ji devê jinan tên gotin bi rastî jî jinan afirandine an fenteziya mêrekî ye? An çiqasî wê rast e, çiqasî wê fantezî ye?” (Hêja, r. 41). Hêja di gotara xwe da vê pirsê dike û ji bo zelalkirina mijarê metodeka lêhûrbûnê pêşniyaz dike. Bi bikaranîna zimanî (bi peyvên ku hatine bikaranîn û uslûb) û bi perspektîfa axiverê/a stranê ev yek dikare were zelalkirin.

182 | Bi destpêka weşanên radyoyê ji bo jinan derfet çêbû ku dengê xwe di nav hemû civakê da belav bikin. Ev yek di dengbêjîyê da serdemeka nû bû. Ne tenê ji bo jinan ji bo hemû dengbêjan guherînên mezin derketin holê. Êdî dengbêjek ne tenê li herêmekê, dikarîbû li hemû welat nav û dengê xwe belav bike. Sistema patronajê hilweşîya lê radyoyan ev valahî dagirt. Çi jin çî mêr hemû dengbêjên ku îro dengê wan gihîştîye roja me, bi saya van qeydên plak û radyoyan e. Di vir da radyoyên herî giring bêguman Radyoya Bexdayê û Radyoya Erîvanê ne. Dengbêj û stranbêjên wekî Eyşe Şan, Meyrem Xan, Îran Xan, Nesrîn Şêrwan, Elmas Xan, Fewziye Mihemed, Gulbihar (Fayîze/Fatima) Mihemed di radyoya Bexdayê da; Sûsika Simo, Fatma Îsa, Aslıka Qadir, Belga Qado, Zadına Şekir, Cemîla Çawîş (Yaş, 2015, c1. r. 98, 421, c2. r. 74, 381). û gelekên din jî bi Radyoya Erîvanê derfet dîtine ku stranên xwe bi hemû gelê kurd bidin nasîn. Mînakên ku em dê niha li jêr bidin hemû ji Radyoya Erîvanê ne.

3. Dengbêjên Jin ên Radyoya Erîvanê

Li gor listeya dengbêjên Radyoya Erîvanê nêzî sî û sê jinan wekî dengbêj li wir stran gotine (Demirel, 2020) lê mixabin hejmara yên ku em di derbarê wan da xwedîyê agahîyan in gelekî kêr in. Heta yên ku ji gundan stranên wan hatine berhev kirin bi navê xwe yê rastîn jî di vê listeyê da nînin.

Kurdên Kafkasyayê peyva dengbêjî û stranbêjîyê di heman maneyê da bi kar tînin lê li gor tesnîfa dengbêjîyê, kesên ku di vê listeyê da ne, hemû wekî dengbêj nayên qebûl kirin. Me di gotara xwe da kesên ku stranên dengbêjîyê ên klasîk gotine wekî dengbêj,¹ kesên ku stranên dawetan gotine jî wekî stranbêj qebûl kirîye. Mînak, Sûsîka Simo û Dîlbera Wekîl ji ber ku stranên dengbêjîyê ên klasîk negotîne wekî stranbêj/hunermend werin qebûl kirin baştir e lê ji ber ku Sûsîka Simo bi xebatên xwe ji bo jinên kurd ên Kafkasyayê bûye pêşeng me nikaribû behsa wê nekira. Niha em dê dengbêj û stranbêjên Radyoya Erîvanê bidin nasîn. Ji ber ku Aslîka Qadir, Fatma Îsa, Belga Qado, Zadîna Şekir û Sûsîka Simo yên herî navdar û bibandor in, herî zêde agahî di derbarê wan da hebûn. Me jî li gor agahiyên heyî herî zêde li ser van sê navan nirxandinan kir.

3.1. Sûsîka Simo

Sûsîka Simo, di sala 1925an da li herêma Elegezê, li gundê Mîrekê, yê navçeya Axbaranê ji dayik bûye. Ew ji malbateka êzdî ye. Malbata wê di zaroktîya wê da koçî Gumrîyê kirîye. Ew li wir çûye dibistanê û perwerdeya bilind jî li Zanîngeha Erîvanê di beşa bijîşkîyê da temam kirîye (Yaş, 2019, r. 6). Sûsîka Simo piştî ku çar salan li nexweşxaneyan xebitîye dest bi karê reqas û stranbêjîyê kirîye (Oguz, 2021).

| 183

Sûsîka Simo di salên zanîngehê da sosyalîzmê nas dike û di derbarê mijarê da gelekî dixwîne. Paşê jî li gor sosyalîzmê ji bo pêşketina jinan dikeve nava hewildanan (Yıldırım, 2021, r. 133). Dewleta Sovyetê wê demê mafên giring dida jinan belkî jî ji ber vê yekê wê xwe bi sosyalîzmê ve girê dabû. Li gor şert û mercên wê demê ev helwesta wê ya sosyalîst bû derfet ku hunera xwe bipêş ve bibe û were naskirin. Sûsîka Simo li gel fikra sosyalîzmê wekî hemû hunermend û rewşenbîrên wê serdemê, gelek kurdperwer bû jî. Wê di hemû konserên xwe da cil û bergên kurdî ên gelêrî li xwe dikirin (H4). Wê kilamên gelerî ên sivik (ên govendê) digotin. Di hin stranên wê da jî pesnê jîyana Sovyetê, xebat, xwendin, partîya komunîst, Lenîn, Stalîn, kolxoz, sosyalîzm û pismamî/biratîya gelan dihat dayîn. Gelek stranên bi vî rengî Mecîdê Silêman dinivîsî, bi meqam dikir û bi Sûsîka Simo ra digot (Boyik, 2012, r. 80).

Sûsîka Simo, di sala 1946an da cara pêşî derketîye ser sehneyên Ermenî û bi kurdî straye. Ev yek ji bo dengbêjîya kurdî gaveka yekem bû lewra heta wê demê cara pêşîn bû ku dengbêjeka kurd li ser sehneyên dewletê bi awayeka fermî dihat naskirin. Ew ne tenê bi muzîkê ra bi şaxên hunerê yên wekî reqas û şanoyê ra jî mijûl bûye. Wê komên

1 Me di vir da tesnîfa Mahmut Begikî esas girt.

reqasê saz kirine ku bi terza opera û baleyê hunera xwe nişan daye. Herweha ew bi şanoyên Elegezê ra derketiye turneyan. Sûsika Simo yan beriya lîstika şanoyê yan jî piştî lîstikê derdikete ser dikê û stranên kurdî yên geleri distra. Herweha wê mamostetiya gelek komên govendê yên dilana kurdan ji kiriye. Jê ra “Gula Govenda” dihat gotin (Yaş, 2015, c1, r. 337, 338). Wê demê, cara pêşîn ji aliyê dewletê ve, tenê navê wê hatibû qebûlkirin û di sehneyên dewletê da tenê wê stranên kurdî distra. Sûsika Simo ne tenê li Ermenistanê, li Gurcistanê û hemû welatên Sovyêtê derdikete ser sehneyê û kilamên kurdî û ermenkî distra. Piştî vekirina Radyoya Erêvanê Sûsika Simo di radyoyê da jî stran gotin. Ew û Gulîzera Etar bûn jinên yekem ên kurd ku di Radyoya Erîvanê da strane.” (Gültekin, 2017, r. 31).

Sûsika Simo bi sazbandên wekî Şamilê Beko û Egîdê Cimoyî ra di koma folklorê da jî xebat meşandine. Nivê koma wê ermenî bûn lê bi kurdî distiran û govenda kurdî digirtin. *Îca qîz hebûn, ji wan qîzan çend heb Ermenî bûn, Kurd nedihatîn. Dê û bavê van nedihîştin.* Hevjînê wê Kolya Naftalyan sporvanek navdar bû. Wî di xebatên wê yên hunerî da gelekî alîkarîya wê dikir. Naftalyan, di turne û konseran da jê ra dibû alîkar (H4).

184 | Zewaca wê ya bi Kolya Naftalyanî ra bibû cihê nerazîbûna derûdora wê. Ew jineka ji kurdên êzdî bû û li gor bawerî û kevneşopîya êzdîyan nedibû ku ew bi mirovekî ra bizewice ku ji millet û dînekî din be. Herweha ew pîreka êzdîyan bû jî û di êzdîtîyê da pîrek tenê dikaribû bi pîrekê/î ra bizewiciya. Lê hejmara pîran li Sovyêtê kêmbû (H4). Sûsika Simoyê li hember van bertekan bi xwendin, şarezayî û dengê xwe, xwe di nav kurdan da dabû qebûlkirin û vê zewaca ku li dijî dîne êzdîtîyê bû jî dîsa dabû qebûlkirin. Wê bi Kolya Naftalyanî ra bername jî pêk dianîn û gelek caran li ser dikê bi hev ra jî distran, stranên duqolî digotin. Naftalyan, werzişvan bû, lê dengê wî xweş bû û bi kêfxweşî bi Sûsika Simoyê ra distra (Yaş, 2015, r. 337).

Li Ermenistanê, Orkestraya Flarmoniyê jî piştgiri dida hunera Sûsika Simoyê û rê li berê vedikirin. Wê, tevî hemû zehmetî û tengasiyan jî di warê hunerî da xwe wekî jineka kurd da qebûlkirin. Sala 1965an lûtkeya jîyana wê ya hunerî bû û wê li Meydana Sor gelek caran konserên mezin didan. Di van konserên wê da nav û dengê wê li seranserê Sovyêtê belav bûbû (Yaş, r. 337, 338). Ew bi piranî bi konserên xwe bi nav û deng bû û pir welatparêz bû (H4).

Di van konseran da Egîdê Cimo bi bilûra xwe û Karapetê Xaço ji bi stranên xwe gelek caran beşdar dibûn. Dema ku Sûsika Simo cara pêşî li Meydana Sor kosera xwe ya mezin dide, Wezîrê Eşo di rojnameya *Riya Teze'yê* da gotareka bi navê “*Sûsika Me*” dinivîse û wê weha pênase dike:

Sûsika me wek jineke kevneşop xeyal nekin. Performansa ku li ser dikê raber dike û sekna wê bi xwe ra heyrantiyek mezin dide avakirin. Bi taybetî jî ji hêla muzîkê da pirr baş e û dema ku perçeyên bijare hildibijêre û bi performanseke seymyan ra digihîne hev. Sûsik ne tenê li Rewanê, di demek kin da li Qefqasan jî bi nav û deng bû. Ji xwe Sûsika Simo beriya Radyoya Rewanê jî hebû (Oguz, 2022).

Bilêtên konserên wê berî çendîn rojan dihatin firotin û xilas dibûn. Gelî, ji dengê wê pir hez dikir. Wê stranên gelerî yên kurdî, govend û dîlanên kurdewarî bi gelê Kafkasyayê da naskirin. Ew bi van xebatan bû pêşenga danasîna çanda kurdî. Ev yek xizmeteka mezin bû ji bo çand û folklorê kurdî (Yaş r. 338). Herweha Sûsika Simo, bi serkeftin û cesareta xwe ji bo dengbêj û hunermendên kurd ên Sovyetê, bi taybetî jî ji bo jinan bû mînak. Wê qet kaset dernexistine. Hinek, sebaba vê yekê bi pirsgirêkên aborî ve girê didin, hinek jî bi şert û mercên Sovyetê ve girê didin, lê sebaba vê yekê zelal nîne (Can, 2021, r. 225).

3.2. Fatma Îsa

Fatma Îsa di sala 1934an da, li Ermenistanê, li navçeya Vêdiyê li gundê Erezdeyanê ji dayik bûye.² Ev gund nêzi Erîvanê ye. Navê bavê wê Îsayê Ûsivê Elo, navê dêya wê jî Başa Lelo ye. Ew ji eşîra Brûkîyan ji binemala Qerka ne. Xwişkêka wê bi navê Gurçek, xwişk û birayek wê jî ji dêya wê lê ji bavek din hebûne. Navê wan jî Fadiîl û Bacxanim e. Fadiîl li malêva li Platnîrovskê dimine, ku Fatma Îsa di salên xwe yên dawî da li wir dima. Lê Bacxanim niha li bajarê Almaatayê li Qazaxstanê dijî (Beğik, 2012).

Malbata Fatma Îsa hîn di sê salîya wê da bi nefikirina Stalîn ya 1937an rûbirû dimîne. Zaroktîya wê gelek dijwar derbas dibe. Di pênc salîya wê da şerê cihanê yê duyemîn dest pê dike. Fatma Îsa di şeş salîya xwe da bavê xwe, du sal bi şûn da jî dêya xwe wenda dike û bê dê û bav dimîne. Ew bi xwişka xwe Gurçek (Rindê) ra li ber destê apê xwe Mehmedê Ûsivê Elo mezin dibe. Di sala 1943an da apê wê jî Erezdeyanê mala xwe bar dike û li gundê Hemzelûyê (Marmaraşên) ku li navçeya Masîsê ye bi cih dibe. Fatma Îsa jî li Hemzelûyê dest bi xwendina dibistanê dike. Lê belê xwendina xwe naqedîne. Di sala 1959an da Fatma Îsa tevî malbata xwe dîsa bar dikin gundekî Masîsê bi navê Nêjirlûya Jêrîn (Yaş, c2. r. 74).

² Niha navê gund guhertine kirine Yêrasxavan, navê navçeyê jî niha Ararat e.

Fatma Îsa di sala 1947an da di 14 salîya xwe da bi kurê Xalê xwe Hemzê Sincê Bava ra tê zewicandin (Oguz, 2021). Mala xalê wê ji eşîra celalîyan e. Xesûya wê Xatûna Mehmedê Eto jê ra gelek baş e û jê hez dike lê zarokên wê çê nabin. Di nava civata kurdan da edetek heye. Ku zarok ji jinekê ra çê nebe, divê destûra zewaca mêrê xwe bide. Fatma Îsa jî nikare li hember vê kevneşopîyê bisekine û destûra zewaca mêrê xwe dide. Şeş zarokên mêrê wê ji jina duyem çê dibin ku çar qîz û du kur in. Navê kuran Resûl û Torin e lê di çavkanîyan da navên keçikan derbas nabin. Li gor çavkanîyan Fatma Îsa wekî zarokên xwe ji wan hez kirîye û zarokan jî wekî dêya xwe ya heq jê hez kirine û heta mirina wê, lê nihêrtine. Ev hezkirina wan piştî wefata wê tê dîtin. Bi taybetî di merasima cenazeyê wê da Resûl û Torin xwe wekî kurên wê yên helal dibînin û şîna wê dikin (Beğik, 2012).

Piştî hilweşîna Sovyetê di salên 1990î da rewşa aborî, siyâsî û civakî ya herêmên Kafkasyayê xerab bû. Ji ber vê yekê jî kurdên misilman û êzdî ji Ermenistanê û Gurcistanê derketin çûn cihên wekî Rûsya, Ukrayna, Qazaxistan û welatên Ewropayê. Malbata Fatma Îsa jî tevî mirovên xwe yên ji êla birûkan û celalîyan di sala 1989an da koçber bûn, çûn Rûsyayê. Ew li herêma Krasnodarê, li navçeya Korênovskê, li bajarokê Platnîrovskê bi cih bûn. Îro di vî bajarokê da 200 malên kurdan hene (Nêzî 1000 kesî). Fatma Îsa li maleka sade tevî malbata xwe, li wir dima. Li vir jî çûnûhatina mêvanan ji mala wê xalî nedibû.

186 |

Nexweşîna dil bi Fatma Îsa ra hebû. Xwişka wê Gurcek, dixwest wê bibe mala xwe ya li Almaataya ku paytexta Qazaxistanê ye. Xwişka wê û zarokên xwe ew dibir bijîşk, lê xwedîtî dikir û dixwest ku Fatma Îsa li cem wan bimîne. Lê wê nedixwest û ji wan ra digot: “Dev ji min berdin. Ez dixwazim herim mala xwe. Keda min û emeka min e ew mal. Dixwazim herim cem zarokên xwe.” Fatma Îsa di 15ê çileyê sala 2010an da ji ber nexweşîya dil di 76 salîya xwe da çû ser dilovanîya xwedê. Tirba wê li vê derê, li nav goristana kurdan hatîye çêkirin û peykerê wê li ser tîrbê hatîye danîn (Mihoyî, 2021). Di merasima cenazeya wê da jin kilama Miho li ser wê dibêjin. Di dema defna cenazê da zarokên ji hewîya wê li serê digirîn. Mahmut Begik di derbarê rojên wê ên dawî da agahîyeka weha dide:

Heta, di daweteka eqrebayek wan de, ku ketibû heyama rojên dawîyê yên jiyana Fatma Îsa de, hevala mina hêja Tamara Îbrahîmova, ji min re vîdeoyek dawetê şandibû. Tê de xuya dikir ku Fatma Îsa nikare rabe ser lingan û li ser erebeyê xwe ya destî de, car din kilama Miho digot û herkesê ku çav bi Fatma Îsa diket, diçûn destên wê maçî dikirin. Heya saniya wefata xwe, ew cil û bergên Kurdî ji ber xwe nekirin û wêneyeka wisa pêşkêşî me dikir ku weka mînakeke jina Kurd bû li hemberî me û hemû Kurdan (Beğik, 2012).

Wekî gelek dengbêjan meyla Fatimê Îsayê ji zaroktiyê da, li ser dengbêjiyê hebû. Dema ku zarokên gundî digihîştin hev govend digirtin û distran. Fatma Îsa ji wê demê da qabilîyeta xwe ya di vî warî da nişan dida. Ew bi dengê xwe yê zîz û zelal ji teva cuda dibû. Bira wê ji gelekî baş bû. Wê bi yek guhdarîkirinekê stran ji ber dikirin. Her dem gava di gund da dewatek dibû, ew di nava koma qîz û bûka da bû. Wan li odeyeka cuda distran û direqisîn. Fatma Îsa stranên xwe yên pêşin li sahiyan, li civinên qîz û xortan fêr bû (Mihoyî, 2021)

Xebatkarên Radyoya Erivanê bi rêya Kinyazê Îbrahîmî xwe digihînin Fatma Îsayê (H4). Li gundê Nêcirlûya Jêrîn gelek malbatên kurd diman. Di bihara sala 1964an rojekê berpîrsyarê radyoya kurdî ya Erivanê Xelîlê Çaçan Mûradov tê dibe mêvanê Mehmedê Silo yê berpîrsê malhebûna (kolxoz) gund. Bi pêşniyaza tiyê wê gazî Fatma Îsayê dikin ku li dengê wê guhdarî bikin. Xelîlê Çaçan li mala Mehmedê Siloyî cara pêşin bi Fatma Îsa û dengê wê dihese. Xelîlê Çaçan hema wê çaxê pêşniyaz dike ku ew di radyoyê da bibêje. Wan salan di radyoyê da êdî stranên Sûsîka Simo û Belga Qadoyê, paşê ji dengê Zadinê Şekir, Tukasa Xemoyê û yên din hebûn. Lê heta wê rojê qet jinek ji kurdên misilman li radyoyê nestirabû (Yaş, 2015, c2. r. 76). Ji bo ku Fatma Îsa di radyoyê da bêje destûrê ji mêrê wê dixwazin (H4). Gava Fatma Îsa tê radyoyê û distrê, dengê wê bi her kesî xweş tê. Xebatkarên radyoyê xasma ji strana wê ya Miho ra hişmetkar dimînin. Şewra radyoyê ya sazbandîyê biryar dide ku dengê Fatma Îsa qeyd bikin. Wê demê 5 stranên Fatma Îsa tên tomarkin. Ew ji ev in: Miho, Êrê Dînê, Şêro Dîno Lewendo (Li Ser Rîya Bajêr), Lo Lo Gede û Her Deme Deme (Yaş, 2015, c2. r. 76). Xelîlê Evdile ji bo van stranên li bilûrê dixê û miqama stranên digire. Fatma Îsa gelek stranên din ji dizanibû lê careka din neçû li radyoyê nestra û kilamên nû qeyd nekirin. Îro di arşîva Radyoya Erivanê da tenê pênc stranên wê yên navborî hene (Mihoyî, 2021). Pîsporên zargotina kurdî Celîlê Celîl, Nûra Cewarî û Tosinê Reşîd ji ser zarê wê gelek kilam, meqam û teqalîdên kurdewarî qeyd kirine (Yaş, 2015, c2. r. 76). Tosinê Reşîd di derbarê vê serdanê da weha dibêje:

Payîza sala 1968-an ez û Nûra Cewarî ji bo nivîsara stranên Fatma Îsa çûne navçeya Masîsê, gundê Nêcirlûya Jêrîn. Ji ber ku em ne bawer bûn, ka Fatma Îsa wê ji mer re bistirê, yanê na, em çûne mêvaniya Mehmedê Silo Babayêv. Kurdperwarekî dilsoz û jêhatî bû, seranser Kurdê Yekîtiya Soviyet Mehmedê Silo nas dikirin û rûmeta wî digirtin. Me dizanibû, wekî ji bo xatrê Mehmedê Silo be jî, Fatmê ji me re bistirê. Mala têr û tijî, mala ber-mêvanan, qedrekî baş ji me re

kirin û heta me nanê xwe xwar, Fatme bi xwişka xwe ve hatin. Bejn û bala wê, xeml û xêza Kurdî, bedewîya jineke bê qusûr. Di peyvandin û tevgera xwe de ji gelek maqûl bû. Van gişkan bi hev ra usan hev dikir, wekî mirov ji wê şerm dikir. Û ji me re stira, stranek, du, sê, çar... û te texmîn dikir, wekî nikare nestrê, stran beşekî jiyana wê ne. Di peyvandinê de gelekî şermoke bû, lê bi merdane distira. Qey bêjî stran bûbû teherê jiyana wê Paşê wê û xwişka xwe stranên govendê gotin: wê digot, xwişkê ji lê vedigerand... (Mihoyî, 2012).

Tosinê Reşîd di heman çavkanîyê da tîne ziman ku xizmên Fatma Îsayê ji wan ra gotine ku çend kilamên wê yên ne dîyar hene û ev stran di salên dawî da hatine tomarkirin. Li gor agahîyên ku tên dayîn ev qeyd li ba zarokên wê ne.

Fatma Îsa digel israrên jî careka din naçe radyoyê û dengê xwe qeyd nake lê ew dengbêjî û stranbêjîya xwe wekî yên berê di dawet û şahîyan da îcra dike. Yanî ew dengbêjîyê wekî karekî profesyonel nake. Ew bi vî taybetîya xwe dengbêjîyê bi halê herî resen temsîl dike. Kesên li derdora wê hem bi dengbêjîya wê hem jî bi şexsiyeta wê jê ra gelek rêz girtine û qedr û qîmet danê. Ev yek di wan dîmenên hin şahîyan da ku beşdar bûye, xwe bi zelalî nîşan dide.³

3.3. Belga Qado

Derbarê Belga Qado da agahî gelekî kêr in. Di hemû çavkanîyan da li ser malbat û jiyana wê tenê bi çend hevokan behsa wê tê kirin û hin şaşî di wan da hene. Agahîyên herî rast Prîskê Mihoyî ji keça wê Nazika Miraz hîn bûye. Belga Qado di sala 1934an da li herêma Têlînê li gundê beroj (dûzkend) ji dayik bûye. Malbata wê ji Qersê koçî Kafkasyayê kiriye. Bavê wê Qadoyê Mecid, dêya wê Naza Beyroye. Navê wê yê rastîn Belgîzer e lê di Şadenameyê (nifûsê) da Porsor dinivîse. Mêrê wê Mirazê Nadir ji eşîra kaşaxayê bû û 10 salan jê mezintir bû. Berîya ku wê nas bike zewicî bû. Jina wî ji Tilbisê bû û terka wî kiribû. Di sala 1950î da Belga Qado dergistî bûye. Mirazê Nadir roja daweta wê, wê direvîne. Ew di 1954an da koçî Erîvanê dikan. Çar qîz û pênc kurên wan çê dibin lê sê kur û keçek dimirin. Mirazê Nadir kesekî gelek bihêrs bûye û gelek zext li jina xwe û zarokên xwe kirine. Kurekî wî bi navê Grîşa ji jina wî ya din hebûye (Mihoyî, 2021).

Belga Qado xwedîyê dengêkî xweş bû. Wê ji zaroktîya xwe da stran gotine. Ew bi stranên evînî yên klasîk û yên mêranî, navdar bûye. Di arşîva Radyoya Erîvanê

3 <https://www.youtube.com/watch?v=Yc4iA9rIRWA>
https://www.youtube.com/watch?v=OiR_86HQO5Q

da ji dehan zêdetir stranên wê hene. Strana wê ya “Kura Çiyayê Topê Qersê” gelek navdar bûye. Wê gelek stranên duqolî bi dengbêjên wekî Karabêta Xaço û Efoyê Esed ra gotine (Yaş, 2015, c2, r. 329). Hevjînê wê di sala 1980ê da miriye. Piştî salên 1990î Belga Qado tevî malbata xwe ji ber şert û mercên civakî û aborî koçî Rûsyayê bajarê Yaroslavê kir. Belga Qado di sala 2004an da wefat kir. Ew li goristana êzdiyan a li bajarê Tûtayêvê veşartin (Mihoyî, 2021).

Aslika Qadir di bernamêyekê da behsa Belga Qado dike û zehmetiyên ku wê kişandine vedibêje. Wê ji ber hevjinê xwe pir tengasiyê kişandiye. Ew ji ber dizîya pez û dewaran ketibû girtîgehê. Birayê wê Têmûr di koma Sûsika Simo da bû. Sûsika Simo û birayê wê ji bo ku ew biçê di radyoyê da stranan bibêje piştgiriyê didinê. Belga Qado hem ji tîrsa mêrê xwe hem jî ji ber zextên gelî newêre. Dibêje: “wê xelk bibêje mêrê wê girtî ye ew jî çûye radyoyê.” Sûsika Simo û birayê wê cesaretê didinê û wê qanî dikin. Belga Qado tê û li radyoyê çend stranan qeyd dike. Dema ku hevjinê wê dibihîze ku ew çûye radyoyê, ji girtîgehê jê ra nameyekê dişîne û gefa kuştinê lê dixwe. Dibêje: “an tê terka radyoyê bikî yan jî ez ê te bikujim.” Lê Belga Qado bi piştgirîya birayê xwe û Sûsika Simo dengbêjîya xwe didomîne û dev ji Radyoya Erîvanê bernade. Aslika Qadir van agahîyan ji qîza Belga Qado bihîstîye. (Aslika Qadir, Têmûrê Xelîl, 2021). Belga Qado konser nedane û tenê di radyoyê da stran gotine. Di radyoyê da têkiliya wê bi Sûsika Simo û Zadîna Şekir ra baş bû. Belga Qado bi orkestraya radyoyê ya ermenîyan ra jî, çend stran gotine (H3).

Ku em dengbêjîya jinan jî wekî ya modern û ya klasîk bikin du beş divê em dengbêjîya Belga Qado jî wekî ya Fatma Îsa bi halê dengbêjîyê yê resen qebûl bikin lewra wê jî ji xeynî stranên ku li Radyoya Erîvanê hatine qeydkirin, xebatên muzîkê nekirine. Wê wekî Aslika Qadir û Zadîna Şekir kaset jî dernexistine.

3.4. Zadîna Şekir

Zadîna Şekir di sala 1943an da li navçeya Axbaranê li gundê Poştê ji dayik bûye. Malbata wê êzîdî û welatparêz bû. Ew ji eşîra rojkîyan in ku ji Dîgora navçeya Qersê koçî Ermenistanê kirine. Zadîna Şekir li Erîvanê çûye dibistana navîn.

Zadîna Şekir di temenekî gelek piçûk da dest bi stranbêjîyê dike. Ew stranên xwe zêdetir ji yên şahî û dawetan hildibijêre û bi wan navdar dibe (Yaş, 2015, c2, r. 293, 294). Wê di sala 1955an da di Radyoya Erîvanê da, dest bi dengbêjîyê kirîye. Ew keça birayê Xelîlê Çananî ye. Apê wê ji bavê wê destûrê dixwaze ku di radyoyê

da bistrê. Zadîna Şekir yek ji jinên ewil e ku di radyoyê da dengbêji kirîye. Strana wê ya navdar “Dêresorê Piçûkê” di belgefilmê kurdên Ermenistanê da wekî fon hatiye bikaranîn (H4).

Zadîna Şekir di warê hunerê da gelek çalak bû. Wê bi Egîdê Cimo ra di sala 1970î da orkestrayekî damezirand. Ew bi vê orkestrayê konseran didin û beşdarî şahîyan dibin. Herweha Zadîna Şekir di komeka reqasê ya ermenî da jî cih digire. Wê bi Mecîdê Silêman û gelek hunermendên navdar ra stranên duqolî gotine. Zadîna Şekir di radyoyê da bi Aslîka Qadir ra di têkilîyeka xurt da bûye. Ew bi hev ra beşdarî konseran dibûn. Egîdê Cimo û Eskerê Boyik li Qazaxistanê konser li dar dixin. Zadîna Şekir jî bi Aslîka Qadir ra beşdarî van konseran dibe. Dema ku konferansa kurdî ya neteweyî li Moskovayê tê lidarxistin Zadîna Şekir û Aslîka Qadir jî beşdarî şahîya wir dibin. Li vir tevî gelek navdar û siyasetmedarên kurd serokê Enstituya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan jî nas dikin. Ev hevnaşin jê ra rêyek nû vedike. Nezan wan vedixwîne Parîsê. Ew diçin Fransayê û li wir beşdarî şahîyan dibin (Yaş, 2015, c2, r. 293, 294). Zadîna Şekir li wir plakekê derdixe. Kendal Nezan ji bo wê dibêje “Bilbila Kurdistanê.” Enstituya Kurdî ya Parîsê hem li ser plaka wê hem jî li ser afîşên konserên wê navê “Bilbila Kurdistanê” bi kar tîne.

190 |

Zadîna Şekir li hemû Kurdistanê navdar bûbû û dihate hezkirin. Çêkirina peykerê wê yê li Hewlerê vê yekê nîşan dide. Zadîna Şekir di sala 1998an da bi Hemîdê Mecîd ra albumeka hevpar derxistîye. Di vê albumê da zêdetir stranên rîtmîk ên govendê hene (Kom, Hekîmo, 1998, H4).

Di malbata Zadîna Şekir da ji xeynî wê birayên wê jî bi hunerê ra eleqedar dibûn. Birayê wê yê mezin Omerê Şekir, di koma Sûsika Simo ya folklorî da govendgerê sereke bû. Herweha birayê wê yê din Şaîsmail jî di pîyesa Gîkor da rola sereke dilîst.

Zadîna Şekir jineka modern û gelekî bedew bû. Ew li hember kevneşopîya êzdayetîyê derket û bi ermenîyekî ra zewicî. Hevjînê wê Kamo di xebatên wê yên hunerî da her tim piştgiri didayê. Malbata wê û xizmên wê ev zewac qebûl nekirin. Wê ji ber vê yekê gelek zehmetî kişandine. Li hember zehmetîyan ew pir ji hevjinê xwe hez dike. Keçek û kurek wan çê dibin. Li gor agahîyan zarokên wan di nav çanda ermenî û kurdî da diçin û tîna jî ber vê yekê tengasiyan dikişînin. Zadîna Şekir û hevjinê xwe digel hemû pirsgerêkan heta dawîya jîyana xwe bi hev ra dimînin.

Zadîna Şekir di sala 2008an da li Erîvanê wefat dîke û wê li wir dispêrin axê (Yaş, 2015, c2, r. 293, 294). Zadîna Şekir di Radyoya Erîvanê da herî zêde bi Mecîde Silêman ra stranên duqolî gotine.

3.5. Aslîka Qadir

Aslîka Qadir di 1ê Adara sala 1945an da li Ermenistanê li navçeya Axbaranê (Aragasotin) hatiye dinyayê. Malbata wê bi eslê xwe ji eşîra sipkan in. Ew eşîreka êzîdî ne ku li herêma Mûsilê diman. Di salên 1800î da ew nefiyê Serhedê û Kafkasyayê kirine. Malbata wê li gundekî nêzikî çiyayê Elegezê ku navê wî gundî jî Elegez e dima. Navê dêya wê Geveza Celîl, navê bavê wê Qadirê Emer e. Ew keça malbatê ya şeşem e.

Zaroktiya Aslîka Qadirê li gundî derbas dibe. Ew dibistana gundî ya dehsale li wir diqedîne. Aslîkê, piştî perwerdeya lîseyê (Akıncı, 2020). di sala 1962an da ketiye ezmûna zanîngehê û li Zanîngeha Erîvanê fakulteya Rojhilatzanîyê di Beşa Zimanê Farisî û Ermenkî da dest bi xwendina bilind kirîye (Gültekin, r. 166, 173). Hevjînê wê Canîkê Têmûr li heman zanîngehê di beşa felsefeyê da dixwend. Wan li zanîngehê hev nas kirin û zewicîn. Du zarokên wan bi navê Armanc û Stêlla (Stêrk) çê bûn (Akıncı, 2020).

Aslîka Qadir ji ber ku li gund mezin bûbû çanda kurdî ya devkî pir baş hîn bûye. Ew ji bavê xwe hînî dengbêjî bûye. Qadirê Emer bi xwe jî dengbêjekî baş bû û keça xwe Aslîkê bi xwe ra dibir dawet û şahîyan. Wê li van şahîyan bi bavê xwe ra stran digotin.

Apekî wê di dema Stalîn da, nefî Sibîryayê kiribûn. Bavê wê ji bo wî stranên şîne digotin. Wî heta mirina xwe di xewnan da jî ji bo wî stran digotin. Di vê atmosferê da bi Aslîkê ra, ji bo dengbêjîyê eleqe û sempatiyeka mezin çê dibe. Di dibistanê da meyla wê pêşiyê li ser stranên ermenkî bû. Ew di dibistanê da jî aktîf bû û distira. Herweha wê li zanîngehê jî distra. Qabilîyeta wê ya muzîkê û dengê wê yê xweş di radyoyê da jê ra bû derfetekî û ew di dengbêjîyê da bi pêş ve çû.

Aslîka Qadir keçeka kurdperwer bû. Serhildana Mele Mistefa Barzanî ya li hember rejîma Baasê kelecaneke mezin bi kurdên Sovyetê ra çê kiribû. Aslîkê wê demê 19 salî bû. Wê jî wekî keçeka welatparêz û milethez ev bûyer bi meraq dişopandin. Radyoya Erîvanê bi qasî 100, 200 metreyî nêzî zanîngeha wê bû. Ew ji bo ku nûçeyên herî rast hîn bibe diçû radyoyê. Wê li wir tu kes nas nedikir

lê zebatkaranê radyoyê gelek kêfa xwe jêra anîn û ew bi kêfxweşî pêşwazî kir. Wê agahîyên ku di derbarê serhildana Barzanî da hîn dibû li zanîngehê bi hevalên xwe ra par ve dikirin. Ew pirî caran li ser mijarê bi hevalên xwe yê ermenî ra diket nîqaşan. Di nav wan hevalên wê yê zanîngehê da Levon Terpetrosyan jî hebû ku piştî hilweşîna Sovyetê bû Serokwezîrê Ermenistanê (Akıncı, 2020).

Strangotina Aslıka Qadir li radyoyê weha dest pê dike: Li radyoyê dê ji bo 250 salîya şairê ermenî Sayat Nova merasimekî bihata amadekirin. Egîdê Cimo ji Aslıka Qadir dipirse dibêje tu dikarî stranên Sayat Nova bibêjî? Stranên wî jî gelek zehmet bûne, Her kesî nikarîbûye bistirê. Ji ber ku meyla wê pêşî li ser stranên ermenkî bû wê bi awayeka jixwebawer ev kar qebûl kir. Pirtûka Sayat Nova ku Heciyê Cindî û Fêrikê Ūsiv ji ermenkî tercumeyê kurdî kiribûn danê. Egîdê Cimo ji wê û Sûsika Simo ra dibêje her yek ji we du heb stranên wî hildin û bixwînin. Ji wan ra dibêjin xwe amade bikin em dê ji bo pîrozkirina salvagera rojbûna Sayat Nova dengê we qeyd bikin. Aslıka Qadir du helbsetên wî ji xwe ra hîlbijartin. Yek “Hetanî Hebim” ya din jî “Kemençe” bû. Egîdê Cimo wê dişîne ba berpirsiyarê beşa muzîkê Aram Mîrangulav. Mîrangulav jî mûzisyenê ermenîyan ê navdar bû. Ew çawa dengê Aslîkê dibihîze dibêje “here studyoyê, bila qeyd bikin.” Lê dengê wê bê prova bi carekê qeyd dikin. Vê yekê gelekî wê aciz dike. Ew vê yekê weha bi bîr tîne:

Pêşiyê ew her du stranên Sayat Nova bûn. Ew bûne dergûşên min... Got herin û binivîsin (qeyd bikin). Em çûne xwarê ketine studyoyê û tu zanî çî bû? Wekî ecêb qet bi min ra prova nekirin, yekser nivîsîn. Ez gelek xeyidim, dilê min gelek êşîya. Ez hatim min serokê beşa muzîkê Titalê Efo bû wê demê. Min ji Titalê Efo ra got em di dewsa kurda da ne. Bi min ra qet prova nekirin. Runiştin lêxistin û yekser nivîsîn. Wisa jî min bi xwe nebawer, tirs bi min heye. Min got çawa tiştek wisa dikin? Ermenî bi mehan prova dikin û li ser straneke xwe dixebitin. Vana ez piştguh kirim. Wek keçe kurda ye... Min jî got na wisa çênabe...Ew niha jî di fonda radyoyê da hene û têne weşandin (H3).

Li hember vê pirsgirêkê qeyda stranên gelek baş derket li dû wan stranên, dor hat ser “Welatê Me Kurdistan e”. Egîdê Cimo teksta gotinên stranê û muzîka wê jê ra dibêje û du caran pêre distrê. Aslîkê gotinên wê jî ezber dike û bi daxwaza wî bi grûba wî ya muzîkê ra dikeve studyoyê û prova dike. Wê demê ji ber zextên Sovyetê bikaranîna peyva Kurdistan pirsgirêk bû lewra Sovyet welatê kurdên wir dihate qebûlkirin. Ya din jî ew bû ku nedixwestin di nav wan û Tirkîyeyê da pirsgirêk derkevin. Ji ber van sedeman bername û stran berîya ku werin weşandin

bi ermenkî dihatin wergerandin û ji aliyê mijarên qedexê ve dihatin kontrolkirin. Piştî kontrolê hê destûra weşanê dihat dayîn.

Aslika Qadir ji bo radyoyê ji bavê xwe gelek piştgirî didît. Ji bo qeydê lazîm bû li benda valabûna studyoyê bisekinîna lewra pêşî ermenîyan stranên xwe qeyd dikirin. Heta ku karê wan diqedîya dibû derengê şevê. Wê çaxê Aslikê ji Egîdê Cimo ra dibê bûye dereng wê bavê min nebêje heta wê saetê çi dikî? Egîdê Cimo ku bavê wê baş nas dike û di daweta birayê wê da jî li bilûrê xistiyê diçe cem bavê wê Qadirê Emer û ji bo tomarkirina stranan jê destûrê dixwaze. Aslikê pir nedixwest lewra dersên wê pir bûn lê bavê wê karê radyoyê û gotina stranan wekî xizmeteka ji bo gelê kurd dibîne û dibê “Here bi xebera Egît bike. Ez zanim tu li ku yî.” Li ser vê yekê ew diçin û heta berbanga sibê stran tomar dikin. Wê çaxê 10-11 stran qeyd kirine. Di nav wan stranan da “Welatê Me Kurdistan e” jî hebû. Vê stranê di nav gel da pir deng da û Aslika Qadir bi vê stranê hat naskirin. Wê ev stran bi hesteka dilsozî û evîneka mezin got. Egîdê Cimo mehekê seranser bi şev û roj li ser meqamê stranê rawestîya. “Her ji bo ku gelê kurd bindest e, ku Kurdistan digirî, diêşe, diperçiqe, dianî bîra xwe û dixwest hesta neteweyî berz û hêz bike.” (Gültekin, r. 71, 72).

Çiroka weşandina stranê jî bi qasî stranê balkêş e. Wekî hemû stranên din vê stranê jî peşiyê dişînin Moskovayê lê li vir destûrê nadin. Di stranên evînî û yê gowendê da pirsgirêk dernediket lê ji ber peyva Kurdistanê ev stran ji sansurê derbas nebû. Rêveberîya radyoyê jî strana “Welatê Me Kurdistan e” xistin nav stranên geleri û bi vî awayî weşandin. Gel jî ev stran bi tirs guhdarî dikir. Aslika Qadir tîne ziman ku wan ev stran ji ermenîyan jî veşartine û dema ku lê guhdarî dikir yekî li ber derî nobet digirt da ku kes pê nehise (Gültekin, r. 71, 72).

Ew di listikên şanoyê yê bi navê Gikor û Kumsorî jî wekî listikvan cih digire. Ew di listika Kumsorê da bi Wêzîrê Eşo ra listîye. Aslika Qadir keçîka kumsor, Wezîrê Eşo jî rola gur listîne. Rejîsorê ermenî Nigîyakosyan perwerdeya listikvanîyê dida wan.

Mikayêlê Reşîd û Fêrikê Ūsiv jî ji ber welatparêzîya wê, pê serbilind dibûn û helbestên xwe yê nû nîşanê wê didan û di derbarê wan da fîkra wê dipirsîn (H3).

Rewşa jinan li nav kurdên Sovyetê jî ne baş bû. Pêşveçûna rewşenbîrî nêrîna li hember jinan pir neguhertibû. Dema ku jinek biçûya radyoyê bistira bertek didît. Malbata wan astengî derdixist lê ji bo Aslikê ne wisa û bû ew heta ku zewicî bi

azadî diçû radyoyê. Heta bavê wê bi xwe piştgirî didayê. Dîsa jî li derdora wan kesên ku bi çavekî nebaş nêzikê wê dibûn jî hebûn (Gültekin, r. 71, 72).

Aslıka Qadir berîya ku bizewice karê radyoyê bêpirsgirêk meşandiye lê zewaca wê li ber karê wê yê hunerî bû astengîyeka mezin. Ji ber ku ew diçû radyoyê pirsgirêkên mezin di nav wê û hevjinê wê da derdiketin. Digel ku hevjinê wê nedixwest jî ew diçû radyoyê. Kesên derdora wan bi taybetî tiyê wê ji bo xebatên wê yên radyoyê jî hevjinê wê gazin dikirin.

Piştî ku zewicim min bîst salan stranan negot. Piştî ku çûm Ewropayê min dîsa dest bi hunerê kir û niha jî di wî îşî da me. Dengê min û Radyoya Rewanê hem bûne bextewariya min hem jî bûne bextreşîya min... Tiyê min mêrê min dineqand û ji bo çûna min a radyoyê astengî derdixist, hesûdî dikir, şer derdixist. (H3).

Şerên wan ên bi sedema dengbêjiyê û çûna radyoyê bêhizûriyeka mezin di nav wan da pêk dianî. Heta ev yek digihîşt asta tundîya fizîkî jî. Ji ber vê yekê Aslıka Qadir biryar dide ku jê biqete û bi awayekî resmî du caran serî li mehmekê jî dide. Hevjinê wê pê ra soz dide ku dê ev pirsgirêk biqedin lê heman pirsgirêk didomîyan. Mêrê wê strangotina wê û çûna wê ya radyoyê tu carê qebûl nekir. Ew jî mecbûr ma ku di nav hunera xwe û malbata xwe da tercihekê bike. Ev tercih jî bû sebeb ku demeka dirêj ji hunerê bi dûr bikeve.

Hevjinê Aslıka Qadirê, Canîkê Têmûr di 5ê gulana 1982an da vefat kir (Akıncı, 2020). Ew tevî du zarokan tenê ma. Aslıka Qadirê wê demê mamostetîya ziman û edebîyata ermenkî dikir. Ji ber ku pispora farisî bû jî Dewleta Sovyetê xwest wê wekî tercumana zimanê rûsî-farisî bişîne Afxanistanê (Gültekin, r. 69). Ew di sala 1985an da çû Afxanistanê û du salan li wir xebitî. Aslıka Qadir piştî ku vegeerîya Ermenistanê li wezaretê perwerdeyê wekî metodîsta ziman û edebîyata ermenkî dest bi kar kir (H3).

Piştî hilweşîna Sovyetê wekî gelek kurdên li wir, Aslıka Qadir jî mecbûr ma ku ji Ermenistanê koç bike. Nijadperestên Ermenistanê bi gef û zextan gelek kurd mecbûrî koçê kirin (Gültekin, r. 73).

Ew strana “Welatê me Kurdistan e” wekî şoreşek dibîne û tîne ziman ku her hunermendek bi berhemên xwe teswîra rewşa gelê xwe dike. Yanî hunermend bixwaze jî nexwaze jî bi sîyasetê ve girêdayî ye.

Gelek hunermend hene ku hunera xwe ji bo fikrên xwe yê polîtîk feda dikin û estetîka hunerî piştguh dikin. Digel wan Aslıka Qadir ji destpêkê heta niha tim xwestîye bi muzîkê herî baş derkeve pêşberî guhdaran. Herçiqas wê jî li gor konjoktura wê demê, stran li ser Lenîni jî gotine û hesta xwe ya neteweperweriyê jî bi muzîkê daye der. Wê tim giringîyek mezin daye kalîteya muzîkê jî. Ev hesasîyeta wê hê ji qeyda wê ya yekem da dîyar dibe. Dema ku dengê wê bêprova bi carek qeyd dikin ew gelek aciz dibe. Ew hêza hunermendiyê bi pîrbûna berheman ve girê nade û dibêje “bira yek be bira beg be.” Tenê sê albumên wê hene. Yek Qasimo ye, Yek jî daye Enstituya Kurdî ya Parisê. Ya din jî amade ye lê hem dema wê tune ye hem jî hewesa wê ji bo van xebatan tune ku derxe. Aslıka Qadir bi kurê Reşîdê Baso, hunermend Dilovan ra li Erîvanê û Ewropayê konser dane. Ji xeynî muzîkê, kêfa wê gelek ji govenda kurdî ra jî tê. Bi taybetî ji temaşekirina govendê hez dike lê bi xemgînî tîne ziman ku nizane govendê bigire (H3). Hunermendên wekî Eyşe Şan, Mihemed Arifê Cizrawî û Şakiro gelek bandorê li Aslıka Qadirê kir lê di nav hunermendên kurd da cihê Mihemed Şêxo jê ra cuda ye (Qadir, 2017).

Aslıka Qadir di sala 1995an da tevî du zarokên xwe pêşî diçe Polonyayê ji wir jî diçe Almanyayê û îltîcayî dewleta Almanan dike (Akıncı, 2020). Ew niha li Almanyayê diji. Kurê wê û qîza wê zewicî ne. Sê neviyên wê hene. Carinan beşdarî çalakîyên hunerî û çandî dibe. Pîrozbahîya serxwebûna Kurdistanê û ya “100 Saliya Sykes-Picot” hin ji wan in (Gültekin, r. 73). Aslıka Qadir bi ermenî, rusî, farisî, almanî û darî dizane (Akıncı, 2021). Herweha Aslıka Qadir di malperên wekî riataza û Rojewa Kurd da nivîsan jî li ser kurdan dinivîse (Qadir, 2018).

Encam

Me di mînaka Radyoya Erîvanê da dît ku jin di warê muzîk û dengbêjîyê da gelekî çalak in. Wan ji bo ku hunera dengbêjîyê îcra bikin tekoşîneka mezin dane û bi ser ketine. Jinên wekî Sûsika Simo, Fatma Îsa, Aslıka Qadir, Zadiîna Şekir, Belga Qado û gelekên din di nav çandeka kurdewar da mezin bûne û hunera xwe li ser vê hîmê ava kir. Xaleka hevpar ya van kesan jî ew e ku hemû jî xwediyê hesteka kurdperwer ya xurt bûne. Wan ji bo hunera xwe bi civaka kurd ra têkoşin kir lê ji bo mafê kurdan jî her tim bi hesteka neteweperwer tevgerîyane. Sûsika Simo her tim bi cil û bergên kurdî derketîye sehneyê, Fatma Îsa bi stranên xwe û hemû jîyana xwe dengbêjîya kurdî ya herî resen temsîl kirîye. Aslıka Qadir bi stranên xwê û hemû tevgerên xwe helwesta xwe ya neteweperwer nişan daye.

Jinan dengbêji hem îcra kir hem jî berhemên dengbêji afrirandine. Ji ber ku jinan di dîwanan da cih negirtine îcrakirina dengbêjiyê wekî karekî mêranî hatîye qebûlkirin lê di nav gelî da gelek jinan jî ev kar kirine. Jinan ne di dîwanan da be jî di şîn û şahîyan da berhem firandine û li kelepura dengbêjiyê zêde kirine.

Di sedsala 20an da du faktor hebûn ku di dengbêjiyê da guherînên mezin pêk anîne. Yek jê hilweşîna pergala patronajê ye, ya din jî derketina amûrên qeydkirinê yê wekî plak û radyoyê ne. Bi van du faktorên muzîka kurdî û dengbêji ketîye qonaxeka nû. Di vê qonaxa nû da êdî jin zêdetir derdiketin pêş. Dengbêjên wekî Eyşe Şan, Meyrem Xan, Nesrîn Şêrwan, Îran Xan, Aslîka Qadir, Fatma Îsa, Belga Qado di radyoyan da ji xwe ra cih dîtine.

Di serdema nû da jin ji ber dengbêji û stranbêjiyê rastî gelek zextan hatine. Ev zext ji du alîyan ve pêk hatine. Yek jê zextên civakî bûn ku gel bi çavekî nebaş li çûna wan a radyoyê dinêrî. Ya din zextên malbatî bûn. Gelek jin dema ku biçûna radyoyê ji alîyê mêrekî ji malbata xwe ve hatine astengkirin. Digel vê yekê hin kes jî bi piştgirîya mêrekî ji malbata xwe, dikarîbû vî karî bimeşîne. Di vir da Belga Qado û Aslîka Qadir mînakên herî berbiçav in. Aslîka Qadir ji bavê xwe piştgirîyeka mezin wergirtîye û bi hêsanî dengbêji kirîye, lê piştî ku zewicîye mêrê wê û tîye wê jê ra bûne asteng. Ew ji ber van zextan 20 salan ji hunerê bi dûr ketîye. Mînakeka din jî Belga Qado ye. Digel ku mêrê wê bûye asteng birayê wê jî piştgirî dayê û Belga Qado bi piştgirîya birayê xwe dengbêji kirîye. Di vir da tişteki berbiçav heye ku berîya radyoyan jinan ji bo dengbêjiyê astengî nedidîtin lewra wan tenê di nav civakên biçûk da digotin û ev nedibû pirsgirêk.

Jin di serdemên din da li derveyê dîwanê diman. Ku bistrana jî li pişt perdeyekê digotin lê bi radyo û plakan dengê wan ji pişt perdeyê derket û gihîşt girseyên mezin. Yanî belavbûna radyoyan derfetek da jinan lê di civakeka feodal da ev yek nedihate pejirandin. Ji ber vê yekê jinan tekoşîneka mezin daye. Wan bi vê tekoşînê ne tenê di hunerê da di warên din da jî mafên xwe wergirtine û ji civakê ra bûne mînak.

Çavkanî

- Aras, A. (2018). *Evdalê Zeynike*. Stenbol: Weşanxaneya Nûbiharê.
- Bazidî, M. (2010). *Adat û rusumatnameyê ekradiye*, Amed: Weşanxaneya Lisê.
- Beğik, M. (2013). *Dengbêj Resoyê Gopala*. (Teza Masterê) Zanîngeha Artukluyê, Mêrdîn.
- Can, P. (2021). *Qulungên Rewanê*. Wan: Weşanxaneya Sîtavê.
- Celil, C., Ordixan C. (2016). *Zargotina kurda* (êpîk,dastan), c.3, Wien: Înstîtûta Kurdzanîyê.
- Çiftçi, T. (2015). Di çarçoveya çanda devkî de di nav civaka kurdan de dengbêj û saziya dengbêjîyê *Kurdish Studies* (1), 110-125.
- Gürür, Z. (2014). *Dengbêjî di peywenda patronajê de* (Teza Masterê) , Zanîngeha Artukluyê, Mêrdîn.
- Hêja, (2015). Mîkro-têkoşîn û mîkro-şoreşa dengbêja jin, *Zarema*, (4), 39-49.
- Kardaş C. (2012). “Tarihsel olayların dengbêjler aracılığıyla sözlü kültüre aktarılması”. Batman University International participated Science and Culture Symposium, 18-20 Batman, r. 201.
- Kardaş, C. (2012). Tarihsel olayların dengbêjler aracılığıyla sözlü kültüre aktarılması, *Yaşam Bilimleri Dergisi*, 1(1), 199-206.
- Mojab, Ş. (Ed.). (2013). *Devletsiz ulusun kadınları*. (Wer. Kılıç, S. Ekin U. Fahrîye A.). Stenbol: Weşanxaneya Avestayê.
- Öztürk, S. (2012). *Kadın kimliği bağlamında kültürel bellek ve van merkezdeki kadın dengbêjliği yansımaları*, (Teza masterê). Zanîngeha İstanbul Teknikê, Stenbol,.
- Sağnıç, F. H. (2014). *Dîroka wêjeya kurdî*, Stenbol: Enstituya Kurdî Ya Stenbolê.
- Uzun, M. (2006). *Dengbêjlerim*, Stenbol: İthaki Yayınları.
- Yaş, Z. (2015). *Şakarên muzîka kurdî*, Amed: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.

Yaş. Z. (2020) Dengbêjîya Serhedê ji ser zarê jinekê: Îran Xan (mucered). *Dilop* (14), 49-49.

Yıldırım, K. (2021). *Kürt kadını*. Stenbol: Weşanxaneyê Avestayê.

Çavkanîyên Dijîtal

Mahmut Beğik. FATMA ISA: Dengbeja Kurd ya Geleri. Dîroka Gihandinê:16.12.2021. <http://kurdist.ru/2012/09/13/fatma-isa-dengbeja-kurd-ya-geleri/>

Abdulsalam Akıncı. Erivan Radyosu'nun yaşıyan son kadındengbêji: Aslıka Qadir. Dîroka Gihandinê: 21.11.2021.

<https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/05/17/erivan-radyosunun-yasayan-son-kadin-dengbeji-aslika-qad>

Pirîskê Mihoyî. Dengbêja Nemir Belga Qado. Dîroka Gihandinê: 12.03.2022. <https://www.bernamegeh.org/2021/09/09/dengbeja-nemir-belga-qado-piriske-mihoyi/>

198 | Prîskê Mihoyî. Dengbêja gelêrî û xwediya strana "Miho" Fatima Îsa. Dîroka Gihandinê: 25.02.2022. Dengbêja gelêrî û xwediya strana "Miho" Fatima Îsa | www.avestakurd.net

Albama Zadina Şekir û Hemîdê Mecîd. (Hekimo) 1998. Kom mûzik. Dîroka Gihandinê:09.03.2022. <https://music.youtube.com/channel/UCLShxeZZ-vrLRVpt-llSyvQ>

Aslıka Qadir. Li ba xuşk u birên xwe, yên li xerîbiyê. Dîroka Gihandinê: 4.04.2021. <https://rojvakurd.com/li-ba-xusk-u-biren-xwe-yen-li-xeribiye/>

Ferîd Mîtan. Hunermenda Kurd Aslıka Qadir: "Miletê ku hurmet û siyanetê nede hunermendên xwe, ew tu carî nabe milet". Dîroka Gihandinê.16.02.2022. <https://buyerpress.com/kurdi/?p=11205>

Aslıka Qadir. "Miletê Êzîdî Li Ermenistanê Çê Bû." Dîroka Gihandinê:16.02.2022. <https://krd.riataza.com/2018/01/19/milete-ezidi-li-ermenistane-ce-bu/>

Abdurrahman Gümğüm, “Kürt folkloru ve Reso’nun stranlarında Kürt folklor unsurları - 1” Dîroka Gihandinê: 21.06.2022.

“Welatê me Kurdistan e “Aslîka Qadir - Temurê Xelil. Dîroka Gihandinê: 25.10.2021. https://www.youtube.com/watch?v=xCkm0-4_1vI

Çeliker Rewşan. Dengên Bakûr. Dîroka Gihandinê: 12.02.2021. <https://www.youtube.com/watch?v=sUTMaBaB4Yw>

Can Dündar. Hazan Cane davası. Dîroka Gihandinê: 17.02.2022. <https://artigercek.com/guncel/hozan-cane-davasi-134386h>

Celal Badıkanlı. Belgefilma Reso. Dîroka Gihandinê: 16.12.2020. <https://www.youtube.com/watch?v=AiR84j5L-mU>

Ferid Demirel. Erivan Radyosu’nun 900 Şarkılık Kürtçe Arşivi Dijital Platformlarda. Dîroka Gihandinê: 21.10.2021. <https://m.bianet.org/bianet/sanat/223461-erivan-radyosu-nun-900-sarkilik-kurtce-arsivi-dijital-platformlarda>

İkram Oğuz. Dengbêja dengzêrîn: Sûsika Simo. Dîroka Gihandinê: 10.01.2022. <https://krd.riataza.com/2021/11/22/dengbeja-dengzerin-susika-simo/>

Lîsteya Hevpeyvînan:

Zeyneb Yaş: Dîroka Jidayikbûnê: 1974, Sêrt - Zimanê Fransî û Perwerdehî. Vekolera Çande û Muzekar.

Têmûrê Xelil: Dîroka Jidayikbûnê: 1949, Erîvan. Xwendina lîsansê: matematîk-fîzîk. Pişe: Rojnamevan û xebatkarê Radyoya Erîvanê.

Mehmud Evdila (Mahmut Beğik): Dîroka Jidayikbûnê: 1958, Qozlix-Hezoya Herêma Xerza. Mamosteyê Îngilizî, Vekoler.

Aslîka Qadir: Dîroka Jidayikbûnê: 1954, Erîvan , dengbêj, zîmannas.

WERGÊRAN

Haig, G. (2023). Pêveberên kompleks ên nav+kar di kurmançiyê da.
(werg. Altinkılıç Ü.) *Folklor û Ziman*. 3(2), 201-248

Wergirtin/received: 11.01.2023

Qebûlkirin/accepted: 18.01.2023

PÊVEBERÊN KOMPLEKS ÊN NAV+KAR DI KURMANCÎYÊ DA

Geoffrey Haig*

Wergêrana ji îngilîzîyê: Ümran Altinkılıç**

Kurte

Pêveberên kompleks (PK) ku ji navekê (N) û karekê (K) pêk tên taybetmendiyeka berbelav a kurdîyê ye ku bi giştî taybetmendîya zimanên îndo-îranî û îndo-aryan e. Mohananê (1997) ji bo PKyên bi vê tîpê yên zimanê hindî analîza argument parvekirinê pêşniyaz kiriye ku li gor wê hem nav hem kar tevkarîyê li binyada PKyê dîkin. Di vê xebatê da boçûna argument parvekirinê li ser dataya kurdîyê tê bicihkirin, lê aşkera dibe ku ew bi tenê binkoma PKyên N+K rave dike. Herweha ji bo tîpeka taybetî ya PKyê analîzeka ji hêla pevketina sintaktîk hêsantir e û ji hêla empirîk ve besendetir e. Ez digihîjim wê encamê ku tu model bi tena serê xwe temamê çêbûna PKyê di kurdîyê û zimanên têkildar da rave nake. Di dawîyê da ez amaje bi vê pirsê dikim bê ka çima PKyên N+K di zimanên rojhilatî yên îndo-ewropî da hene, lê hema hema qet di zimanên îndo-ewropî yên Ewropayê da tune ne.

| 201

* Zanîngeha Bambergê, Zimannasiya Giştî, geoffrey.haig@uni-bamberg.de. Ev gotar berê bi vî navî di vir da hatiye weşandin: Noun-plus-verb complex predicates in Kurmanji Kurdish: Argument sharing, argument incorporation, or what?, *Sprachtypol. Univ. Forsch. (STUF)*. Berlin 55 (2002) 1, 15-48

** Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, umranaltinkilic@artuklu.edu.tr

NOUN+VERB COMPLEX PREDICATES IN KURMANJÎ

Abstract

Complex predicates (CPs) consisting of a noun (N) and a verb (V) are an ubiquitous feature of Kurdish, and of Indo-Iranian and Indo-Aryan languages generally. Mohanan (1997) has proposed an argument-sharing analysis for this type of CP in Hindi, according to which both the noun and the verb contribute to the argument structure of the CP. In this paper the argument-sharing approach is assessed against the Kurdish data, but it transpires that it only accounts for a subset of N+V CPs. Furthermore, for one specific type of CP an analysis in terms of syntactic incorporation is simpler and empirically more adequate. I conclude that no single model accounts for the totality of CP-formation in Kurdish and related languages. Finally, I address the question of why N+V CPs should have emerged in the eastern members of Indo-European, yet are almost completely lacking in the Indo-European languages of Europe.

Destpêk

Pêveberên kompleks di xebatên dawî yên zimannasiyê da têra xwe bûne cihê baldariyê (bin. bn Cattell 1984, Grimshaw & Mester 1988, nivîsên di Alsina û yd 1997ê da û Schultze-Berndt 2000). Ez dê di vê xebatê da li ser tîpeka taybetî ya PKyan, li ser yên ji nav û karekê pêkhatî hûr bibim. Kara *maç kirinê* ya kurdîyê nimûneyeka vê tîpa PKyê ye:

(1) *Ferho destê melê maç kir* [...] [Mey: 43]

Pirsgirêka zimanî ya bingehîn di PKyên vê tîpê da ew e ku ew ji du bêjeyên aşkera û cuda pêk tên, lêbelê ji gelek hêlan ve weku yekeyeka tekane tevdigerin. Di mijara analîza peyvrêzî ya PKyan da du kêşeyên têkildar hene: Ya yekem, teqezîya statuya Nyê ye; ew argumenteka Kyê ye, yan ew bi temami di kompleksa karî da hatiye beşdarkirin, yan wê statuyeka navberî heye? Ya duyem ew e bê ka pêveberên wisa pevketî çawa binyadên wan risteyan diyar dikin ku ew sereyên wan in, û bi taybetî N çi tevkarîyê li binyada argumentî dikin?

Ez dê di vê xebatê da ji bo van pirsan û yên têkildarî wan ên li ser PKyên N+K yên kurdîyê hin pêşniyazan bikim û wan têkildarî pêşniyazên berdest bikim ku ji bo binyadên manend ên di zimanên din da hatine kirin. Ez du alternatîfan dinirxînim. Ya yekem boçûna argument parvekirinê ye ku Mohananê 1997 ew ji bo PKyên hindîyê bi kar anîye. Bi dîtina wê, N argument tayînkerek e, û N û K bi hev ra binyada argumentî ya risteyê diyar dikin. Dîtineka alternatîf Nyê di kompleksa karî da beşdarkirî dinirxîne, yanî bi wê N ne argument tayînker e (Rosen 1989). Ez digihîjim wê encamê ku ji van boçûnan yek jî bi awayekî tetmînker dataya kurdîyê bi temami rave nake. Her yek ji wan ji bo tîpeka taybetî ya PKyê ravekirineka meqûl dabîn dike, lêbelê nikarin ravekirineka qanîhker a PKyan weku taybetmendîyeka tîpolojiîk a xwesa zimanî dabîn bikin.

Beşên xebatê bi vî awayî ne: Di beşa 2yem da ez ji perspektîfeka tîpolojiîk bi kurtî li PKyan dinêrim. Beşa 3yem agahîyên paşxaneyî li ser kurdîyê dide û pêşnumayeka kurt a taybetmendîyên têkildar ên sîstema karan dabîn dike. Ez di beşa 4em da analîza xwe ya PKyên kurdîyê pêşkêş dikim û di beşa 5em da dataya kurdîyê li gor boçûna argument parvekirinê ya Mohanan (1997)ê ya ji bo zimanê hindî dinirxînim. Ez di beşa 6em da li ser hin kêşeyên mayî radiwestim û li ser mijara derketina/xuyabûna diakronîk a PKyan di kurdîyê û zimanên têkildar da pêşniyazinan dikim.

1. Pêveberên kompleks ji perspektifeka navzimanî

Alsina û yd 1997 pêveberên kompleks bi awayekî neformel wisa pênase dikin: Pêveberên kompleks “pêveberên pirsere ne; ji yekê zêdetir ji hêmanên zimanî (morfem yan bêje) pêk tên ku her yek ji van hêmanan tevkarîyê li beşeka wê agahiyê dike ku bi normalî bi sereyekê ve girêdayî ye.” Lêbelê kurtenêrînek li nivîsarên wê kitêba ku ev pênasekirin tê da ye, nîşan dide ku pênasekirineka weku vê berfireh jî nikare hemû karanînen tesbîtîkirî yên terma “pêvebera kompleks” vegire. Dîyardeyên jêrîn hemû weku “pêveberên kompleks” tên pejirandin û ev lîste ebeden ne bêkêmanî ye:

1. Karên ji hêla morfolojîk ve sîmpleks ên neergatîf ên weku *danceê* ‘reqîsîn’ di îngilîzîyê da (Hale & Keyser 1997)
2. Kombînasyonên pirtik+leksemeka karî, bn *reki rohana* bi macarî mot. ‘ber bi eceleyê ve’ (Ackerman & Lesourd 1997)
3. Pêveberên ji bêjeyeka ji hêla morfolojîk ve kompleks tenê pêkhatî, bn *kozatîf* di zimanê çîçevayî da (Alsina 1997)
4. Avaniyên karên rêzekî ku bi kêmanî du leksemên karî di wan da hene (Durie 1997)
5. Kombînasyonên karên alîkar û sereke di hin zimanên Ewropayê da (Rosen 1997)
6. Kombînasyonên navekê+karekê, bn di hindîyê da (Mohan 1997)

Li gel ku daxwaza vedozîna yekrengîyê di nav cihêrengîyê da cihê famkirinê ye, halê hazir ev sînorfirêhiya terma “pêvebera kompleks” wê yekê dijwar dike ku mirov qadeka tekûz a vekolîna navzimanî biresimîne. Bo nimûne ku em pênasekirina xwe sist bikin da ku pêveberên ji hêla morfolojîk ve sade jî vegire, weku Hale & Keyser 1997 engaşt kirîye, *kozatîfên* ferhengî yên weku *kill* ‘kuştin’ îngilîzîyê dikevin nav sînorên pêveberên kompleks, ku ew bi tenê yek ji namzedên potansiyel e. Di rastîyê da ev encama mebestkirî ya boçûna Hale & Keyser e, lê divê zehmetiyên ji perspektifeka navzimanî bîn dîtin (û heta hîmdarkirina ji perspektifeka ji hundirê îngilîzîyê jî cihê nîqaşê ye, bin. Kiparsky 1997). Encama ku ez ji van tiştan hemûyan derdixim ev e: Heger terma “pêvebera kompleks” bi wê armancê bê bikaranîn ku van dîyardeyên li jor rêzîkirî hemûyan vegire, hingê ew ji bo berawirdkirina navzimanî qadeka guncayî ava nake.

Ji ber vê yekê ev xebat bi binbeşeka karên kompleks sînokirî ye ku ew PKyên ji navekê û karekê pêkhatî yê vebijêrka 6em a jorîn in. Di gelek zimanan da ev tîpa PKyan ya N+K heye. Di zimanên îndo-aryanî da ew pir zêde berbelav in. Ew bi awayekî nerîtî bi navê “karên pevgihayî” hatine binavkirin (Masica 1991: 368) da ku ji karên lêkdayî bîn cudakirin ku ev karên zincîreyî yê bi kêmanî ji du karan pêkhatî ne (bin. Butt 1997 ji bo xebatên dawî li ser karên kompleks ên K+Kyê di hindî/ûrdüyîyê da).¹ Di japoniyê da PKyên N+K yê li ser bingeha kara sivik *suruyê* bi awayekî tekûzane hatine belgekirin (Grimshaw & Mester 1988). Di tamîlî û bi giştî di zimanên dravîdî da ji bikaranînên PKyên N+K berbelav in (Annamalai & Steever 1998:124). Herçend weku “beşdarkirin” (bb Nilsson 1986) hatibin nirxandin jî, di tirkîyê jî da weku zimanên polînesî PKyên N+K hene (bin. Rosen 1989 û dewama vê xebatê). Divê em amajeyê bi PKyên hin zimanên awistralyayî jî bikin ku Schultze-Berndt 2000 bi hûrgilî ew di çarçoveya zimanê jamînjûngî (non-pama-nyungan) da analiz kirine. Ez dê li vir nedim nav dataya zimanên awistralyayî, ji ber ku PKyên wan ne ji kombînasyonên nav+kar, lê ji kombînasyonên hevkar+kar pêkhatî ne ku ev kategoriyeka hinekî cuda ye. Di zimanên îranî da ku kurdî yek ji wan e, PKyên N+K berbelav in (ji bo farsiyê bin. Telegdi 1955, Meyer-Ingwersen 1974, Sheintuch 1976 û Windfuhr 1979: 113-120). Lêbelê di rêzimanên nerîtî da bi kurtî hatibe behskirin jî (bn Bedir Khan & Lescot 1986: 160-165), PKyên kurdîyê di çarçoveyeka zimannasîya modern da nehatine vekolan. Helbet ev kurteya hanê ne bêkêmanî ye. Mebest bi tenê ew e ku dataya kurdîyê di konteksteka berfirehtir a tîpolojîk da bê bicihkirin.

2. Kurdîya kurmancî: paşxane, data, binyad

2.1. Zimanê kurdî û bikaranîna jêderan

Kurdî zimanekî bakurrojavayî yê îranî ye ku kurd li temamê başûrrojhilatê Tirkîyeyê, li bakurê Îraqê û li beşine Îran, Sûriye û Ermenistanê pê diaxivin. Du zaravayên sereke yê kurdîyê hene: soranî (kurdîya navendî) û kurmancî (kurdîya bakurî). Asta jihevfmkirina axiverên her du şêwezaran dimîne li ser asta marûzbûna wan a li zarê din. Ev xebat li ser esasê dataya ji kurdîya kurmancî ye; lêbelê heta ku bi taybetî hewce neke, ez dê bi tenê bibêjim kurdî, her carê nebêjim kurdîya kurmancî.

1 Zincîreyên KKyê bi maneya xuyangî di kurdîyê da tunene, lêbelê avaniya kozatîf ya periferastîk ya bi kara *danê* ji hêla binyadî ve pir dişibe “avaniya destûrdanê” ya ûrdüyê ku Buttî (1997) ew weku pêvebereka kompleks nirxandiye.

Di demên cuda da weku zimanekî kêmine di perwerdeyê da statuyek wî çê bûbe jî, kurdî li tu deran ne zimanê neteweyî ye. Formên wî yên nivîskî hene ku li dewletên Sovyeta berê bi alfabeya kirilî, li Îraq û Îranê bi ya erebî û li Tirkîyeyê bi ya latînî ne. Di nav weşanên latînî da li ser gelek mijarên standardîzasyonê lihevkirineka berfireh heye (bin. Matras 1989). Giring e mirov dîyar bike ku piraniya kurdan perwerdeya xwe ya fermî di zaroktîyê da bi zimanî din distînin, lê xwendewerîya bi kurdîyê behremendîyek e ku di temenên bîrbirîyê da û bi piranî li dîyasporayê fêr dibin. Loma kurdîya kurmancî ku Z1ê siruştî yê bi milyonan kurd e, ji bo pir kêman kesan “Z1ê nivîskî” ye. Standarda ku îroj şêwe digire bi piranî ji hêla wan axiveran tê dîyarkirin ku di heman demê da fêr jî dibin (Dorleijn & Leezenberg 2000). Ji ber vê yekê darazên li ser hin avaniyan gelek caran bi awayekî berbiçav li gor axiveran diguherin. Helbet ev yek ne xasî axiverên kurdîyê tenê ye, li nav axiverên îngilîzîyê jî darazên cihêreng hene. Lêbelê di navbera statû û bikaranîna zimanekî weku îngilîzîyê û yekî weku kurdîyê da ferqeka pileyî heye ku yê yekem berhema standardîzasyona sedsalan û bîngeha perwerdeya cemawerî ye, lê yê duyem hîn nû standardeka bê navendeka polîtîk bi dest dixê. Pirsgerêkeka din di nirxandina dataya kurdîyê da ew e ku polîtîkayên zimanî yên zextker yên Tirkîyeyê, kurdî kiriye mijareka siyasî ya zêde zêde hesas.² Îhtimal heye ku agahîder peyvên mikemelen siruştî red bikin, sebaba vê yekê jî ne rêzimanî ye; ji ber wê ye ku xwe weku “kurdên petî” nabînin.

Ji ber sebebên jorîn, min analîzeka PKyan ya data-jêder hilbijart: Dataya sereke ji korpuseka kurdîya edebîyat û rojnamegerîya hevçerx tê (bin. Pêvek). Ji bo hin kêşeyên din ên têkildar, darazên qebûlbarîyê ji du axiverên xwecih hatin wergirtin, lêbelê ez lê miqate bûm ku aliyên giring ên analîzê xwe nespêrin darazên wisa.³ Ligel hin guherokiyên di datayê da, di qada pêveberên kompleks da hin binyadên neguher tîn dîtin ku ez dê serê xwe bi wan ra biêşînim.

2.2. Têperî û rêzandin di kurdîyê da

Nosyona têperîyê ji bo sîstema karan a kurdîyê pir giring e, loma ez dê pêşî zelal bikim bê ez vê termê bi çi maneyê bi kar tînim. Di kurdîyê da, hewce ye mirov bi kêmanî du tîpên cuda yên têperîyê ji hev veqetîne. Sebabên vê yekê bi awayekî

2 Ji bo hûrgilîyên polîtîkaya Tirkîyeyê li ser kurdîyê bin. Skutnabb-Kangas & Bucak 1995 and Haig 2001.

3 Ji bo İsmet Ramm û İsmail Sever gelekî spasdar im ku wan bi sebeka bêdawî û bi rûkenî bi seetan bi min ra li ser kurdî gengeşe kir.

herî baş bi van nimûneyên PKyan tên nişandan:

(2) *wî jî can da [...]* [Gir: 15]

(3) *Biharê dest pê^a kirîye* [Uzun: 9]

Ji hêla semantîk ve her du riste jî bûyerên yekbeşdar derdibirin ku di wan da kontrol, vîn, deqîqî û veguhastina çalakîyê tune, yanî, weku mirov texmîn dike ev bûyer ji hêla semantîk ve teneper in (bb Hopper & Thompson 1980). Lêbelê karên *kirin* û *danê* bi maneya ferhengî têper in û avanîya ergatîf han didin (bb bikerên tewandî). Mirov dikare heta çî dereceyê risteyên (2) û (3)ê weku yekbûnekê têper bihesibîne, ev yek kêşeyek e ku em dê li jêr li ser rawestin. Lêbelê di her hal û karî da em dikarin bibêjin ku ev riste rêzandina ergatîf ya bi gelemperî têkildarî têperîyê pêşan bidin ji, ji hêla semantîk ve qezîyeyên teneper derdibirin.

Ji ber nelihewîyên bi vî rengî divê mirov di navbera têperîya ferhengî û têperîya risteyî yan sintaktîk da cudahîyeka termînolojîk daîne ku ya yekem taybetmendîyeka leksemên karên sîmpleks ên munferîd e û ya duyem taybetmendîyeka risteyan e.⁵ Têperîya ferhengî taybetmendîyeka neguher a leksemên karî ye, loma bo nimûne mirov dikare wê bide ber taybetmendîya zayendî ya navan. Ew di taybetmendîyên teşeyî yên têkildarî poleka karan ya diyarkirî da xuya dike. Di kurdîyê da taybetmendîya giring a karên têper ew e ku di demên borî da wan rêzandina ergatîf heye, lê di demên nuha da rêzandina akûzatif heye. Bi gotineka din rêzandina rewş û qalibên rêkeftinê ligel karên têper li gor demê diguhere. Lêbelê karên teneper rêzandineka yekreng a tekane heye ku li gor demê naguhere (bin. Matras 1992/1993, Matras 1997, Dorleijn 1996 û Haig 1998 ji bo ergatîfîyê di kurdîya kurmancî da).

Avanîya kanonîk a ergatîfîyê di kurdîya kurmancî da bi sê taybetmendîyan tê karakterîzekirin. Ez dê bikerên têper bi BTyê, berkarên têper bi Byê û bikerên teneper bi BNyê amaje bikim.

4 Bêjeya *pêyê* objeyeka pêşdaçekî ya vala ye (pêşdaçeka *biyê* bi cînava tewandî *wê/wî* ra kelijîye). PKyên bi vî rengî di xebatê da hatine paşguhkirin, ji ber ku di wan da pirsgrîkên taybetî yên wisa hene ku li derveyî çarçoveya vê xebatê ne.

5 Boçûnên pirtebeqe yên têperîyê di analîza gelek zimanên din da hatine bikaranîn, bn Saliba (zimanên okyanûsî, zimanê papûa gîneya nû, gengeşekirî di Margetts 1999: 39-49 da), înguşî (bakurê naverasta kafkazî, Kafkas, (Nichols 1975) yan Zazakî (Anatolia, Iranian, Paul 1998).

(4) Taybetmenîyên teşeyî yên avaniya ergatîf a kanonîk

(i) Rêkeftina kesî li ser karê: Kar ji hêla kes û hejmarê ve ligel berkara têper (B) rêk dikeve.

(ii) Nişankirina rewşê ya Byê: B di rewşa xwerû da ye.

(iii) Nişankirina rewşê ya BTyê: BT di rewşa tewandî da ye.

Ev taybetmendî di hevoka (5)ê da tèn nişandan: rewşa tewandî ya BTyê (*wan*), rewşa xwerû ya Byê (*ez*) û rêkeftina karê ji hêla kesî û hejmarî ve ligel Byê (1y):

(5) *Wan jî ez dîtîm* [Mey: 21]

Xala ku divê di pêwendîya berdest da bê dupatkirin ew e ku avaniya ergatîf bi tenê ji hêla spesîfikasyona ferhengî ya pêvebera sereke tê diyarkirin; karakterîstîkên semantîk yên risteyê yên weku vînitî yan kontrolê (ku bn di ergatîfiya hindîyê da rolekê digêrin) tişteki naguherînin. Heger karek ji hêla ferhengî ve têper diyarkirî be, bêyî ku kontekst li ber çavan bê girtin ew rêzandina ergatîf han dide.

Helbet karên têper taybetmendîyên semantîk û reftarî yên curbicur nişan didin ku di hemû zimanan da ev hene. Bo nimûne gelek ji wan rewşên dubeşdar refere dikin; hin ji wan kontrola li ser beşa BTyê amaje dikin; gelek ji wan hikim li ser Byekê dikin; û piraniya wan paşgira têperkirinê *-andê* nastînin. Lêbelê ji van taybetmendîyan tu yek nikare hemû endamên polê rave bike û hin ji van taybetmendîyan ji bo karên ji hêla ferhengî ve teneper ji lidar in. Ji ber vê yekê ji bo pênasekirina têperiyê boçûna pûtepêdayîtir ew e ku mirov wê di çarçoveya **rêzandina li gor demê** da binirxîne. Li gor vê yekê em karên têper bi vî awayî pênase dikin:

(6) Pênaseya kara têper

Di karên têper da rewş nişankirina argumentên sereke li gor guherîna dema karê diguherin. Di karên teneper da naguherin.⁶

6 Dibe ku xwîner meraq bikin bê ka çima pênase bi hêsani ranagihîne ku karên têper rêzandina ergatîf han didin. Di deqan da gelek risteyên bi karên dema borî yên têper hene ku ji avaniya kanonîk ya ergatîf ya di (4) û (5)ê da şayesandî bêpar in, loma me têperî bi vî rengî pênase kir. Weku Dorleijn (1996) nişan dide, di hin devokên kurmancîyê da taybetmendîyên rewşa nomînal û rêkeftina bikerî heta dereceyeka berbiçav nepêbendî hev in. Di deqên min vekolayî da, taybetmendîya tekane ku ji bo hemû avaniyên ergatîfê hevpar e, *rewşa tewandî ya BTyê* ye, loma derbirîna pênasekirinê di (6)ê da ye.

2.2.1. Hevkarîgerîya têperîya ferhengî û ya sîntaktîk

Berevajî têperîya ferhengî, têperîya sîntaktîk taybetmendîyeka risteyan e. Heger risteyek rê bide FNya berkara rasterast, ew têper e (helbet dibe ku berkara rasterast ji ber sebebên pragmatîk bê jêxistin; loma pênase dimîne li ser wê yekê bê ka mirov dikare berkareka rasterast dabîn bike bêyî ku rêzimanîbûnê xera bike, ne li ser hebûna wê ya aktuel e). Îcar berkareka rasterast çi ye? Berkarên rasterast di kurmancîyê da xwedî van taybetmendîyên jêrîn in:

(7) Taybetmendîyên berkarên rasterast ên prototîpîk di kurmancîyê da:

(i) Berkarên rasterast nedaçekî ne.

(ii) Di risteyên ji hêla pragmatîk ve nêtar da berkarên rasterast hema berî pêveberê ne.

(iii) Di rêzandina akûzatif da berkara rasterast dikeve rewşa tewandî (heger bi maneyeka giştî yan cinsî nehatibe bikaranîn).⁷

(iv) Di rêzandina ergatif da berkara rasterast rêkeftina kes û hejmarê li ser pêveberê dîyar dike (b.b. (5)).

(v) Bi tenê berkarên rasterast piştî pasîfikirina risteyê vediguherin bikerê (bb RAMM 2000).

Nimûneyên berkarên rasterast bi karên sade di (8) û (9)ê da tèn dayîn:

(8) *Ez ê nuha cêr dagirim û bê* [Mey: 64]

(9) *Ez ê hedîyekî bidim te [...]* [Mûş]

Li aliyê din berkarên nerasterast yan daçekî ne, yan hema piştî pêveberê û tewandî ne, weku teya di (9)ê de.

Pênaseya me ya têperîya sîntaktîk xwe dispêre hebûna potansiyel a berkareka rasterast di risteyê de; lê pola bêjeyan ya weku “karên têper” binavkirî, di (6)ê da li gor guherîna nîşankirina rewşê li pey guherîna demê tèn pênasekirin. Têperîya ferhengî çawa têkilî têperîya sîntaktîk dibe? Têkilî têra xwe rasterast e û mirov dikare bi kurtasî wisa rave bike:

(10) Bi tenê karên têper dikarin berkareka rasterast bistînin; karên teneper nikanin. Lêbelê hemû karên têper berkarên rasterast nastînin.

⁷ Bi zelalî nayê zanîn bê ka di bin kîjan mercan da berkarên rasterast ji bo rewşê nenîşankirî ne, lê ew bi zelalî girêdayî faktorên weku nasarbûn û giştîbûnê ye.

Bi gotineka din heger berkareka rasterast hebe, miheqeq kar ji hêla ferhengî ve têper e, lê ev mentiq berevajî naxebite: Nebûna berkareka rasterast misoger nake ku kar teneper e. Ji bo nimûnekirina vê yekê, li nimûneyên jêrîn binêrin:

(11a) *ez bi Tirkî nizanîm*

(12a) *ez bi wan mêran nakenîm*

Ne kara *zanînê* ne jî ya *kenînê* berkareka rasterast distîne. Her duyan jî temamkareka daçekî bi daçeka *biyê* heye. Loma her du riste jî ji hêla sîntaktîk teneper in û wisa dixuye ku xwedî heman binyadên argumentî ne. Lêbelê dema ku mirov risteyan vediguhêrine dema borî ferqeka sereke aşkera dibe:

(11b) *min bi tirkî nedizanî* [Mey: 6]

(12b) *ez bi wan mêran nekenîm*

Forma bikerê di (12a) û (12b)yê da eynî maye, lê di navbera (11a) û (11b)yê da di rewşa bikerê da û di binyada rêkeftinê ya li ser karê da guherînek heye. Bi gotineka din rewş û rêkeftina ligel karê di kara *zanînê* da li gor demê diguherin, lê di ya *kenînê* da naguherin. Ligel ku wisa dixuye ku her du kar heman binyadên sîntaktîk bi rê ve dibin, ew aîdî du polên cuda ne. Loma binyada argumentî her tim ne nişaneyeka bawerîder a têperiyê ye.⁸

Ku mirov bi kurtî dubare bike, me di vê beşê da du tişt tesbît kirin: Yekem, ligel ku têperîya ferhengî û ya sîntaktîk têkildar in, di navbera wan da beramberbûnêka yek-bi-yek tune ye -bb (11) û (12)ê. Duyem, kareka ji hêla ferhengî ve têper taybetmendîya xwe ya têperiyê diparêze, semantîka risteya ku ew tê da hatiye bikaranîn karîgeriyê li vê yekê nake -bb (2) û (3)ê.

3. PKyên N+K di kurdîyê da

Di kurdîyê da hin derbirînên pêveberî yên adetî hene ku ji leksemeka karî û ji leksemek yan çend leksemên nekarî pêk tên. Em dê ji vira pê ve weku PKyan amaje bi wan bikin. Mirov dikare PKyên kurdîyê li ser bingeha du parametreyan polîn bike: Pola ferhengî ya hêmana nekarî û têperîya hêmana karî. Em berê xwe bidin pola ferhengî ya hêmana nekarî, em dikarin bibêjin ku sê ihtîmalên sereke hene:

8 Carinan *zanîn* bêyî ku ji hêla maneyê ve ferqeka mezin çê bibe, berkara rasterast ji distîne. Lêbelê avaniya bi berkareka daçekî bêtir asayî ye.

1. Hêmana nekarî naveka aşkera ye, weku *derman kirinê*.

2. Hêmana nekarî hevalnaveka aşkera ye, weku *pîroz kirinê*.

3. Hêmana nekarî weku nav yan hevalnavê nayê pênasekirin. Nimûneyeka vê, kara *dagirtinê* ye ku ji pirtika *da* û kara *girtinê* pêkhatî ye. Hêmanên nekarî jêderên gelek heterojen hene; hin ji wan bi etîmolojîya xwe têkildarî daçekan in, hin têkildarî hevalkaran in, ji bo hinên din tu têkilîya naskirî bi leksemên din ên zimanî ra tune ye. Ev pol bi awayekî nerîtane “pirtik” yan “pêşkar” hatiye binavkirin.

Parametreyê duym a têperîya hêmana karî xwedî dijberîyeka duhêl e di navbera têperî û teneperîyê da ku me di beşa borî da bingeha wê danî. Pevxistina van her du parametreyan polînkirineka şeşhêl derdixe holê ku di Tablo 1ê da hatiye dayîn:

HÊMANA NEKARÎ			
KAR	PIRTIK	HEVALNAV	NAV
TÊNEPER	<i>Derketin</i> (pirtik <i>der</i> + kar <i>ketin</i>)	<i>rast hatin</i> (hevalnav <i>rast</i> + kar <i>hatin</i>)	<i>dilketin</i> (nav <i>dil</i> + kar <i>ketin</i>)
TÊPER	<i>Vekirin</i> (pirtik <i>ve</i> + kar <i>kirin</i>)	<i>pîroz kirin</i> (<i>pîroz</i> + kar <i>kirin</i>)	<i>maç kirin</i> bb (1)ê

Tablo 1. Polînkirina tîpên cuda yê pêveberên kompleks.⁹

Ji bo ku zêde dirêj nebe, ev zebat bi tenê li ser wan PKyan hûr dibe ku ji navekê û kareka têper pêkhatî ne (çavîya jêr a rastê ya Tablo 1ê).

PKyên N+K di kurdîyê da poleka mezin pêk tîne û her ku diçe ev pol mezintir dibe, ku tê da PKyên munferîd li gor pileya îdyomatîzasyonê ji hev cuda dibin. Gelek caran N bêjeyeka deynkirî ye, lê qetiyen ev her tim ne wisa ye. Weku zimanên din ên îranî yê rojavayî, di kurdîyê jî da navgînên morfolojîk tune ne ku karên nû ji navan darêjin (bb Windfuhr 1979: 113 li ser farsîyê), loma çêkirina PKyan navgîna tekane ya afirandina derbirînên nû yê karî ye. Ji ber vê yekê listeya jêrîn a 25 PKyan gelekî kêma e. Ev PK hatine hîlbijartin ji ber ku rehên wan bihêz in, yanî, ji hêla piraniya axiveran ve tîn naskirin, di piraniya zaran da hatine piştrastkirin û tîpên binyadî yê herî giring dinimînin:

9 Tablo 1 hin rewşên dijwar paşguh dike, bo nimûne (i) Ew PK ku di wan da ji yekê bêtir hêmanên nekarî hene, weku *dest pê kirinê* di (3)ê da; (ii) Ew PK ku di wan da hêmana nekarî piştî pêveberê tê, weku *anîn cihê*; (iii) dijwariyên cudakirina hevalnavan ji navan - bin. 6.

(13) Nimûneyên pêveberên kompleks ên N+Kyên têper

PÊVEBERA KOMPLEKS	NAV	KAR	PÊVEBERA KOMPLEKS	NAV	KAR
a. <i>alîkarî kirin</i>	<i>alîkarî</i>	<i>kirin</i>	n. <i>guhdar(i) kirin</i>	<i>guhdar</i>	<i>kirin</i>
b. <i>av dan</i>	<i>av</i>	<i>dan</i>	o. <i>hez kirin</i>	<i>hez</i>	<i>kirin</i>
c. <i>bang kirin</i>	<i>bang</i>	<i>kirin</i>	p. <i>maç kirin/paçî kirin</i>	<i>maç</i>	<i>kirin</i>
d. <i>bar kirin</i>	<i>bar</i>	<i>kirin</i>	q. <i>mêze kirin</i>	<i>mêze</i>	<i>kirin</i>
e. <i>bawer kirin</i>	<i>bawer</i>	<i>kirin</i>	r. <i>nişan dan</i>	<i>nişan</i>	<i>dan</i>
f. <i>baz dan</i>	<i>baz</i>	<i>dan</i>	s. <i>qal kirin</i>	<i>qal</i>	<i>kirin</i>
g. <i>behs kirin</i>	<i>behs</i>	<i>kirin</i>	t. <i>qebûl kirin</i>	<i>qebûl</i>	<i>kirin</i>
h. <i>çap kirin</i>	<i>çap</i>	<i>kirin</i>	u. <i>şerm kirin</i>	<i>şerm</i>	<i>kirin</i>
i. <i>deng kirin</i>	<i>deng</i>	<i>kirin</i>	v. <i>telefon kirin</i>	<i>telefon</i>	<i>kirin</i>
j. <i>derman kirin</i>	<i>derman</i>	<i>kirin</i>	w. <i>xwey dan</i>	<i>xwey</i>	<i>dan</i>
k. <i>dest avêtin</i>	<i>dest</i>	<i>avêtin</i>	x. <i>xwedî kirin</i>	<i>xwedî</i>	<i>kirin</i>
l. <i>fahm/fêm kirin</i>	<i>fêm</i>	<i>kirin</i>	y. <i>zor birin</i>	<i>zor</i>	<i>birin</i>
m. <i>gazî kirin</i>	<i>gazî</i>	<i>kirin</i>			

Kara herî berbelav di PKyên kurdîyê da bi ferqeka berbiçav *kirin* e. Di rastîyê da, temamê mijara PKyan bi piranî bi komeka biçûk a karên ferhengî sînordar e, herweku hin zimanên din (bn hindî/ûrdûyî, japonî û tirkî).

212 |

Herçi semantîka PKyan e, di gelek rewşan da mane bi piranî ji semantîka Nyê tê texmînkirin. Tevkarîya semantîk a Kyê xumamî ye; tu nişaneyên vînitî û kontrolê ne xuya ne (bb (13) u. û w.). Loma K bi piranî weku karçêkerekê kar dike, bi termînolojiya Grimshaw & Mester 1988 weku “kareka sivik”. Lêbelê kara *kirinê* bi tenê PKyan çê nake, herweha weku kareka serbixwe jî tê bikaranîn.

(14) *Mirovê ku vî karî bike [...]*

Tevî ku PKyên di (13)ê da rêzkerî di ser ra manend dixuyin, pişkinîneka nêzîktir aşkera dike ku ew aîdî du tîpên binyadî yên cuda ne û herweha gelek bintîpên wan hene. Taybetmendîya ku van tîpên cuda vediqetîne statuya sintaktîk ya Nyê ye û ji ber vê yekê berî ku tîpên cuda yên PKyan pêşkêş bikim, ez dê bi analîza vê hêlê dest pê bikim.

Di nêrîna pêşî da mirov dibêje qey N xwedî statuya berkara rasterast in. Ew nedaçekî ne û hema berî Kyan tîpên bikaranîn. Lêbelê ew bi dereceyên cuda pîvanên di (7) ê da hejmartî bi cih nainin. Berî her tiştî ew nakevin rewşa tewandî yan heger bikevinê, di risteyê da guherîneka giring a semantîk pêk tê. (15a) û (15b)yê bidin ber hev.

(15a) *bawer ke!* (bawer bike!)

(15b) **vî bawerî ke!* (vê baweriyê bike!)

Ferqeka din di navbera Nyên PKyan û berkara rasterast a prototîpîk da ew e ku N paşgira nenasyariyê *-ekê* nastînin. (16a) û (16b)yê bidin ber hev:

(16a) *Wî pir ji Bozo hez dikir.* [Gir: 45]

(16b) **Wî ji Bozo hezek dikir.*

Bi awayekî mîna vê, Nyên di PKyan da bi giştî rê nadin berfirehbûnê bi çawanîderên navî (bn hevalnav) yan bi çendîkeran ra.¹⁰ Her du nimûneyên jêrîn bidin ber hev:

(17) *Ez ê birîna te derman bikim*

(18) **Ez ê birîna te dermaneke baş bikim*

Herî dawî, delîla ji pasîfkirinê bi xurtî nîşan dide ku ev N ne berkarên rasterast ên heqîqî ne. Berkareka rasterast û bi tenê berkareka rasterast dikeve pozîsyona bikerbûnê û karaya resen tê jêbirin (pasîfên karakirî di zimanê nû yê çapemeniyê da hatine çêkirin; di rastiyê da di gotara axaftinê ya siruştî da tunene). Sê nimûneyên PKyên pasîfkirî dê bes bin:

(19) Pasîf ji PKya *av danê*:

Bi xwînê û rondikên çavan hatine avdan û avakirin [Aw: 72]

(20) Pasîf ji PKya *hez kirinê*:

Bi vî awayî, lawê Zaro Axa wisan di gund de hate naskirin û hezkirin¹¹

[Gir: 38]

(21) Pasîf ji PKya *derman kirinê*:

Cahşên birîndar li nexweşxaneyê leşkerî ya Colemêrgê tene dermankirin.

[CTV: 41]

Bikerên van hevokên pasîf ne Nyên PKyan in. Di (19)ê da biker gotarek e ku telafikirina wê mimkun e (*'ew' = gund û bajar* ji konteksta berî wê), di (20)ê da *lawê Zaro Axa* ye û di (21)ê da *cahşên birîndar* in. Bala xwe bidinê ku di van nimûneyan

10 Feqet komeka PKyan bi rêkûpêkî rê dide diyargînen xwedantiyê yên Nyan - bin. 4.3.

11 A rast pasîfa *hezkirinê* neasayî ye, ji ber ku ev PK ji berkareka rasterast bêtir temamkerekê daçekî dixwaze. Bi gumana min bikaranîna wê bi vî rengî di vê nimûneyê da girêdayî wê rastiyê ye ku ew bi PKya din a pasîfkirî bi *naskirinê* ra tê koordinekirin, ku ew berkareka rasterast distîne. Lê dîsa ji (21) problematik dimîne.

da N ligel Kyê tê nivîsîn, yanî, PK bêjeyeka ortografîk a tekane çê dîke. Loma em dikarin bi ewlehî bigihîjin wê encamê ku Nyên van PKyan di bin pasîfkirinê da venaguhêrin bikerên rêzimanî, lê bi Kyê ra pevkelijî dimînin.

Delîlên ji rewş nîşankirinê, ahengdariya bi paşgira nenasyar ra, berfirehbûna bi çawanîderan ra û reftara di bin pasîfkirinê da nîşan didin ku Nyên hin PKyan bêpar in ji hin taybetmendiyên pîvanî yên berkarên rasterast. Lê divê bê diyarkirin ku gelek ferqên hûrlîb di navbera taybetmendiyên sîntaktîk ên Nyên PKyên cuda da hene, ji ber ku li vir cih tune ye mirov nikare bi berfirehî li ser wan bisekine. Lê dîsa jî mirov dikare ji delîlên berdest bigihîje wê encamê ku Nyên di PKyan da bi regekî berbiçav ji berkarên rasterast ên tam kemilî cuda dibin.

4.1. Cudabûna Bingehîn: PKyên beşdarker û yên nebeşdarker

Delîlên ji testên di beşa buhurî da nîşan didin ku Nyên PKyan ji hin taybetmendiyên berkarên rasterast bêpar in. Ligel vê yekê, PK li gor pileya berkarbûnê ya Nyê bi awayekî berbiçav ji hev cuda dibin. Teşxîsa herî zelal a pileya berkarbûnê bi xêra sînardarkirineka gelekî giştî ya li ser risteyên kurdîyê ye ku di (22)ê da hatiye dayîn:

214 | (22) Her risteyek dikare bi tenê eksponenteka kategorîya berkara rasterast vehewîne.

Esasen (22) rengvedaneka pîvana-tetayê ya GByê (Government-Binding) ye. Sînardarkirinên manend li ser berkarên rasterast di gelek zimanan da berbelav in, bn japonî (Shibatani 1973: 341-342), (Baker 1988: 177). Nuha heger Nyên PKyên di bin (13)ê da rêzkirî berkarên rasterast bin, hingê divê riste nikaribin FNyeka îlawe ya berkara rasterast vehewînin, çiku ev yek dê (22)ê bînpê bike. Feqet weku em dibînin, gelek PK rê didin FNyên îlawe. Bo nimûne di (1)ê da, ku ji bo hêsankariyê em li vir dubare bikin, berkara rasterast *destê melê* ye:

(23) *Ferho destê melê maç kir [...]*

Bi heman awayî, di nimûneya (17)ê da berkareka rasterast heye: *birîna te*.

Dîyardeyên ji rêkeftina karî bidestxistî wê encamê bihêztir dikin ku FNyên bi vî rengî bi rastî berkarên rasterast in. Bînin bîra xwe ku di avaniya ergatîf da, rêkeftina kesî ya li ser karê ji hêla berkara rasterast ve tê kontrolkirin. Ev yek di (5)ê da hat nîşandan ku ez li vir dubare dikim:

(24) *Wan jî ez dîtîm*

Berkara rasterast *ez rêkeftina kesî li ser pêveberê dîyar dike*. Îcarê bala xwe bidin (25)ê ku PKya wê *qebûl kirin* e. Li vê derê rêkeftina li ser karê ne ji hêla Nya *qebûlê*, lê ji hêla berkara îlawe *ezê tê dîyarkirin*:

(25) *Ewî ez gelek bi xweşî qebûl kirim* [...] [Şk: 46]

Loma bi kêmanî hin PK rê didin derbirîna berkareka rasterast a îlawe ya heqîqî. Dema ku em qebûl bikin ku sînardarkirina li ser cotberkarê ya di (22)ê da rast e; heger PKyek rê bide berkareka rasterast a îlawe, hingê çê nabe Nya wê ji berkareka rasterast be. Ji hêla binyada frazê ve, ew di pêveberê da beşdarkirî xuya dike.

Lê belê hemû PK bi vî awayî tevnagerin. Komeka mezin rê nade berkareka rasterast a îlawe. *Hez kirin* yan *mêze kirin* nimûneyên vê ne:

(26) *Avukat* [...] *li saetê mêze kir* [Gir: 85]

PKyên weku *hez kirin* û *mêze kirinê* dikarin argumentên îlawe rayedar bikin, lêbelê ev giring e ku ew ne berkarên rasterast in, berkarên daçekî ne (bb pêşdaçeka *liyê* ya di (26)ê de). Berevajî berkarên rasterast, berkarên daçekî tu carî rêkeftina karî kontrol nakin. Di rastîyê da ne rêzimanî ye ku PKyên weku *mêze kirinê* ligel berkarên rasterast ên îlawe bên bikaranîn.

215

Loma li ser esasê pîvana “şîyana rêvebirina yek berkara rasterast a îlawe” em dikarin du komên PKyan pênase bikin. Ji ber sebebên ku dê aşkera bibin, ez dê van her du koman weku **PKyên beşdarker** (rê didin berkareka rasterast a îlawe) û **PKyên nebeşdarker** (rê nadin berkareka rasterast a îlawe) bi nav bikim. Ji nav PKyên di bin (13)ê rêzkirî da, yên jêrîn PKyên beşdarker in:

(27) Nimûneyên PKyên beşdarker ji (13)ê

<i>derman kirin</i>	<i>qebûl kirin</i>	<i>nîşan dan</i> ¹²
<i>çap kirin</i>	<i>av dan</i>	<i>xwedî kirin</i>
<i>maç kirin</i>	<i>fehîm kirin</i>	<i>bar kiririn</i>

Ji riwangeheka semantîk bi hêsanî nayê famkirin bê çima PKyên weku *derman kirin* û *qebûl kirinê* berkarên rasterast ên îlawe distînin, lê yên weku *hez kirin* û *mêze kirinê* nastînin. Ev cihêrengîya halê hazir çaverênekirî xuya dike. Ev xalek e ku

12 Sîntaksa *nîşan danê* têra xwe ji karên din komplekstir e. Esasen ew dureh e ji ber ku rê dide berfirehbûna Nyê *nîşanê* bi xwedîyekê ra, lê dîsa ji rê dide berkareka rasterast a îlawe. Ji ber sedema duyem min ew xist vê komê.

Mohanani (1997: 466) ji bo zimanê hindî jî amajê pê kirîye ku di wî jî da cudabûnka manendi vê heye. Em dê vê gavê bi besîti qebûl bikin ku du PKyên ji hêla binyadê ve cuda hene û dest bi analizkirina wan bikin.

4.2. PKyên beşdarkar ji perspektîfeka tîpolojîk ve

Me tesbît kir ku Nyên PKyên beşdarkar di risteyê da ne xwedî statuya argumentî ne: Ew ji hêla sintaktîk ve neçalak in, loma kar serbest e ku rola berkara rasterast bide FNyeka din. Bala we lê be ku terma beşdarkirinê ku li vir bi kar tînim, tîkildarî windabûna statuya sintaktîk e. Helbet hinek dikarin îtirazê li vê karanînê bikin. Bo nimûne Gerds 1998 diyar dike ku di beşdarkirina rasteqîne da reheka navê heye, ne ku navek heye û beşdarkirina morfolojîk di kara mazûvan da pêşîn qebûl dike. Weku wê di binbeşa 4.4.ê da zelal bibe, di kurdîyê da nav ji hêla morfolojîk ve ne parçeyekî karê ye. Ji ber vê yekê etiketên din jî dê bi qasî vê guncayî bin, bn navjêxistin yan heta lêkdayîkirin. Lê dîsa jî ez dê terma beşdarkirinê bi kar bînim, ji ber ku bo nimûne di almanîyê da ew ji bo pêvajoyên manend hatîye bikaranîn (bb Gallmann 1999). Feqet ez dixwazim dupat bikim ku bikaranîna min a “beşdarkirin”ê bi rastî tê maneya “beşdarkirina sintaktîk”, yanî tê maneya windabûna temamê statuya argumentî.

216 |

Nimandineka formel a vê tîpa beşdarkirinê li jêr hatîye dayîn: Di (28)ê da *kirin* sereya risteyeka sadetir a têper e; (29) binyada PKyeka beşdarkar ya bi *kirinê* dinimîne (K kara ferhengî dinimîne, kevaneka goşebend kompleksa karê vedigire, kevaneka sertûjîk argumentên sereke vedigire):

(28) $\langle x, y \rangle [K]_p$ *kirin* di risteya sade ya têper da (bb 14ê)

(29) $\langle x, z \rangle [yK]_{mp}$ *kirin* di PKyeka beşdarkar da (bb 1ê)

Xala giring derbarê vê tîpa beşdarkirinê da ew e ku kompleksa karê di (29)ê da têperîya xwe ya ferhengî diparêze (yanî di handana ergatîfîyê da berdewam e), û ji vê giringtir temamê kompleksa karê di (29)ê da têperîya sintaktîk pêşan dide, yanî dikare berkareka rasterast a îlawe bi rê ve bibe ku ew di (29)ê da bi “z”yê hatîye nimandin.

Ev çemka beşdarkirinê bi awayekî radîkal ji ya gelek zimanên din cuda ye. Li dereka din me dît ku navek di kareka têper da tê beşdarkirin û encama vê yekê kareka tîneper e. Nimûneyek ji samoanîyê (polînesî, binkoma okyanusî) ji Mosel û Hovdhaugen (1992: 738) vê tîpa beşdarkirinê ya bêtir naskirî nîşan dide (herweha bin. Baker 1988: 88 ji bo nimûne û nîqaşine bêtir):

(30) *Na fa'atau e le tama le pu'â*
 BOR firotin ERG ART lawik ART beraz
 'Lawikî beraz firot.'

(31) *Fia fa'atau pu'aa oe?*¹³
 xwestin firotin beraz 2y
 'Tu dixwazî berazan bifiroşî?'

Di (31)ê da maneyeka giştî ya nava *pu'aa* 'beraz(an)' heye. Wê artikelek tune ye û di kompleksa pêveberî da hatiye beşdarkirin. Risteya encamîn têneper e ku ev yek bi zelalî bi wê diyardeyê hatiye nişandan ku biker *oe* 'tu' ne xwedî pirtika ergatîf *eyê* ye ku di risteya têper ya di (30)î da ew heye.

Mirov dikare beşdarkirineka ji vê tîpê bi awayekî neformel wisa binimîne (li vê derê em bi rêza xêzekî ya pêkhênan ra eleqedar nabin):

(32) $\langle x, y \rangle [K]_{tp}$ Binyada nebeşdarkirî (bb 30ê)

(33) $\langle x \rangle [yK]_{tp}$ Binyada beşdarkirî (bb 31ê)

Bala we lê be ku berevajî binyada kurdîyê ya di (29)ê da dayî, di (33)ê da kompleksa karî têneper e. Gallmann (1999: 284) vê tîpa beşdarkirinê weku "beşdarkirina têneperker" bi nav dike, Rosen 1989 behsa "beşdarkirina navî ya lêkdayî" dike. Her bi çi awayî bê binavkirin, ev tîpa beşdarkirinê qet tune ye di kurdîyê de.

Hevteribiyeka nêzikî tîpa kurdîyê ew diyarde ye ku Rosen 1989 wê weku "beşdarkirina navî ya polîner" bi nav dike ku di zimanên xwecih ên amerîkî û di hin zimanên awistralî da berbelav e. Di vê avaniyê da kareka têper navekê tevdigire, lê kar dîsa têper dimîne (Rosen 1989: 302). Herweha kompleksa di encama vê diyardeyê da bidestketî dibe ku berkareka rasterast a îlawe bi rê ve bibe, ku Rosen ji vê yekê ra dibêje "ducarkirin". Aşkera ye ku ev nêzikî wî tiştî ye ku me di kurdîyê da dît. Lêbelê ferqeke giring heye: Bi tenê dema ku Nya beşdarkirî ji hêla semantîk ve girêdayî berkara rasterast a derekî be, ducarkirin mimkun e. Bo nimûne mirov dikare avaniyeka mimkun ya vê tîpê bi vî awayî bisêwirîne: 'he animal-picked up a dog'. Li vê derê berkara derekî *dog* aîdî "wê pola hêmanan e ku ji aliyê nava beşdarkirî ve hatiye diyarckirin" yanî ji aliyê *animalê* ve (Rosen 1989: 303). Îhtîmaleka din ew e ku berkara rasterast a derekî çendiker yan diyarckereka "pêvekîrî" ya Nya beşdarkirî be (bn 'I men-saw **two**' = 'I saw two men').

13 Ev her du nimûne ji du rênivîsên cuda yên samoaniyê ne, ferqên biçûk ji ber vê yekê ne.

Manendîyên di navbera beşdarkirina kurdîyê û “lêkdayîkirina polîner” da bi tenê di warê parastina têperîya karê da ye; sîndarkirinên semantîk li ser beşdarkirinê di kurdîyê da ne lidar in ku mirov li kîjan nimûneya jorîn binêre vê yekê dibîne. Ne jî di kurdîyê da hevterîbîyeka wê beşdarkirinê heye ku tê da pêvekirina diyarkeran heye. A rast min hay jê tune ye ku di lîteraturê da li ser beşdarkirina tîpa kurdîyê xebateka hûrgilî hatibe kirin. Lê dîsa jî ev beşdarkirin di zimanên îranî da baş tê zanîn: Ji bo zazakî Paul (1998: 131-132) cudahîyeka yeksan dixwe navbera binyadên beşdarkirinê yên ku ew weku “*zusammengesetzte Verben*” bi nav dike û PKyên din. Di hindîyê (îndo-aryan) da binyadeka hema hema yeksan tê dîtin, ku hem Burton-Page 1957 û hem Masica (1991: 368) baldar in ku wê jî tîpên din ên PKyan cuda bikin. Bi heman awayî tevî ku termînolojîya wê cuda ye, Mohanan 1997 xeteka stûr dikişîne navbera PKyên beşdarkirî û yên din. Loma ev diyarde baş naskirî ye, lêbelê di bin navên cihêreng da hatiye vekolan û tiştê ku ez dizanim di çarçoveya vekolîna beşdarkirinê ya navzimanî da nehatiye gengeşekirin.

Herî dawî em dikarin bipirsin bê ka beşdarkirina bi vê maneyê li ku derê û çawa rû dide. Baker 1988 beşdarkirinê weku pêvajoyeka sîntaktîk a tevgera X-barê dinirxîne ku li gor wê berkara rasterast ber bi karê ve diçe û şopekê li pey xwe dihêle. Ev analîz gelekî karîger e û jî bo pêvekirina diyarker yan çendîkeran ya li jor bi kurtî gengeşekirî çareserkerineka serincrakêş dabîn dike. Feqet temamê nîqaşa li ser wê yekê bê ka beşdarkirin peyvrêzî ye yan ferhengî ye ji serî da xwe dispêre wê qebûlê ku divê mirov di navbera her duyan da cudakerineka teqez daîne. Heger teorîya yekî vê yekê bike jî (bn versiyona Baker ya GByê), ev bi serê xwe nabe delîl ku zimanê mirovan bi vî awayî dixebite. Teorîyên din ên weku rêzimana avanîyan hinekî cudatir li kêşeyê dinêrin (bb Schultze-Berndt 2000: 23-26 ji bo jêgirtinan). Zelal e ku ne mimkun e ev kêşe li vir bê çareserkerin (bin. Rosen 1989 ji bo gengeşeya li ser boçûnên beşdarkirinê yên sîntaktîk û yên ferhengî). Lêbelê divê bê diyarkerin ku PKyên beşdarkirî ên kurdîyê bi zelalî xwedî rehendekî ferhengî ne: Ew bi tenê bi du karên ferhengî ra rû didin (*kirin* û *dan*), loma wê baş be ku em ji serî da taybetmendîyên xweser ên van her du karan weku şert daînin serê madeyên wan ên ferhengî, bi vî awayî em dê piranîya aparatên sîntaktîk yên pêşniyazkirî bidin alîyekî. Heman tişt jî bo avanîyên manend yên di zimanên din da jî rast e, ku gelek caran bi çend karên ferhengî sînokirî ne.

4.3. PKyên nebeşdarker

Mirov dikare ji gelek aliyan ve sîntaksa PKyan weku çareseriyên cihêreng ji bo wê pirsgirêkê bibîne bê ka mirov dikare çawa naveka îlawe di risteyeka sade da bi cih bike bêyî ku sînorê li ser cotberkaran yên di (22)ê da dayî bin pê bike. Weku me dît Nyên di hin PKyan da bi besîtî tèn paşguhkirin; ji hêla peyvrêzîyê ve ew neçalak in, û riste berkareka rasterast a îlawe distînin. Lêbelê di PKyên nebeşdarker da berkareka rasterast a îlawe ya wisa ne mimkun e. Esasen em dikarin sê tîpên PKyên nebeşdarkirî ji hev cuda bikin: (i) PKyên têrkirî; (ii) PKyên temamkerên daçekî; (iii) PKyên temamkerên xwedîtîyê.

PKyên ji tîpa yekem argumenteka îlawe naxwazin. Nimûneyên vê *baz dan*, *şerm kirin*, *xwey dan* yan *can dan* in (bb (2)ê). Ez dê PKyên vê tîpê bi **PKyên têrkirî** bi nav bikim, ji ber ku N hewcetiyên argumentî yên karê tetmîn dike. PKyên têrkirî rewşên têneper ên yekbeşdar derdibirin. Ez dê di vê xebatê da li ser PKyên têrkirî zêdetir nesekim, lê divê bê dîyarkirin ku ferqa di navbera wan û PKyên din da berî her tiştî ferqa semantîka pevketî ya tevahîya derbirînê ye. Ji hêla binyadî ve ew bi reftareka manendî ya PKyên din tevdigerin (bn kar ji hêla ferhengî ve têper dimîne û di dema borî da avanîya ergatîf han dide).

219

Tîpa duyem a PKyan argumenteka îlawe dixwaze, yanî, tîpeka temamkera tewandî ya têra xwe sabît heye ku ew bi awayekî nerîtî pê ve pêwendîdar in. Argumenta îlawe weku frazeka daçekî tê kodkirin. Li gor vê yekê em dikarin vê tîpê weku **PKyên temamkerên daçekî** bi nav bikin. Nimûneyên tîpîk ên vê tîpê *mêze kirin* û *hez kirin* in ku ya yekem bi pêşdaçeka *liyê* ra temamkerekê pêşdaçekî dixwaze (b.b.(26)) û ya duyem bi pêşdaçeka *jiyê* ra temamkerekê pêşdaçekî dixwaze:

(34) *Em pîr ji te hez dikin* [Aw: 71]

Analîzeka mimkun a vê binyadê dê ew be ku mirov fraza pêşdaçekî weku binpêkhêneka Nyê binirxîne, ku ev temamkerekê FPyê [*ji te hez*] pêk tîne. Li ser esasê vê analîzê, di destê me da tiştêkî weku ‘[*ji te hez*] kirin’ heye. Lêbelê ev analîz dê berê me bide cihekî şaş. Ya pêşî, kurdi frazên pêşdaçekî bi vî awayî bi navan ve girê nade; bêtir, (kêm caran) frazên pêşdaçekî yên piştserê bi kar tîne, ku ew bi rêya morfemeka girêdanê bi sereya navî ve hatiye girêdan. Ya duyem, çê dibe fraza pêşdaçekî bi pirtika *jiyê* ji navê bê veqetandin:

(35) *Ez [...] ji xwe jî hez nakim* [Aw: 75]

Herî dawî dibe ku di karanînê da N li pêşîya fraza pêşdaçekî bi cih bibe, weku (41)ê li jêr.

Ji ber vê yekê divê em fraza pêşdaçekî weku argumenteka heqîqî ya pêvebera kompleks qebûl bikin, yanî divê em wê bi heman statuya argumentên pêşdaçekî yên pêveberên sade qebûl bikin (bo nimûne *pîrsîn*, ku frazeka pêşdaçekî weku argument distîne). Palpišta aşkera ji bo statuya pêkhênî ya temamkera pêşdaçekî ji koordînasyonê tê:

(36) *Sûcê wan ew bû ku wan, [ji welatê xwe], [ji zîmanê xwe] hez dikir* [Aw: 75]

Li vê derê du temamkerên pêşdaçekî, her du jî pêbendî PKya *hez kirinê*, bi reftareka ji bo argumentên karan tîpik tîpî koordînekirin, lêbelê ev yek ji bo binpêkhênên FNyan ne mimkun e. Loma frazên pêşdaçekî yên PKyên bi vê tîpê argument in ku ji hêla yekbûna PKyê ve hatine rayedarkirin, ne binpêkhênên FNyekê ne ku sereya wê N be. Ji ber vê yekê analîza rast a PKya bi vê tîpê dê wisa be: [pêşdaç.X]_{FP} [hez kirin]_{FK}

220 | Tîpa sêyem a PKyên nebeşdarker jî argumenteka îlawe dixwaze. Lêbelê di vê tîpê da argumenta îlawe forma xwedîyekî Nyê distîne ku bi rêya morfema girêdanê pê ve tê girêdan. Ez navê **PKyên temamkerên xwedîtîyê** li vê tîpê dikim. Nimûneyeka vê tîpê PKya *alîkarî kirinê* ye:

(37) *Wî zanibû ku dê pîrika wî alîkari-ya wî bike* [Mey: 103]

Di vê nimûneyê da temamkera îlawe *wî* binpêkhêneka heqîqî ya fraza navî ya kompleks e ku sereya vê frazê *alîkarî* ye. NPyên bi vê tîpê mikemelen başçêkirî ne, û bi rêkûpêkî li derveyî PKyan rû didin. Bi vê maneyê PKyên temamkerên xwedîtîyê yên weku (37)ê bi rengê berbiçav ji PKyên temamkerên daçekî yên weku (36)ê cuda dibin, ku ez engaşt dikim ku ew argumentên tevahiya PKyê ne.

Palpišta vê analîzê ji delîla ji pasîfkirinê tê. Di (38)ê da PK *qal kirin* e. N bikereka xwedîtîyê distîne, yanî ew PKyek e ku bi *alîkarîya kirinê* ra ji tîpekê ye. Di bin pasîfkirinê da biker tevahiya FNyê (*qala me*) ye, ne ku bi tenê xwedî ye:

(38) *Lê tu caran qal-a me nehatîye kirin.* [Aw: 69]

Di bin pasîfkirinê da tevahiya FNya ji N û xwedîya wê pêkhatî hildikişê statuya bikerîyê, ku ev nîşan dide ku ew di rastîyê da pêkhênekê çê dike. Loma li vê

derê avanî ‘[alîkarî-ya-X]_{FN} kirin’ e. Li vir naxwe argumenta îlawe (“X”) statuyeka peyvêzîyê heye ku gelekî ji ya PKyên temamkerên pêşdaçekî (yên weku (36)ê) cuda ye.

Bala xwe bidinê ku di PKyên temamkerên xwedîtîyê da temamkera îlawe dikeve navbera N û Kyê: binyada xêzekî wisa ye: N(girêder)FN K. Ji bo PKyên bi vê tîpê analîzeka beşdarkirinê bi awayekî aşkera şaş e. Pirsê diwartir ev e: mirov çawa dikare wan bi awayekî sistematîk ji kombînasyonên tesadufî yên berkara rasterast û dîyargîna xwedantîyê cuda bike? Bersîveka hêsan a vê pirsê tune; ev avanî li ser cedwelekî îdyomatîzasyonê diguherin û vê gavê ez wê ihtîmalê pir lawaz dibînim ku mirov bikare ji bo wan xeteka sînorî ya teqez peyda bike. Ligel vê yekê hin ji PKyên vê tîpê yên herî zêde adetîbûyî hin taybetmendîyên binyadî bi pêş xistine ku wan ji kombînasyonên tesadufî cuda dikin; ez dê di 4.3.1.ê da li ser vê xalê rawestim.

4.3.1. Kurtîya PKyên nebeşdarker

Me li ser sê tîpên PKyên nebeşdarker gengeşe kir ku bi tîpa argumenta îlawe ya ku ew distînin ji hev cuda dibin. PKyên jêrîn ku ji listeya (13)ê hatine wergirtin, bi vî awayî li ser sê tîpan belav dibin:

PKyên têrkirî (tu temamkera îlawe naxwazin)	PKyên temamkerên daçekî	PKyên temamkerên xwedîtîyê
<i>şerm kirin</i> <i>baz dan</i> <i>xwey dan</i>	<i>hez kirin</i> <i>mêze kirin</i> <i>qal kirin</i> <i>bawer kirin</i>	<i>deng kirin</i> <i>gazî kirin</i> <i>qal kirin</i> <i>behs kirin</i> <i>zor birin</i> <i>telefon kirin</i> ¹⁴ <i>alîkarî kirin</i>

Tablo 2. Bintîpên PKyên nebeşdarker

Helbet di rastîyê da mesele bi qasî ku Tablo 2 nîşan dide ji berê da ne hazir û teqez e. Ligel guhertoyên navzarî formên navberî yên curbicur hene di peyvêzîya PKyên nebeşdarker da ku ez dê li vê derê bi kurtî behs bikim. Berî her tiştî di warê tîpa temamkera xwedîtîyê da guherto hene. Di tîpa temamkera xwedîtîyê ya normal

14 Di karanîna *telefon kirinê* da cudahîyên herêmi hene. Di zarê Mûşê da ew temamkera daçekî (*ji... re*) distîne, di piraniya zaran da temamkerekê xwedîtîyê distîne. Cudahîyên bi vî rengî bi taybetî di warê PKyên vê dawîyê dariştî da ne kêmi in.

da argumenta îlawe xwedîyek e ku bi morfemeka girêdanê bi Nyê ve girêdayî ye, ku li pey zayenda Nyê diguhere (bb (39)). Lêbelê hin PK dengdêreka neguher distînin, ku jê ra dibêjin “îzafeya giştî” (MacKenzie 1961). Bo nimûne PKya *bang kirinê*:

(39) *Bang-î wê dike.* [Aw: 72]

Di hin deqan da heta bi îzafeya giştî jî jê dikeve:

(40) *Paşê bang diya xwe kir.* [Gir: 27]

Dema ku N temamkereka daçekî distîne dîsa tîpeka dureh rû dide, feqet berevajî nimûneya (34)ê, temamker **piştî** Nyê tê û bi vî awayî wê ji Kyê vediqetîne:

(41) *Wî, hez ji gel-ê xwe dikir.* [Aw: 69]

Bala we lê be ku rêzkirina din (... *ji gelê xwe hez dikir*) jî mimkun e. Loma di peyvêzîya nebeşdarker da heta pileyekê cihêrengî hene ku hin ji wan zarî ne û belkî hin ji wan jî ji ber cudahiyan hûrbîn ên semantîk bin ku ji min ve ne xuya ne. Lêbelê divê bê cextkirin ku cihêrengî li nav bintîpên cuda yên PKyên nebeşdarker berbelav bin jî, cudahiya bingehîn di navbera PKyên beşdarker û yên nebeşdarker da bi rengê berbiçav seqamgîr e. Bi gelemperî PKyek ji her du tîpên sereke aîdî yekê tenê ye.

4.4. Statuya morfolojîk a Nyê di PKyên beşdarker da

Di binbeşên buhurî da me amaje bi kêşeya satuya peyvêzî ya Nyê di PKyan da kir. Di vê çarçoveyê da me amaje bi wê yekê kir ku di PKyên beşdarker da tu statuya wê ya peyvêzî tune, lêbelê di PKyên nebeşdarker da wê bi kêmanî statuya argumenta jêmayî heye. Pirsra ku di vê binbeşê da bibe cihê serêşandinê ew e bê ka beramberî windabûna statuya peyvêzî windabûneka otonomîya morfolojîk heye yan na, yanî, ji bo ku bêjeyeka tekane çê bikin N û K heta çî dereceyê pev dikelijin.

Jixwe em rastî nimûneyên PKyên nebeşdarker hatin ku di wan da N jî hêla hin bêjeyên din ve ji Kyê tê veqetandin (bb (37), (39)-(41) li jor), loma wisa dixuye ku zêde sedem tune ne mirov li vê derê hebûna beşdarkirina morfolojîk qebûl bike. Ji ber vê yekê em dê di vê binbeşê da bi tenê li ser PKyên beşdarker hûr bibin û li ser wê pirsê bê ka N û K hêmaneka morfolojîk a tekane pêk tînin yan na. Bala we lê be ku ev kêşe ortogonalî wê kêşeyê ye bê ka PK bi ferhengî tê hilandin yan bi peyvêzî tê çêkirin. Ez riwangeheka berfirehtir a ferhengî qebûl dikim ku yekeyên frazê vedigire.

Ji ber vê yekê pîrsa bê ka PK bêjeyeka tekane pêk tîne yan na, esasen pîrseka binyada morfolojîk e, ne ya hîlanîna ferhengî li dij dariştina peyvrezî ye.

Argumana herî bihêz li dijî analîzeka beşdarkirinê ew dîyarde ye ku mirov dikare hin keresteyên morfolojîk têxe navbera N û Kyê. Bo nimûne nerênîkirina karên sade di dema nuha da bi pêşgira *na-yê* çê dibe:

(42) *ez wî na-bînim*

Dema ku PK bîna nerênîkirin, divê pêşgira nerênîkirinê hema li çepî forma kişandî ya Kyê be, herweku nimûneyên jêrîn ên *av dan* û *derman kirinê*:

(43) *av na-dim* (ne **na-avdim*)

(44) *derman na-kim* (ne **na-dermankim*)

Weku nîşankera nerênîkirinê *na-yê*, nîşankera berdewamî/realîsê *di-* jî dikeve navbera N û Lya PKyê (*derman di-kim*).

Teşxîseka din navkirin e. Di bin navkirinê da berkara rasterast a karên têper divê weku xwedîyan bê derbirîn, ku bi navgîna girêderê bi karê ve girêdayî ye:

(45) *kuştin-a şêr* (yanî *şêr hatîye kuştin*)¹⁵

Feqet dema ku PKyên beşdarker tîna navkirin, N û Lya PKyê weku ya (45)ê avaniyeka xwedîtîyê çê nakin. Ji dêvla vê, ew avaniyeka lêkdayî çê dikin:

(46) *avdan dj. dayîna avê*

(47) *dermankirin dj. kirina derman*

Herweha PKyên navkirî dikarin temamkereka xwedîtîyê bistînin ku beramberî berkara wan a rasterast e:

(48) *dermankirina birînê* (bb (17))

Ji ber vê yekê navkirin weku yekeyeka tekane serederîyê li N û Kyê dike (ev yek di formên pasîf yên (19-21)ê da aşkera bû, ku li wir PK weku bêjeyeka ortografîk ya tekane tê serederîkirin).

15 Agahîderên min ew xwendin red kir ku şêr weku kujer şirove dike.

Pêvajoyeka din a morfolojîk çêkirina partîsîpê ye. Kar di kurdîyê da dikarin bi maneyeka encamîn partîsîpê çê bikin. Partîsîp bi reha borî ya karê û paşgira -îyê tê çêkirin, bo nimûne partîsîpa *manê*, *mayî* ye. PK herweha dikarin ji bo çêkirina partîsîpê ji zemînê pêk binin:

(49) *birîna dermankirî*

Bi gotineka din, kevanekkirina morfolojîk di rewşên wisa da li jêr e:

(50) [dermankir]-î

Ji ber vê yekê delîlên ji morfolojîyê nekok in: Li alîyekî mirov dikare keresteyên morfolojîk têxe navbera N û Kyê, ku ev nîşan dide ku ew bêjeyeka tekane pêk nainin (di kurdîyê da li cihekî din navgir peyda nabin). Lêbelê navkirin û çêkirina partîsîpê, N+Kyê weku yekeyeka morfolojîk a tekane werdigire.

Delîlên nekok ên bi vî rengî di almanîyê da tèn zanîn. PKya almanî *staubsaugen* 'bi vakûmê paqijkirin' ku maneya wê ya motamot 'toz mêtin' e, weku pêkhêneka peyvrêzî ya tekane tê wergirtin, herweku di vê hevokê de; *ich werde das Wohnzimmer staubsaugen* (Ez dê odeya rûniştinê bi tozmijê paqij bikim), lêbelê di forma partîsîp da pêşgira *ge-yê* dikare têkeve navbera N û Kyê: *staubgesaugt* (li vir guhertoyeka herêmî heye, hin axiver dibêjin *gestaubsaugt*). Loma yekîtiya peyvrêzî her tim beramberî yekbûna morfolojîk nayê.

Hêja ye mirov balê bikişîne ser wê yekê ku taybetmendîyên morfolojîk ên PKyên N+K yên li vir bi kurtî behskirî û yên PKyên hevalnav+K û pirtik+K hevyekek in (bb 4.ê, Tablo1) ku ez dê di 6.an da li vê xalê vegerim. Li vir ji yekbûna morfolojîk di navkirin û çêkirina partîsîpê da tê parastin, lêbelê ji hêla hin pêşgiran ve tê binpêkirin. Lêbelê balkêş e ku li herêmên Mêrdîn û Midyadê, hin PKyên pirtik+K pevkelijî ne û bûne yekeyên morfolojîk ên veneqet. Bo nimûne forma jêrîn a PKya pirtik+K ya kara *der-ketinê* hatiye dîtin (Ritter 1971: 6):

(51) *di-der-keve*

Li vê derê pêşgira realîsê *di-* li derveyî pirtik *derê* ye; bi kurdîya standard dê *der-di-keve* be. Manendî wê, li Mêrdînê pirtika *ve/vayê* di PKya *va-xwarinê* da bi rêkûpêkî bi temamî di karê da tê beşdarkirin û bi vî awayî reheka nû ya karê diafirîne: çay *di-va-xwim* (ji nişeyên min ên qadê bi xwe) berevajî forma asayî çay *va-di-xwimê*. Di deqên di Ritter (1971: 42)ê da heta bi navekî ji heye ku di nimûneyekê da bi temamî

di PKyê da hatiye beşdarkirin; *bang* di *bang kirinê* de. Wisa dixuye ku nimûneyên wisa bi herêman ve sînardarkirî ne, lêbelê ew xaleka giring diresimînin: Pêkhatina PKyan pêvajoyeka dînamîk e û mimkun e zarên cuda di astên cuda da bin di warê wergirtina PKyan weku yekeyên tekane, hem ji hêla peyvrêzî hem ji ya morfolojîk ve. Heger em pêvajoya PK çêkirinê weku pêvajoyeka zêdebûna bêjebûna binyadên peyvrêzî yên pirtik/N/hev.+Kyê binirxînin, hingê beşdarkirina morfolojîk a tam ku di encamê da reheka karê ya nû tê afirandin, dê wisa bixuye ku asta dawî dinimîne.

4.5. Kurtiya PKyan di kurdiyê da

Di bin şablona N+Kyê da ku ji derûv da yekreng xuya dike, PK cudahîyên binyadî yên bêhejmar li ber çavan radixin. Encama sereke ya analîzê ew e ku mirov dikare du tîpên PKyê li pey statuya peyvrêzî ya Nyê ji hev derxe û ji hev cuda bike. Di PKyên beşdarkar da, N ji hêla peyvrêzî ve neçalak e û nikare rêkeftinê kontrol bike. PK weku yekeyeka hevgerî ji hêla peyvrêzîyê ve têper e ku loma berkareka rasterast a îlawe rayedar dike. Ligel vê yekê, beşdarkirina peyvrêzî ji hêla beşdarkirineka morfolojîk a tam ve nayê beramberkirin: Çê dibe N û Kya PKyên beşdarkar ji hêla hin pêşgirana ve ji hev bîr veqetandin. Li milê din PKyên nebeşdarkar rê nadin berkareka rasterast a îlawe. Em dikarin polînkirina xwe ya heta vê derê bi awayê jêrin kurte bikin:

(52)

PKyên BEŞDARKER	PKyên NEBEŞDARKER
N ji hêla peyvrêzîyê ve neçalak e, berkara rasterast a îlawe mimkun e	N şûna berkara rasterast dadigire, tu berkara rasterast a îlawe ne mimkun e
PK ji hêla peyvrêzîyê ve têper e	PK ji hêla peyvrêzîyê ve têneper e

N û K ji hêla morfolojîk ve nayên beşdarkirin

PKyên nebeşdarkar bi zelalî li ser qalibên peyvrêziya berhemder tê modelkirin di zimanî da, û ez li pey piraniya pisporên zimanên îranî xeteka cudaker a zelal di navbera kombînasyonên N+K yên tesadufî û PKyên adetîbûyî da red dikim. Ew ji hêla pileya îdyomatîzasyonê, ji hêla nebûna hin taybetmendiyên argumentî yên Nyê (bn rewş nîşankirin) û bi şîyana xwe ya rayedarkirina argumentên îlawe ji risteyên têper ên kanonîk cuda dibin. Herweha, hin PK taybetmendiyên binyadî yên bêmanend bi pêş dixin (weku wanên ku di nimûneyên (39)-(40)ê da hatin nîşandan) ku ev piştrast dike ku frekansa pêwendiyê dikare rê li ber pêkhatina binyadên nû veke.

Ji riwangeheke navzimanî PKyên beşdarker balkêştir in. Avaniyên bi vê tîpê taybetmendîyeka giring a tîpolojîk a zimanên îranî û îndo-aryanî pêk tîne ku bi yekcarî di îngilîziyê da tune ye û bi qasî ku dizanim di piraniya zimanên îndo-ewropî yên rojavayî da tune ye. Çemka beşdarkirina peyvrêzî ya li vir pêşxistî çend diyardayan rave dike: Yekem, nebûna nişankirina rewşê, azadiya rêza peyvan, çendîker û çawanîderên li ser Nyê. Ev ji wê rastiyê tê ku ew ne argumentek e. Duyem, ew diyarde ku ew di bin pasîfkirinê da bikerbûnê bi dest naxe. Sêyem, ew ji bo armancên rêkeftinê tê paşguhkirin (bb (25)ê) û herî dawî, riste rê dide berkareka rasterast a îlawe. Ev diyarde hemû tîra xwe bi zelalî ji wê qebûlê tîra ku bi wê N di PKyên beşdarker da ne xwedî statuya argumentî ye.

5. Boçûnên argument-parvekirinê: Mohanan (1997)

Di hindiyê da PKyên ji navekê û kareka têper pêkhatî gelekî dimînin bi yên kurdîyê. Mohananê (1997) li ser esasê nosyona argument parvekirinê analizêka avaniyên wisa pêşniyaz kirîye, ku li gor wê N û K bi hev ra binyada argumentî ya risteyê diyar dikin. Ligel ku xebata wê hem li ser PKyên bi karên tîneper û hem jî li ser PKyên bi karên têper e, ji bo hêsankariya berawirdkirinê ez dê bi tenê li ser yên têper gengeşe bikim.

Mohanan eleqedarî wê yekê ye ku nimandineka peyvrêzî û semantîk bi pêş bixe ku bikare wî tiştî vegire ku ew weku siruştî kompozîsyonê a PKyan dinirxîne. Analîza wê sê engaşên tîkildarî hev berceste dike: Yekem, Nya PKyan pêveberî ye û tevkarîyê li binyada argumentî ya risteyê dike. Duyem, tevî ku N tevkarîyê li binyada argumentî ya PKyê dike, dibe ku ew bi xwe argumenteka Kyê be. Sêyem, PK kategorîyeka frazî pêk tîne û ji ber ve yekê “bi awayekî pişt-ferhengî tê pevxistin, ne bi ferhengî” (433, heta ku berevajîyê wê neyê diyarîkirin hemû jêgirtinên di vê binbeşê da ji Mohanan 1997ê ne). Em dê li vê derê bi tenê her du engaşên pêşî binirxînin û nedin dî wê pîrsê bê ka PK bi ferhengî tîra hilanîn yan bi peyvrêzî tîra dariştin. Weku hat amajekirin, ez tîgihîştineka berfirehtir a ferhengê tercîh dikim, yeka wisa ku ew yekbûna ferhengî bînpê jî bikin, weku prîmîtîfan destûrê dide yekeyên frazî (ji bo argumanên ku ji bo PKyan piştgirîya vê pozîsyonê dikin, bin. Ackerman û Lesourd 1997).

Ka em li delîlên ji bo siruştî karî ya Nya PKyên hindiyê binêrin. Nimûneyên jêrîn ên ji Mohanan 1997ê¹⁶ bi kara *karê* ‘kirin’ hatine sazîkirin (ev kar ji hêla

16 Wergêran û tîpguhêzî ji Mohananê ye, şîrove hatine guhertin.

etîmolojîk ve têkildarî *kirina* kurdîyê ye):

- | | | | | | |
|------|------------------------------------|------------------|----------------------------------|--------------|---------------------|
| (53) | <i>raam-ne</i> | <i>apnaa</i> | <i>homwark</i> | <i>kîyaa</i> | [434] ¹⁷ |
| | Ram-ERG | a xwe | spartek (n) | kirin(TEM:n) | |
| | ‘Ram sparteka xwe çê kir’ | | | | |
| | | | | | |
| (54) | <i>raam-ne</i> | <i>mohan-par</i> | <i>b^harosaa kîyaa</i> | [434] | |
| | Ram-ERG | Mohan-CIH | bawerî(n) | kirin(TEM:n) | |
| | ‘Ram bawerîya xwe bi Mohanî anîbû’ | | | | |

Mohanana dîyar dike ku *kar* ‘kirin’ du argumentan rayedar dike, “kesekî ku dike” û “tiştêkî ku hatîye kirin”. Di (53)ê da ev her du bi dorê *Raam* û *homwark* in. Lêbelê di (54)ê da argumenteka îlawe, *Mohan*, heye ku ji hêla karê ve nayê rayedarkirin. Bi dîtina Mohananê “tekane ravekirina meqûl ji bo vê argumenta îlawe ew e ku ew ji hêla navê yanî ji hêla *b^harosaa* ‘bawerî’ tê rayedarkirin. Bi gotineka din di vê risteyê da *b^harosaa* tevkarîyê li hejmara argumentan dike, û loma beşdarî pêveberbûnê dibe.” (434-435)

Li ser esasê van nimûneyan û yên weku wan Mohanan digihîje wê encamê ku N bi xwe pêveberî ye ji ber ku dikare argumentan tayîn bike. A rast potansiyela pêveberîyê ya Nyê ji bo pênaseya Mohananê ya PKyan pîvanek e: “avanîyeka kompleks ku tê da **du hêmanên ku ji hêla semantîk ve pêveberî ne**, bi hev ra binyada risteyeka peyvîzî ya tekane dîyar dikin” (432, dupatkirin bi destê min e).

Ka nuha jî em li engaşa duyem binêrin, ku bi wê tevî ku N bi xwe pêveberî ye, ew di heman demê da argumenteka Kyê ye. Delîla ji bo vê yekê ji qalibên rêkeftinê yên li ser karê tê. Di demên borî da, karên têper ên hindîyê ji hêla zayendê ve ligel berkara rasterast rêk dikevin. Bo nimûne di (54)ê da kar rêkeftina nêrtîyê nîşan dide. Lê di (55)ê da kar rêkeftinê ligel nava mê *nafratê* nîşan dide:

- | | | | | | |
|------|------------------------------|-----------------|---------------|---------------|-------|
| (55) | <i>ilaa-ne</i> | <i>mohan-se</i> | <i>nafrat</i> | <i>kii</i> | [454] |
| | Îla-ERG | Mohan-tnp | nefret(m) | kirin (TEM:m) | |
| | ‘Îla ji Mohan nefret kirîye’ | | | | |

Kar bi vî awayî ji hêla zayendê ve ligel Nya PKyê rêk dikeve. Ev nîşan dide ku divê N berkara rasterast a Kyê be, ji ber ku bi tenê berkarên rasterast ji bo rewşê nayên nîşankirin û bi tenê berkarên rasterast rêkeftina li ser karê han didin. Wisa dixuye ku delîleka din a ji pasîfîkirinê (456) palpiştîya vê analizê dike. Lêbelê N ji her hêlê ve


17 Amaje bi hejmara rûpelan a Mohanan 1997ê dike.

weku berkareka rasterast a tam kemilî tevnagere. Delîla ji têkilhevkingirîne (444-446) derdixe holê ku berevajî berkareka rasterast a asayî, çê nabe N ji Kyê bê veqetandin (ji bilî topîkalîzasyonê, ku Mohanan dîyar dike ku ew ji têkilhevkingirîne cuda ye).

Bi kurtasî, em dibînin ku (a) N di dîyarkirina binyada argumentî da xwedî par e; û (b) N bi kêmanî xwedî hin taybetmendiyên argumenta Kyê ye, ji ber ku; xwedî wê şîyanê ye ku rêkeftina li ser Kyê han bide û muhtemelen di bin pasîfkingirîne da hildikişê statuya bikerîyê. Ligel van yekan, ew ji berkara rasterast a tam kemilî ya weku *homwark* (53)ê cuda dibe ku wê sînor danîye ser serbestîya rêza peyvan. Mohanan digihîje wê encamê ku N ji ber vê yekê “ne keçeka rasterast a BNYê ye, lê beşeka pêkhêna karî ye” (446). Binyada PKyê bi şiklê jêrin tê nimandin:

(56) *raam-ne apnaa b^harosaa kiyaa* [= nim. 54]

‘Ram bawerîya xwe bi Mohanî anîbû’



228 |

Bînin bîra xwe ku analîza min a PKyên kurdîyê yê nebeşdarker a di 4.1.ê da ji gelek hêlan ve manendî vê ye: Nyê nişankera rewşê û serbestîya rêza peyvan tune ye ku ev di rewşên normal da têkildarî berkareka rasterast in, lê dîsa jî wisa dixuye ku ew pozîsyona berkara rasterast bloke dike di risteyê da, yanî wê hinekî statuyeka argumentî ya jêmayî heye (bila di bîra we da be ku ji bo kurdîyê rêkeftina zayendî li ser karê weku teşxîseka berkarbûnê tune ye). Wisa dixuye ku di her du zimanan da jî dibe ku argumentekê hin taybetmendiyên berkarekê hebin, lêbelê ne hemû, yanî divê em qebûl bikin ku dereceyên cuda yê berkarbûnê hene.

Ka em berê xwe bidin kêşeya navendîtir ku ew statuya pêveberî ya Nyê ye. Mohanan ji bo nimandina binyada pêveberî ya Nyê formalîzmekê bi pêş dixê ku li vir detayên wê ji me ra ne lazim in (439-443). Analîza wê ya PKya *b^harosaa karê* ‘bawerî pê anîn’ ji kombînasyona du komên cuda yê semantîk û binyada argumentî pêkhatî ye ku yek ji bo Nyê yek ji bo Kyê ye. Ev her du pev dikelijin û di asta binyada argumentî da ji bo PKyê binyadeka yekristeyî derdixin holê. Ev yek kakilê analîza argument parvekirîne ye.

Giring e mirov dîyar bike ku hemû nimûneyên Mohananê ji PKyên navên bûyerên razber û ji hêla semantîk ve kompleks in; yê wêku *b^harosaa karê* ‘bawerî pê anîn’ *saafaai* ‘paqij kirin’, *apmaan* ‘heqaret kirin’. Kurdîyê ji PKyên ji navên wisa pêkhatî hene, bo nimûne *bawer kirin*, *mêze kirin*, *hez kirin*. Mirov dikare bi awayekî meqûlane li ser zemîna semantîkê Nyên van PKyan pêveberî binirxîne, û ji bo PKyên vê tîpê boçûna argument parvekirinê qetîyen pêşniyazeka serincrakêş e.

5.1. Argumanên li dijî argument parvekirinê

Rast e ku ravekirina argument parvekirinê analîzeka ronîker a hin PKyên nebeşdarker pêşkêş dike, lêbelê zêde ne zelal e bê ka boçûneka wisa ji bo hemû PKyên kurdîyê heta ji bo hemûyên hindîyê guncayî ye yan na. Di vî warî da sê îtirazên sereke hene. Ya yekem tîkildarî nirxandina Mohananê ya temamkerên xwedantîyê ye. Hin PKyên hindîyê argumenteka xwedantî-nîşankirî ya îlawe heye, nimûneya jêrîn yek ji wan e:

(57) *raam-ne kamre-kii safaai kii* [437]
 Ram-ERG **jûr-XWED** paqijkirin(m) kirin(TEM:m)
 ‘Ramî jûr paqij kir’

Li gor Mohananê nava bi xwedantîyê nîşankirî ya (57)ê argumenta tevahîya PKyê ye, ku ew û argumenta cihî ya (54)ê di heman statuyê da ne. Loma di dara diagramîk a beramber da, ew weku keçeka rasterast a BNyê tê wergirtin (448). Lê di dewama xebata xwe da (460) Mohanan qebûl dike ku navên xwedantîyê çawanîderên Nyê ne û ji hêla zayendê ve ligel wê rêk dikevin, loma radigihîne ku di rastîyê da ew ne keçên rasterast ên çeqa BNyê ne. Tevî vê yekê ew engaşt dike ku xwedantî argumenteka peyvrezî ya nepêbend e; ji ber ku mimkun e ew dûrî nava xwe ya rêveber bê tîkilhevkirin, û ji ber reftara wê ya di bin pasîfîkirinê de.¹⁸ Feqet analîzeka din a van avanîyan ya Burton-Page (1957: 477)ê digihîje encama dijber, yanî digihîje wê encamê ku temamkera xwedantîyê binpêkheneka Nyê ye, ne argumenteka pêveberê ye. Ez bi tenê dikarim bigihîjim wê encamê ku ev kêşe hîna bi awayekî tetmînkerane nehatîye çareserîkirin.

18 Delîla ji pasîfîkirinê ne qanihker e. Nimûneya tekane ku Mohanan dide hevoka pasîf ya *Ilaa-se mohan-kaa apmaan kiyaa gayaa* ye ku wê wisa wergerandîye: ‘heqaret hat kirin li Mohanî ji hêla Ilayê ve’. Ew ji delîlên ji jêbirin cînavê û kontrolê, digihîje wê encamê ku ne *Ilaa-se* ne ji *mohan-kaa* dikare bibe biker; loma divê ‘heqaret’ biker be. Çareserîya ku ew li ser nîqaş nake ew e ku bikera risteya pasîf PKya kompleks *mohaana-kaa apmaan* ‘heqaretkirina li Mohanî’ be, ku ev binyadeka weku ‘[Heqaretkirina li Mohanî] hat kirin ji hêla Ilayê ve’ derdixê holê.

Analîza Mohananê ya xwedantîyan weku argumentên sereke yê PKyê li ser kurdîyê nayê tetbîqkirin. Bînin bîra xwe ku kurdîyê jî nimûneyên vê tîpê hene, weku di (37)ê da *alîkarî kirin*. Weku min dîyar kir, xwedantî li vê derê weku bînpêkhêneka Nyê dixuye. Berevajî hindîyê xwedantîyên kurdîyê di bin tu şert û mercan da ji sereya xwe ya navî venaqetin û reftara wan a di bin pasîfîkirinê da bi bihêzî nîşan dide ku ew bi sereyerê ra pêkhênekê çê dîkin. Di kurdîyê da, temamkerên xwedantîyê esasen ji tîpên din ên argumentî cuda ne û ji bo wan nimandîneka din a bîngêhîn hewce ye. Ew cihê lêpîrsînê ye bê ka argument parvekirin ji bo wan lêhatî ye yan na.

Pîrsgîrêkeka din a analîza argument parvekirinê ew e ku ew xwe bi giranî dispêre wê pêşqebûlê ku N di rastîyê da karî ye. Weku hat behskirin, di eslê xwe da ev pêşqebûl di pênaseya Mohananê ya PKyan (432) da bicîhkirî ye, ku ew “du hêmanên ji hêla semantîk ve karî” pêşîn qebûl dîke. Li ser vê pênasekirinê, heger Nyek “ji hêla semantîk ve ne karî” be, hingê avanî ne PKyek e. Lê qest ji naveka karî çi ye?

A rast Mohanan delîlên nepêbend ji bo pêveberîya navan nade, yanî delîlên ji derveyî reftara wan a di PKyan da nade. Lê dîsa jî ew navên duhêman û yekhêman yanî navên xwedî valensên cuda ji hev vediqetîne. Bo nimûne *b^harosaa* duhêman tê nîrxandin lê *safaaii* (57) yekhêman e. Li gor Mohananê mirov dikare valensa navekê qîsman li ser esasê semantîka wê dîyar bike:

“di bawerkirinê da yek heye ku bawer dîke û yek heye ku bawerî pê tê kirin. Berevajî vê paqijî rewşa pêveberî ya cihekî ye û ne hewce ye ku tê da beşdareka din hebe. Loma bîngêheka giring ji bo biryardana valensê mane ye.” (442)

Ev arguman dûrî qanîhkirinê ne. Berî her tiştî bêjeya ji bo paqijîyê di hemû nimûneyan da weku ‘paqijîkirinê’ hatîye dayîn, ne ‘paqijî’. Di navbera ‘paqijîkirin’ û ‘paqijîyê’ da ji hêla semantîka bûyerî ve (yek pêvajoyê ye, ya din encam) qiyametek ferq hene. Ya duyem, heger di bêjeya *b^harosaayê* da du beşdar hebin, helbet di bêjeya *puujaayê* ‘perestin’ da jî dê du heb hebin ku yek dipereze û yek tê perestin. Lê dîsa jî ev bêje yekhêman dixuye (443-444). Herçend ev yek ji hêla Mohananê aşkera nehatibe dîyarkirin jî, hûrbûneka nêzîktir li ser nimûneyan derdixê holê ku navên ku yekhêman hatine hesibandin ew nav in ku temamkerê xwedantîyê bi rê ve dibin; lê herçi ew nav in ku rewşeka cuda weku ya cihî tayîn dîkin, ew duhêman hatine hesibandin. Lê ez dibêjim qey ji ber ku her navek dikare xwedî

dîyargîneka xwedantîyê be, ev ji bo dîyarkirina valensa navan weku teşxîseka bawerîder xuya nake.

Îtiraza herî cidî li argument parvekirinê têtîqkirina wê li ser PKyên beşdarker e. Di PKyên hindîyê da yên ku heta vê gavê bûne cihê gengeşekirinê, N rêkeftina li ser Kyê dîyar dike (bb (55) û (57)ê li jor) û loma ew argumentek e. Lêbelê pisporên zimanê hindî ji zû da bal kişandîye ser hebûna hin PKyan ku di wan da N ji bo armancên rêkeftinê tê paşguhkirin, yanî weku argumenteka Kyê nayê wergirtin (bn Burton-Page 1957). Nimûneyeka wisa *yad kar* ‘hatin bîra yekî’ e:

(58) *ilaa-ne* *kissaa* *yaad* *kîyaa*
 Ila-ERG qeza(n) bîr(m) (TEM:n)
 ‘Qeza hat bîra Îlayê’

N *yaad* ‘bîr’ mê ye, feqet kar ligel *kissaa* ‘qeza’ nêr rêk dikeve. Encama ku Mohanan ji vê dîyardeyê derdixe ew e ku ne *yaad* lê *kissaa* berkara risteyê ye. Dîyardeyên rewş nîşankirin, pasîfkirin, bicihkirina nerênî û valahiştinê palpiştîya vê ferezîyeyê dikin (459-466). Aşkera ye ku ev tîpa duyem a PKyan bi nêzîkî beramberî wî tiştî tê ku min ew weku PKyên beşdarker ên kurdîyê bi nav kir: N ji hêla peyvîzîyê ve neçalak e. Ji ber vê yekê ez dê li ser bikaranîna terma PKyên beşdarker berdeham bim, ligel ku ev ne termînolojîya pisporên hindîyê ye.

Nuha bifikirin bê ka boçûneka argument parvekirinê çawa dikare rewş tayînkirina di PKyên nebeşdarker ên weku (58)ê da rave bike. Di vê tîpê da argumenta îlawe nomînatîf/akûzatîf e (pevguherîna nom/akû dimîne li ser zindîbûna nişangehê). Nuha li gor Mohananê ev argument jî ji hêla “mazûvan”ê ve gihê tayînkirin (459), bn Nya *yaad* ‘bîr’ di (58)ê de. Lêbelê Mohanan ji bo navên ku rewşa binyadî tayîn dikin tu delîlên nepêbend dabîn nake, loma ew engaşt spekulatîf dimîne ku bi wê N rewş tayînkir e. Ji vê jî giringtir, ravekirine sadetir heye: Ya ku rewşa akûzatîf tayîn dike, K ye. Herweku Mohanan bi xwe dîyar dike, N ne argument e. Ji ber vê yekê K serbest e ku rewşa akûzatîf tayînî FNyeka îlawe bike. Di eslê xwe da ev analîza beşdarkirinê ye ku min ji bo kurdîyê pêşnîyaz kir û ez bawer dikim ku mirov dikare wê li PKyên hindîyê yên wisa jî têtîq bike. Lêbelê bala we lê be ku di vê analîzê da tekane hêmana argument tayînkir K ye, ku ev bi aşkerayî bi pênaseya Mohananê ya PKyan ra nekok e.

A rast bi giştî dijwar e mirov wê hîpotezê qebûl bike ku bi wê pêkhatina PKyan di hindîyê da pêbendî Nyeka karî ye. Li ser avaniya N+K a jêrîn bifikirin:¹⁹

(59) *raam-ne kal bahut kaam kîyaa*
 Ram-ERG pir zêde kar kirin(TEM:n)
 ‘Ram pir zêde xebitî’

Derbirîna *kaam kar* ‘kar kirin’ derbirîneka zêde îdyomatîzekirî ye, ku Fairbanks & Misra (1996: 31) wê weku “kareka lêkdayî ya nekarî” werdigirin ku ev beramberî wî tiştî ye ku pisporên din wê weku PK bi nav dikin. Feqet weku em ji nimûneyê dibînin, ew ji Nya xwe pê ve argumenteka îlawe naxwaze. Mirov dikare temamkerên daxwazkî yên îlawe dabîn bike, weku “li malê” yan heta bi temamkera xwedantîyê ya *kaamê* ‘kar’ weku ‘karê hotêlê’ (bb Fairbanks & Misra 1966: 32). Lêbelê zêde ne mimkun e hêmanên wisa daxwazkî ji bo wê engaştê zemîne xweş bikin ku bi wê N pêveberî ye.

Li ser boçûna Mohananê yan divê em qebûl bikin ku N pêveberî ye yan jî divê em derbirînen wisa nexin nav koma PKyan. Ev dê reftareka gumanbar be, ji ber ku kombînasyonên weku *kaam karê* ligel PKyên weku *b^harosaa karê* xwedî gelek manendîyan e û her du jî ji hêla rêzimanên nerîtî ve weku PKyan tên nirxandin. Dawîya dawî pirsgirêk ew e ku pênaseya Mohananê ya PKyan pêşîn qebûl dike ku N pêveberî ye, lêbelê ji bilî pîvana semantîk a têra xwe xumamî tu teşxîs tune ye ku ji bo cudakirina Nyên pêveberî ji yên nepêveberî bi hêsani bê tetbîqkirin.

5.2. Kurteya boçûnên argument parvekirinê

Boçûna argument parvekirinê ne nû ye. Jackendof 1974ê ji bo PKyên îngilîzîyê yên weku *put the blameê* ‘sûc xistin stûyê yekî’ ravekirineka formel bi pêş xistiye, ku di van PKyan da pevxistina binyadên argumentî yên N û Kyê yên cuda hene. Cattell (1984: 5) jî behsa siruştê pêveberî ya navên di PKyên îngilîzîyê da yên weku *make a confessionê* ‘mikur hatin’ dike. Boçûnên bi vî rengî ji hêla wê diyardeyê ve tên ajotin ku hin nav bi taybetî yên ji karê dariştî yên ji semantîka bûyerî ya kompleks ên weku *blame, demonstration, confession* û hwd xwedî binyadeka argumentî ne ku bi kêmanî di asteka razber a semantîk da dişibe binyada argumentî ya karan (bb Grimshaw & Mester 1989: 210 ji bo jêgirtinan). Ji bo PKyên ku Nyên vê tîpê vedigirin, argument parvekirin rêyeka hêvîder e. Bi heman awayî ew ji bo PKyên ji du yan zêdetir leksemên karî pêkhatî têra xwe guncayî ye, herweku di hindî/ûrdûyîyê da (Butt 1997), û bi berfirehî li ser rêzekîkirina karan hatiye tetbîqkirin (bb

19 Ramawatar Yada ji kubariya xwe ev nimûne dabîn kir.

Veenstra 2000: 868). Boçûneka argument parvekirinê li ser kombîasyonên hevkar û karê ên zimanê jamînjungî (non-pama-nyungan, bakurê Awistralyayê) jî hatîye tetbîqkirin. Analîzeka wisa ji bo zimanê jamînjungî têra xwe meqûl dixuye, ji ber ku herweku Schultze-Berndt (2000: 135-145) nişan dide, ji bo siruştaya pêveberî ya karan delîlên nepêbend hene (bn bikaranîna wan weku pêveberên talî yan di raweyên fermanî de). Di zimaninan da, wisa dixuye ku PKyên N+K bi wan Nyan sînorkirî ne ku semantîka pêveberê pêşan didin. Li gor ku xuya dike ev yek ji bo PKyên japonî yên bi kara sivik *suruyê* 'kirin' jî wisa ye: Grimshaw & Mester (1989: 210) dîyar dikin ku pevkelijîna argumentî ku taybetmendîya xweserî vê tîpa PKyan e, bi tenê ligel wan Nyan pêk tê ku "pêvajoyan" amaje dikin, ne encaman. Li vir sînorkirinên semantîk ên li ser Nyê beramberî cudahîyên binyadî tèn. Bi gelemperî dema ku mirov dikare siruştaya pêveberî ya her du hêmanan li ser zemînên nepêbend ava bike û dema ku avaniya di bin vekolinê da bi tenê ligel hêmanên wisa mimkun be, argument parvekirin manedar e.

Lê belê rewş ji bo kurdîyê û zimanên din ên îranî ne wisa ye. Bo nimûne li ser PKya kurdîyê *av danê* bifikirin. Ravekirineka argument parvekirinê dê wisa bihesibîne ku nava nehejmarbar a sade *av* xwedî binyadeka pêveberî ye, ku ev li ser zemîneka semantîk ne tiştêkî meqûl e. A rast tiştê min fam kirîye, di kurdîyê da pêkhatina PKyan bi tu pola semantîk a dîyarkirî ya navan ne sînorkirî ye.

Loma argument parvekirin ji bo hin avaniyan ku di bin etiketa "pêvebera kompleks" da tèn wergirtin, rêyeka hêvîder e. Feqet di kurdîyê da û di zimanên din ên îranî da, PK bi stratejiyeka din a gelekî giştî tèn pêkanîn ku ew hêmanên nekarî bi karan ra kombîne dike (bin. 6.3.ê). Bêguman e ku em li nav hêmanên nekarî jî navên xwedî semantîka bûyerî ya kompleks dibînin. Lê ev ji bo binyadê ne pêşmercek e.

Herî dawî divê ev îtiraza min a li argument parvekirinê ji bo kurdîyê, wisa neyê şirovekirin weku ez tu karîgerîya Nyê li ser binyada argumentî ya PKyê qebûl nakim. Têra xwe zelal e ku PKyan binyadên argumentî hene ku ji yên karên wan ên esasî cudatir in û bi vê maneyê divê weku derbirinên pevketî bên hesibandin. Lêbelê ev dîyardeya ku binyada argumentî ya PKyê ji ya kara simpleks cuda ye, bi tena serê xwe nikare berê me bide wê encamê ku N argument tayînkerek e. Dibe ku ev yek qismen encama wê dîyardeyê be ku N -bi kêmanî di hin PKyan da- pozîsyoneka argumentî ya Kyê dagir dike, loma di konfigurasyona argumentî ya muhtemel a risteyê da dibe sedema guherînekê. Û herweku min min behs kir, ji bo PKyên nebeşdarker boçûneka argument parvekirinê ne meqûl e.

6. Ber bi ravekirineka yekbûyî ya PKyên kurdîyê ve

6.1. Statuya kategorîk a hêmana nekarî (HNK) di PKyê da

Senifandina PKyan ya di Tablo1ê da li pey zanyariya nerîtî sê kategorîyên hêmanên nekar ji hev cuda dike: nav, hevalnav û pirtik. Me xwe spart wê ferezîyeyê ku ev senifandineka rewşa ye û em li ser PKyên ji N+kar pêkhatî hûr bûn, bo nimûne me PKyên hevalnav+kar paşguh kirin. Ligel ku wisa dixuye ku ferqa nav/hevalnav di kurdîyê da têra xwe qewî ye (navan zayenda navekî heye, hevalnavan tune), dîsa ji hin komplîkasyon hene ku heta nuha min pûte bi wan nedaye. Li ser her du risteyên jêrîn bifikirin:

(60) *ez wî qebûl nakim*

(61) *ez wî pîroz nakim*

Di (60)ê da *qebûl* weku Nya PKyê tê şirovekirin û di ferhengên kurdîyê da (bn Omar 1992, Rizgar 1993) weku naveka mêzayend tê rêzkirin. Loma em (60)ê weku nimûneyeka PKya beşdarkar analîz dikin, ku li vir *qebûl* Nya ji hêla peyvrezî ve beşdarkirî ye. Nimûneya (61)ê di ser ra gelekî dişibe vê. Herweha her du avanî li ser parametreyên morfolojîk ên di 4.4.ê da gengeşekirî bi heman awayî tevdigerin. Ligel vê yekê li gor ferhengan *pîroz* hevalnav e û li gor mentîqa li paş senifandina PKyan ya di Tablo1ê da divê em (60) û (61)ê weku du binyadên cuda şirove bikin.

Lê belê ferheng temamê heqîqetê nabêjin. Dema ku mirov bikaranîna fiilî ya *qebûlê* di korpûseka edebîyata kurdî ya nivîskî ya hevdem (bin. Pêvek) da vedikole, mirov dibîne ku ew bêjeyeka pirdubarekirî ye ku 97 caran rû dide. Ji van nimûneyan 95 heb di PKya *qebûl kirinê* da ne, her duyên din nimûneyên *qebûlê* weku naveka pêveberî ne (yek ji wan di risteyeka helbestekê da ye ku ne rengvedana karanîneka asayî ye). Bi gotineka din, bêjeya *qebûlê* di pratîkê da li derveyî kombînasyona *qebûl kirinê* nayê bikaranîn, ku agahîderên min vê yekê piştrast dikin. Min tu nimûneyên wê nedîtine ku sereya FNyekê be - FNyeka bi çawanîder, artîkel yan nişankerên rewşê. Ne ji ew bi referanseka spesîfîk tê bikaranîn. Bi gotineka din, hem ji hêla bikaranîna formel û hem ji hêla fonksiyona gotarî da ji hemû xeml û xêza naveka prototîpîk bêpar e.

Dema ku mirov di bin vê ronîyê da li meseleyê binêre, ferqa teqez a di navbera nav û hevalnavê da û bi wê ra ji ferqa teqez a di navbera PKyên N+K û PKyên N+Hevber bi xumamîyê ve diçe. Ji engaştên ferhengnivîsan pê ve çî delîla me heye ku *qebûl*

bi rastî nav be (û dibe ku ferhengnivîs ji ber karîgerîya erebî wisa engaşt dikin, ji ber ku *qebûl* di erebî da nav e)? Bi serîyekî din heger em wisa bihesibînin ku Nya vê PKyê piraniya taybetmendîya xwe ya “navî”yê winda kirîye, hingê di destê me da ravekirineka hazir a taybetmendiyên peyvrêzî yên PKyê dê hebe: N nêzîktirî hevalnavê ye (ku weku hevalkar tê bikaranîn); çê nabe ew artîkel û hwd bistîne, çê dibe ji bo armancên rêkeftinê bê paşguhkirin û ya herî giring, şûneka argumentî dagir nake. Mirov dikare bi çavê vê mentiqê li hin PKyên din ên beşdarker binêre, bo nimûne *rast kirin* yan *nas kirin*. Du maneyên hevtêkildar ên *rastê* hene ku yek ji wan nav, ya din hevalnav e. Bi heman awayî du maneyên *nasê* jî hene. Bi dîtina min dema ku bi kareka sivik ra kombînebûyî be, ne mimkun e mirov biryar bide bê ka PKyeka beşdarker a N+K ye ku tê da N hemû statuya xwe ya argumentî winda kiribe, yan derbirineka hevalnav+K ku tê da hêmana nekarî ji hêla ferhengî ne xwedî şîyana argumentbûnê be. Ji ber vê yekê mirov dikare PKyên beşdarker bi kêmanî qismen bi pêvajoyeka dekategorişasyonê yan bi windabûna navbûna Nyê rave bike.

Lê dîsa jî ev yek PKyên beşdarker hemûyan rave nake. Bo nimûne Nya di *derman kirinê* da bi awayekî asayî weku sereya FNyekê rû dide ku vê FNyê referansa spesîfik bi rewş nîşanker, paşgira nenasariyê û hwd heye. Loma ravekirina ku Nyê navbûna xwe winda kirîye, mirov nikare ji bo hemû rewşan serî lê bide. Dîsa jî Nya PKya beşdarker û hevalnaveka ku weku hevalkarekê kar dike, têkilîya di navbera wan da nêzîk e, û ihtîmal heye ku li ser rehên diakronîk ên PKyên beşdarker serdezîyekî dabîn bike. Hêja ye mirov dîyar bike ku ev ravekirin ji bo PKyên beşdarker ên tirkîyê rasttir e, ku di wê da xeta cudaker a ferhengî a navbera nav û hevalnavan ji destpêkê da lawaz e (Braun & Haig 2000). Ji bo hindiyê jî dibe ku cudahiya nav/hevalnav her tim ne zelal be. Bo nimûne Mohanan (1997: 457) kombînasyona *pasand kir* ‘hez kirin’ weku PKyeka ji nav (*pasand*) û karekê pêkhatî werdigire, lê di Masica (1991: 369, nim. 259)ê da heman kombînasyon weku PKyeka ji hevalnav û karekê pêkhatî tê hilsengandin. Loma wisa dixuye ku guherîna heta pileyekê a navbera kategoriyan di PKyên beşdarker da rolekê digêre, ku ez dê di binbeşa din da vê xalê bi pêş bixim.

6.2. PK weku taybetmendîyeka tîpolojîk a kurdîyê

Di gengeşekirina jorîn da me du tîpên mezin ên PKyan tesbît kirin ku yek PKyên beşdarker û ya din yên nebeşdarker in. Mirov dikare binyadên beramberî PKyên nebeşdarker di gelek zimanan da bibîne, lê PKyên beşdarker taybetmendîyeka karakterîstîk a kurdîyê ye, û di rastîyê da bi giştî ya zimanên îranî û îndo-aryanî

ye. Ev yek wê pirsê bi xwe ra tîne bê ka em bi du avaniyên esasen ji hev cuda ra serederiyê dikin yan na. Ez bawer dikim ku bersiva vê pirsê na ye; bêtir, ez bawer dikim ku divê her du tîpên PKyan weku refleksên taybetmendiyeka tîpolojîk a xasî zimên a berfirehtir bèn nixandin, ku ez dê di vê binbeşê da bi kurtî rave bikim.

Bînin bîra xwe ku di 4.1.ê da sê tîpên PKyan li gor kategoriya hêmana nekarî ji hev hatin veqetandin:

PKyên Pirtik+Kar:	bn <i>der-ketin, ve-xwarin</i>
PKyên Hevalnav+Kar:	bn <i>piroz kirin</i>
PKyên Nav+Kar:	bn <i>av dan</i>

Min di 6.1.ê da bal kişand ser wê diyardeyê ku di gelek rewşan da zehmet e mirov xeta cudaker bikişîne navbera navan û hevalnavan. Heman tişt ji bo ferqa navbera hevalnav û pirtikan jî lidar e. Nimûneyeka baş a vê yekê pêşkara çêyê ye ku di her du PKyên *çêkirin* û *çêbûnê* da heye. Ew di eslê xwe da hevalnav e ku maneya wê *baş* e û ev mane di forma berawirdkirinê *çêtirê* da parastî ye. Lêbelê hin bêjeyên din (*baş* yan *rind*) hema hema bi temamî şûna hevalnava sade girtiye û îroj bêje/pirtika *çêyê* hema hema bi temamî bi tenê di her du PKyên jorîn da tê bikaranîn. Ji ber van diyardeyan, ne hêsan e mirov bibêje bê ka *çê* pirtik e yan hevalnav. Pirsgirêkên pênasikirinê yên manend ji bo hin karên farsiyê jî hene ku ji wan ra dibêjin karên pirtikî (bb Telegdi 1995: 74-75).

Ji ber vê yekê divê em qebûl bikin ku di navbera her sê kategoriyan pirtik, hevalnav û navê da pileyeka hevbirinê heye. Herweha her sê tîpên PKyan jî li gor pîvana morfolojîk a di 4.4.ê da behskirî bi heman awayî tevdigerin. Herî dawî, yek ji wan jî karigeriyê li têperiya ferhengî ya karê nake (ev yek bi awayekî tund dijberî pêskarên almanî û rûsiyê ye, ku ew bi asayî karigeriyê li têperiya karê dikin). Bi gotineka din di her sê tîpan da gelek xalên hevbeş hene. Nuha senifandina me ya PKyan a sêbend xwe dispêre pola ferhengî ya hêmana nekarî tenê, lê weku me dît, ferqên navbera kategoriyan ferhengî di pozîzyona pêskarî da heta dereceyekê hatine nêtarîkirin (bn nebûna rewşê, artîkelan û hwd). Ji ber vê yekê ez bawer dikim ku pênasayeka besendetir a PKyên kurdîyê, wê binyadeka PKyan a giştî weku a (62)ê qebûl bike:

(62) Binyada giştîkirî ya PKyan ji bo kurdîyê:

[XK], X di vir da hêmaneka kategoriyeke ferhengî yan frazî ya nekarî ye.

Dibe ku ji hêla peyvrêziyê ve X neçalak be: Di pirtik, hevalnav û Nyên PKyên beşdarker da rewş wisa ye. Yan dibe ku ew statuya xwe ya argumentî biparêze (herweku di PKyên nebeşdarker da). Yan jî dibe ku ew kategoriyeka frazi be, FNYek be (di PKyên temamkerên xwedîtîyê da rewş wisa ye). Feqet ferqên binyadî yên di navbera tîpên cuda yên PKyan da bi awayekî tam yek bi yek nayên hemberî ferqên di kategoriya ferhengî ya hêmana nekarî de. Tiştê ku em dibînin ew e ku hin PKyên N+K fiilen pir zêde weku PKyên hevalnav+K tevdigerin, lê PKyên hevalnav+K û PKyên pirtik+K ji hêla binyadî ve hema hema eynî ne.

Hevbeşî û cudahî di diagrama jêrîn da tîpên kurtêkirin. Di diagramê da tîpên cuda yên PKyan li ser dirêjeyeka pileyê ya pevkelijîna hêmanan tîpên bicihkirin:

Pileya pevkelijîna di navbera N û Kyê de					
Herî kêm			Herî zêde		
1	N+K Temamkera Xwedîtîyê	N+K Temamkera Daçekî	N+K Beşdarker	Hevalnav+K	Pirtik+K
2	Nav			Hevalnav	Pirtik
3	Argument, FN	Argument, lê bêpar ji statuya FNYê	Ne yek jî		
4	gire, bêje	gire, bêje (?)	gire/ne yek jî ²⁰		
5	erê	erê (?)	na		

1= tîpa PKyê; 2= kategoriya ferhengî ya hêmana nekarî (HNK); 3= statuya peyvrêzi ya HNKyê; 4= çê dibe HNK ji Kyê bê veqetandin ji hêla (bb 4.4.); 5= HNK xwedî şîyanweriya referansa nepêbend e; ?= ji bo hemû endamên kategoriye ne lidar e.

Tablo 3. Taybetmendiyên formel ên tîpên cuda yên PKyên kurdîyê

Weku ji Tablo 3yê dîyar e, faktoreka binyadî ya tekane tune ye ku beramberî cudahiya nerîtî ya navbera nav, hevalnav û pirtikan be. Bi taybetî hevalnav û pirtik hema hema di hemû parametreyên binyadî da bi heman awayî tevdigerin. Loma aşkera ye ku ji PKyên pirtikî bo PKyên hevalnav+K gaveka biçûk heye.

Dema em qebûl dikin ku ferqên navbera kategoriye ferhengî di PKyan da heta dereceyekê tîpên nêrkirin, ev yek derbarê geşedana diakronîk a PKyên kurdîyê da serdeziyekî dide destê me. PKyên bi pirtikan taybetmendiyeka hemû sefhîyên pêşî yên çespanî yên zimanên îndo-ewropî ye, û taybetmendiyeka giring a gelek keçezimanan

20 Bb Nimûneyên zarî ên beşdarkirina morfolojîk di 4.4.ê da.

e (Telegdi 1955: 173-175, Watkins 1964). Ji ber vê yekê em dikarin wisa bihesibînin ku ew ji serdemên herî pêşî yê kurdîyê mîrat mane. Ligel vê yekê, karên pirtikî di her zimanekî îndo-ewropî da ketine nav geşedanên pir cihêreng. Di hin zimanan da bi taybetî di zimanên cermenîk û silavîk da ew hîn jî têra xwe berhemder in û weku têperker û nîşankerên xuyangê (li gel gelek tiştên din) hin fonksiyonên rêzimanî bi cih tînin. Herçi di farsîyê da ye, tevî ku gelek karên pirtikî di hin kombînasyonên sebit da hene, ew êdî ne berhemder in (Telegdi 1955). Dema ku berhemderiya karên pirtikî ketiye, PKyên nav+kar zêde bûne ku vê gavê navgîna herî berhemder a çêkirina karên nû ye di farsîyê da. Em dikarin di kurdîyê jî da geşedaneka manend qebûl bikin: Karên pirtikî hene, lêbelê êdî ne navgîneka berhemder a çêkirina pêveberên nû ne, berevajî vê kombînasyonên N+K berbelav in.

Naxwe em dikarin wisa qebûl bikin ku geşedana PKyan di zimanên îranî da pêşî bi avaniyekê dest pê kiriye ku tê da kar bi pirtikan ra pevxistî ne, û bi awayekî qedemeyî berfireh bûye heta ku hêmanên din ên nekarî, hevalnav û nav vegirtine:

(63) pirtik+kar → hevalnav+kar → nav+kar

Hevterîbî vê geşedanê guherîneka din ew e ku giraniya semantîk ji karê dût ketiye û derbasî hêmana nekarî bûye û kar hema hema bûye têperkereka xumamî (kara *kirinê*). Di PKyên N+K da ku me li vir pişkinîn tiştê ku naveroka semantîk a sereke hildigire nav e. Bi giştî, mirov dikare PKyên kurdîyê weku geşedaneke avaniya karên pirtikî yê îndo-ewropî yê antîk binirxîne. Tiştê ku wisa dixuye ku pêvajoyê diajo, meyleke giştî ya karan e ku “parazîtên” nekarî bi xwe ve digirin ku dikarin di nav demê da bi karê ra bikelîjin.

Tiştê ku me rave nekirîye ew e bê ka çima PKyên N+K di zimanên îranî û îndo-aryanî da geşe dane, lê di zimanên îndo-ewropî yê Ewropayê da geşe nedane ku di wan da bi tenê PKyên pirtikî berbelav in. Dibe ku her çar taybetmendiyên binyadî yê jêrîn tevkarî li geşedanên di zimanên îndo-aryanî û îranî da kiribin:

1. Rêza bêjeyan a BKyê. Maneya vê yekê ew e ku berkara rasterast hema pozîsyona pêşkarî dagir dike, yanî ew vê pozîsyonê bi pirtika karên pirtikî ra parve dike.

2. Nebûna navgînên morfolojîk ji bo dariştina karan ji navan. Bi giştî di zimanên îranî da dariştina ji-nav-bo-karê yan lawaz e yan jî bi yekcarî tune ye. Loma PK dibin çavkaniya sereke ya derbirînên karî yê nû.

3. Berkar nişankirina dîferansiyel, bn sifir nişankirina berkarên rasterast di bin hin mercên semantîk û pragmatîk da (bn nasyarî, topikalîte yan zindîtî, bb Bossong 1985ê ji bo zimanên îranî). Maneya vê ew e ku hin navên di pozîsyona berkara rasterast da taybetmendiyeka xwe, yanî rewşê, winda dikin ku wan ji hevalnavan cuda dike.

4. Nebûna artîkelan. Ne şert e ku diyarkerên aşkera hevaltîya navan bikin, ku ev jî navan nêzîkî hevalnavan dike û rê li ber windabûnekê di statuya argumentî da vedike.

Di kurdî û farsiyê da herweku hindiyê her çar taybetmendî hene. Di zimanên dravîdî da, ku ew jî bi PKyên xwe yên N+K naskirî ne, em heman gurza taybetmendîyan dibînin (bn Tamîl, Annamalai & Steever 1998, Kanada, Steever 1998 û Telugu, Krishnamurti 1998). Ligel vê yekê ev taybetmendî ne mercên hewce û bes in ji bo hebûna PKyên N+K: Tevî ku taybetmendîya duyem a jorîn ji bo wê ne rast e, di tirkîyê jî da PKyên N+K hene. Feqet balkêş e ku tu zimanên îndo-ewropî yên Ewropayê jî van taybetmendîyan ji yekê zêdetir pêşan nade û ji wan di gelean da yek jî tune ye. Aşkera ye ku ev jî bo belavbûna PKyan dûrî ravekirineka tam e. Lêbelê ez bawer dikim ku her çi ravekirin be divê ne bi tenê bi faktorekê lê di çarçoveya kompoyeka faktorên da bê çarçovekirin. Di ber ra divê em di warê belavbûna PKyên N+K da balê bikişînin ser meyla herêmî jî.

7. Encam

Di destpêka vê xebatê da min di mijara PKyan da amaje bi du kêşeyên navendî kir: Yek statuya Nyê ya di avaniyê da ye; ew argument e, ew di karê da hatiye beşdarkirin, yan wê statuyeka navberî heye? Xala duyem ew e bê ka PK çawa binyada xwe ya argumentî tayîn dike. Analîza PKyên N+K nişan dide ku ji bo her du pirsan jî bersivê yekreng tune ye. PKyên kurdîyê di navbera PKyên beşdarker û yên nebeşdarker da cudabûnêka bîngêhîn pêşan didin, ku di yên yekem da N ji hêla peyvêzî ve neçalak e û di yên duyem da N fonksiyoneka argumentî bi cih tîne. Ji bo PKyên beşdarker statuya Nyê nisbeten aşkera ye: Ew ji hêla peyvêzîyê ve tê paşguhkirin, lê di gelek kontekstan da ji hêla fonetîk û morfolojîk ve weku bêjeyekê dimîne. Ji bo PKyên nebeşdarker bersiv hinekî komplekstir e û gelek bîntîp hatine tesbîtkirin. Di rewşinan da, Nyê gelek taybetmendîyên berkareka rasterast a tam kemilî hene (bn hilkişîna bikerîyê di bin pasîfkirinê da), di rewşina din da ev tunene; li vê derê hin ferqên hûrlîb hene ku di bêjînga analîtîk da namînin. Lê ez digihîjim wê encamê ku pênaseyeka besende ya PKyan divê çemkeka pêlikîkirî a bikerbûnê vegire.

Dema ku em li kêşeya duyem dinêrin, yanî PK çawa binyada argumentî tayîn dikin, em ji bo tîpên cuda yên PKyan dîsa encamên dijhev dibînin. Ji bo PKyên beşdarker ez engaşt dikim ku rewş tayînkera tekane K ye. Ji bo hin PKyên nebeşdarker (yên bi tamamkerên daçekî) mirov dikare ravekirineka qanihker a argument parvekirinê bike. Pêkhatina PKyan di kurdî û hindîyê da bi navên bûyerî yên ji hêla semantikê ve kompleks ne sînorkirî ye, loma dema ku mirov qebûl dike ku argument parvekirin ji bo pêkhatina PKyan cihekî navendi digire, ev tê du maneyan: Yan tê wê maneyê ku mirov qebûl dike ku hemû N pêveberî ne ku ev hilibijêrkeka nemeqûl e û rê li ber komplikasyonên nehewce di PKyên beşdarker da vedike; yan jî tê maneya derhiştina gelek kombînasyonên N+K ji qada PKyan. Ji ber ku pîvana biryardana li ser pêveberîya navekê bi hûrgilî nehatîye ravekirin, ev hilibijêrka dawî jî problematik dimîne.

Bi kurtasî, ne analîzeka beşdarkirinê ne jî analîzeka argument parvekirinê çarçoveyeka besende dabîn dike ji bo analîzkirina tamamê PKyên N+K di kurdîyê û zimanên têkildar de. Heger tîpolojî dê derbarê wê yekê da be ku bêyî ku dehaya xweser a her zimanekî feda bike ji bo berawirdkirina navzimanî prosedurên guncayî bi pêş bixe, hingê ji bo çarçoveyeka analîtîk a besende em dê mecbûn bin hinekî li dûrtir binêrin. Ji bo famkirina dataya kurdîyê weku şaxekî xweserî zimên ê taybetmendîyeka giştîtîr, yanî meyla berev kombînekirina karên sade bi hêmanên nekarî ra ji bo afirandina derbirinên nû yên pêveberî, min hin pêşniyazên demkî kirin. Vê geşedanê bi kombînasyonên pirtik+karê dest pê kirîye, lê ji ber kombînasyona faktorên di binbeşa buhurî da bi kurtî behskirî, li zimanên îndo-aryanî û îndo-îranî belav bûye heta ku kombînasyonên hevalnav û herî dawî yên nav+karan vegirtine.

Herî dawî ez dixwazim dîyar bikim ku ligel cureyên kêşeyên binyadî yên statîk ên weku pêşkêşkirina nimandinên binyada argumentî, PK rehendeka tevlihevtir û dînamîktir a îdyomîyê, guherînê û berhemderîya qismî jî dihêwirînin. A rast, tiştê ku di nêrîna pêşî da weku fenomeneka lap yekreng dixuyê, qet ne wisa ye û ez êdî bi ravekirinên PKyan ên rêkûpêk bawer nabim, bi gumana min ew qismen encama dataya bi baldarî pêşînhilbijartî ye. Ev xebata hanê hewldanek e ji bo dabînkirina bêjîngeka analîtîk a qulfireh, lê valahîya di wê da li bendê ye ku bibe cihê xebatên hûrgilîtîr ên li ser fenomenên diyarkirî.

Kurtebêje**1/2y:** kesê yekem/duyem ê yekhejmar**ART:** artîkel**bn:** bo nimûne**B:** berkara têper**bb:** bide ber**bin.:** binêre**BN:** bikera têneper**BOR:** borî**BT:** bikera têper**CIH:** rewşa cihî**ERG:** ergatîf**FK:** fraza karî**FN:** fraza navî**FP:** fraza pêşdaçekî**K:** kar**m:** mê**mot.:** motamot**N:** nav**n:** nêr**nim.:** nimûne**PK:** pêveberên kompleks**hev.:** hevalnav**TEM:** temam**tnp:** têneper**tp:** têper**XWED:** rewşa xwedantîyê**yd:** yên din**Z1:** zimanê yekem**Ferhengok²¹****adetîbûyî:** conventionalized**argument parvekirin:** argument sharing**avanî:** construction**bawerîder:** reliable**bêje:** word**berhemder:** productive**besende:** adequate**bi rê ve birin:** govern**bicîhkirina nerênî:** negative placement**boçûn:** approach**çawanîder:** modifier**çemk:** concept**çendîker:** quantifier**çeqa BNyê:** S-node**daxwazkî:** facultative**deqîqî:** punctuality**derhiştin:** exclude**dîyargîna xwedantîyê:** genitive attribute**dîyarkirî:** particular**duhêman:** diadic**ferhengî:** lexical**girêder:** linker**guncayî:** viable**heqîqî:** genuine**herêm:** region**hevbirin:** overlap**hevkar:** coverb**hîlanîn:** store**hîmdarkirin:** justification

21 Ev beşa ferhengokê di gotara orijînal da nîne. Ji bo ku xwîner ji gotarê baştir sûd wergirin ji aliyê wergêrî ve lê hatîye zêdekirin.

hûrlib: finer-grained	qad: domain
îzafeya giştî: generic ezafê	rasteqîne: true
jêbirin: delete	rayedar kirin: licence
jêketin: omit	rêza xêzekî: linear order
jêmayî: residual	rêzekî: serial
kara sivik: light verb	rêzekî kirin: serialisation
kara: agent	rêzimana avaniyan: construction grammar
karçêker: verbalizer	serdezî: clue
karî: verbal	subtle: hûrbîn
kêşe: issue	şîyan: ability
lêhatî: applicable	şûn: slot
lêkdayî: compound	tam kemilî: fully fledged
meqûl: plausible	têkilhev kirin: scramble
nav jêxistin: noun stripping	temamkerên daçekî: adpositional complement
navberî: intermediate	temamkerên xwedîtîyê: possessor complement
neçalak: inert	têrkirî: saturated
nekarî: nonverbal	beşdarker: incorporating
nebeşdarker: non-incorporating	beşdarkirî: incorporated
nîşangeh: referent	beşdarkirin: incorporate
palpişt: support	valahiştin: gapping
pêkhatina PKyê: CP-formation	valid: rewa
pêlikîkirî: graded	veneçet: indivisible
pêşan dan: display	wergirtin: treat
pêşkar: preverb	xwedantî: genitive
pêşnuma: sketch	yekbeşdar: single-participant
pêveberî: predicative	yekhêman: monadic
pêvekirin: strand	yekreng: uniform
pevgihayî: conjunct	yekristeyî: monoclausal
pevketî: composite	
peyv: utterance	
pirtik: particle	

Çavkanî

- Ackerman, F. & Lesourd, P. (1997): Toward a lexical representation of phrasal predicates, in: Alsina et al. (eds.), 67-106.
- Alsina, A. (1997): A theory of complex predicates: Evidence from causatives in Bantu and Romance, in: Alsina et al. (eds), 203-246.
- Alsina, A., Bresnan, J. & Sells, P. (eds.) (1997): *Complex predicates*. Stanford: Centre for the study of language and information.
- Alsina, A., Bresnan, J. & Sells, P. (eds.) (1997): Complex predicates: structure and theory, in: Alsina et al. (eds.), 1-12.
- Annamalai, E. & Steever, S. (1998): Modern Tamil, in: Steever, S. (eds.). *The Dravidian languages*. London: Routledge, 100-128.
- Baker, M. (1988): *Incorporation: A theory of grammatical function changing*. Chicago: Chicago University Press.
- Bedir Khan, E. D. & Lescot, R. (1986): *Kurdische Grammatik Kurmancî-Dialekt*. Bonn: Verlag für Kultur und Wissenschaft.
- Bosson, G. (1985): *Empirische Universalienforschung. Differentielle Objektmarkierung in den neuiranischen Sprachen*. Tübingen: Narr.
- Braun, E & Haig, G. (2000): The noun/adjective distinction in Turkish: An empirical approach, in: Kerslake, C. & Göksel, A. (eds.). *Studies on Turkish and Turkic languages. Proceedings of the IXth International Conference on Turkish Linguistics, Oxford, August 1998*. Wiesbaden: Harrassowitz, 85-92.
- Burton-Page, J. (1957): Compound and conjunct verbs in Hindi, in: *BSOAS* 19,469-478.
- Butt, M. (1997): Complex predicates in Urdu, in: Alsina et al. (eds.), 107-149.
- Cattell, R. (1984): *Composite predicates in English*. New York etc.: Academic.
- Dehghani, Y. (1998): *A grammar of Iranian Azari including comparisons with Persian*. PhD thesis. La Trobe University, Melbourne.

- Dixon, R. (1994): *Ergativity*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Dorleijn, M. (1996): *The decay of ergativity in Kurmanji. Language internal or contact induced?* Tilburg: Tilburg University Press.
- Dorleijn, M. & Leezenberg, M. (2000): *New registers in modern Kurmanji: syntactic structures and interference*. Paper held at the First International Conference on Kurdish Linguistics, Kiel, 12-14. May 2000.
- Durie, M. (1997): Grammatical structures in verb serialization, in: Alsina et al. (eds.), 289-354.
- Fairbanks, G. & Misra, B. G. (1966): *Spoken and written Hindi*. Ithaca. New York: Cornell University Press.
- Gallmann, P. (1999): Wortbegriff und Nomen-Verb-Verbindungen, in: Zeitschrift für Sprachwissenschaft 18.2. 267-3(M).
- 244 | Gerdts, D. (1998): Incorporation, in: Spencer, A. & Zwicky, A. (eds.), *The handbook of morphology*. Oxford: Blackweil. 84-100.
- Grimshaw, J. & Mester, A. (1988): Light verbs and θ -marking, in: *Linguistic Inquiry* 19.2,205-232.
- Haig, G. (1998): On the interaction of morphological and syntactic ergativity: Lessons from Kurdish, in: *Lingua* 105. 149-173.
- Haig, G. (2000): *Anatomy of a closed word class: Frequency, regularity and productivity of verbs in Kurdish*. Paper held at the 22. Jahrestagung der Deutschen Gesellschaft für Sprachwissenschaft, 1-3. März 2000. Phillips-Universität, Marburg.
- Haig, G. (2001). *Zum Verbot der kurdischen Sprache in der Türkei*. Lecture held in the series “Die Kurden: Geschichte - Sprache - Kultur” at the University of Kiel, 13.06.2001.

- Haig, G. (2001): The Corpus of Contemporary Kurdish Newspaper Texts (CCKNT). An exercise in corpus linguistics for modern Kurdish, in: *Kurdische Studien*
- Hale, K. & Keyser, J. (1997): On the complex nature of simple predicators, in; Alsina et al. (eds.), 29-65.
- Hopper, P & Thompson, S. (1980); Transitivity in grammar and discourse, in: *Language* 56, 251-299.
- Jackendoff, R. (1974): A deep structure projection rule, in: *Linguistic Inquiry* 5, 481-505.
- Kiparsky, P (1997): Remarks on denominal verbs, in: Alsina et al. (eds.), 473-499.
- Krishnamurti, BH. (1998): Telugu, in; Steever, S. (eds.). *The Dravidian languages*. London: Routledge, 202-240.
- Lazard, G. (1998): *Actancy*. Berlin: Mouton.
- Mackenzie, D. N. (1961). *Kurdish dialect studies-I*. London: Oxford University Press.
- Margetts, A. (1999): *Valence and transitivity in Saliba, an Oceanic language of Papua New Guinea*. Nijmegen: Max Planck Institute for Psycholinguistics.
- Masica, C. (1991): *The Indo-Aryan languages*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Matras, Y. (1989); *Probleme der Sprachstandardisierung am Beispiel der Orthographie des Kurdischen*. Unpublished MA-thesis, University of Hamburg.
- Matras, Y. (1992/1993); Ergativity in Kurmanji (Kurdish). Notes on its distribution and use, in; *Orientalia Suecana* 41-42, 139-154.
- Matras, Y. (1997); Clause combining, ergativity, and coreferential deletion in Kurmanji, in: *Studies in Language* 21.3, 613-653.

- Meyer-Ingwersen, J. (1974): Fekr-Ein Beitrag zur Transformationsgrammatik des Neupersischen, in: Frye, R. (eds.). *Neue Methodologie in der Iranistik*. Wiesbaden: Harrassowitz, 93-305.
- Mohanan, T. (1997): Multidimensionality of representation: NV complex predicates in Hindi, in: Alsina et al. (eds.), 431-471.
- Mosel, U. & Hovdhaugen, E. (1992): *Samoan reference grammar*. Oslo: Scandinavian University Press.
- Nichols, J. (1975); Ingush transitivity and detransitivization, in: *Proceedings of the Meetings of the Berkeley Linguistics Society* 8, 445-462.
- Nilsson, B. (1986); Object incorporation in Turkish, in: Aksu Koç, O. & Erguvanlı Taylan, E. (eds.). *Proceedings of the Turkish Linguistics Conference*. Istanbul: Bogaziçi University Publications No. 400,113-128.
- Omar, F F. (1992); *Kurdisch-Deutsches Wörterbuch (Kurmançî)*. Berlin: Verlag für Wissenschaft und Bildung.
- Paul, L. (1998): *Zazaki. Grammatik und Versuch einer Dialektologie*. Wiesbaden; Reichert.
- Ramm, I. (2000): *Passiv im Kurmançi-Dialekt des Kurdischen*. MA-thesis. University of Kiel.
- Ritter, H. (1971): Kurmânçi-Texte aus dem TCr'abdîn, in; *Oriens* 21-22,1-135.
- Rizgar, B. (1993); *Kurdish-English, English-Kurdish dictionary*. London: M. E Onen.
- Rosen, C. (1997): Auxiliation and serialization; On discerning the difference, in: Alsina et al. (eds.), 175-202.
- Rosen, S.(1989): Two types of noun incorporation: a lexical analysis, in; *Language* 65, 294-317

- Schultzeberndt, E. (2000); *Simple and complex verbs in Jaminjung. A study of event categorisation in an Australian language*. Nijmegen; Max Planck Institute for Psycholinguistics.
- Sheintuch, G. (1976): Periphrastic verb formation in Persian - a dynamic process, in: Christie, W. (eds.). *Current progress in historical linguistics. Proceedings of the Second International Conference on Historical Linguistics, Tucson, Arizona, 12-16 January 1976*. Amsterdam: North Holland, 137-146.
- Shibatani, M. (1973): Semantics of Japanese causativization, in: *Foundations of Language* 9. 327-373.
- Skutnabb-Kangas, T. & Bucak, S. (1995): Killing a mother tongue - how the Kurds are deprived of linguistic human rights, in: Skutnabb-Kangas, T. A Philipson, R. (eds). *Linguistic human rights: Overcoming linguistic discrimination*. Berlin: Mouton, 347-370.
- Steever, S. (1998): Kannada, in: Steever, S. (eds.). *The Dravidian languages*. London: Routledge, 129-157
- Telegdi, Z. (1955): Beiträge zur historischen Grammatik des Neupersischen. 1. Über die Partikelkomposition im Neupersischen, in: *Acta Linguistica Academiae Scientiarum Hungaricae* 5, 67-183.
- Veenstra, T. (2000): Verb serialization and object position, in: *Linguistics* 38.5.867-888.
- Watkins, C. (1964): Preliminaries to the reconstruction of Indo-European sentence structure, in: Lunt, H. (ed.). *Proceedings of the Ninth International Congress of Linguists. Cambridge, Mass., Aug. 27-31*. The Hague: Mouton, 1035-1045.
- Windfuhr, G. (1979): *Persian grammar History and state of its study*. The Hague: Mouton.

Pêvek: Çavkaniyên nimûneyan

Kurtebêje	Çavkanî
Mey	Bozarslan, M. Emîn. <i>Meyro</i> . Çîrok. Borâs (Sweden): Invandrarförlaget, bêdîrok [berhevoka kurteçîrokên kurdî]
Gir	Cewerî, Firat. 1986. <i>Girtî</i> . Sweden. [berhevoka kurteçîrokan]
Aw	<i>Azadiya Welat</i> [rojnameya kurdî ya heftane]
ŞK	Şemo, Ereb. 1977. <i>Şivanê kurd</i> . Istanbul: Özgürlük [romana otobîyografik]
CTV	CTV [malperên nûçeyan yên li ser înternetê weşandî]
Uzun	Uzun, Mehmed. 1991. <i>Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê</i> . Stockholm: Weşanên Welat. [roman]
Mûş	Transkrîpsiyona vegêranên suhbetî yên ji herêma Mûşê

PAŞEROJA ZIMANÊ KURDÎ*

Michael L. Chyet**

Kurte

Ev nivîs di prosesa standardkirina kurdi da li ser perspektîfa nêzîkkirina du zaravayên kurdi, soranî û kurmancî disekine. Bi berawirdkirina her du zaravayan û tesbîtîkirina hevbeşiyên çî morfolojîk çî jî leksîkal, formên hevbeş dikarin bîn bijartin û bi bikaranîna van formên hevbeş jî stratejîyeka ku hem zaravayan nêzîkî hev dike û hem jî tesîrê li hişmendîya neteweyî dike, dikare bê bidestxistin. Dema ku ev neyê kirin û zaravayek li ser zaravayekê bê ferzkirin jî dijberîya cudaker pêk tê û fêmîkirin û rêzgirtina dualî kêmtir dibe. Ji bo nêzîkkirina van du zaravayan, rêbazeka nû ku jî berawirdkirina her duyan pêk tê, hatîye pêşniyarkirin û ev yek bi mînanan hatîye ravekirin.

Peyvên sereke: Soranî, kurmancî, standardkirin, taybetmendiyên morfolojîk, pîrfîrmî.

| 249

THE FUTURE OF KURDISH LANGUAGE

Abstract

This article proposes a method for bringing the two most widely spoken Kurdish dialects, Kurmanji and Sorani, closer together, as part of the process of standardization, and this is illustrated with examples. Through the comparison of the two dialects, both morphological and lexical features can be identified. Often one dialect exhibits multiformity while the other has a single form. Notwithstanding an important exception to this method (the past participle), in general, by selecting one of the multiple forms that is closest to the other dialect's single form, the dialects can be brought closer together. This is proposed as part of an educational system designed to engender mutual respect, by teaching all Kurdish children both Kurmanji and Sorani, and in both the Latin and Arabic orthographies for Kurdish.

Keywords: Sorani, Kurmanci, Standardization, morphological features, multiformity

* Ev nivîs berê bi îngilîzî, di vir da û bi vî navî hatibû çapkirin: "The Future of the Kurdish Language: an Egalitarian Scenario," in: Joyce Blau: *L'éternelle chez les kurdes* (Paris: Institut Kurde de Paris, 2013), 169-179.

** Washington Library, US E-mail: mooklash@yahoo.com

Destpêk¹

*Seretay îş hemû yekbûn e, ewîş nabê heta her birinê ke le diî da bê sarêji nekey
(Yekbûn destpêka hemû karan e, ew jî nabe heta tu her birina dilê xwe sax neki)
Şukrî Fezî*

Her tim ji min dipirsin bê gelo kurmancî yan jî soranî bê hîlbijartin yan têkelek ji her duyan bê çêkirin. Mesele zelal e û vebijêrkeka (alternatîf) sêyem heye: Divê wekhev li kurmancî û soranîyê bê nêrin.

Ez diêşim gava dibînim ku kurd yên ku zimanên din dizanin hînî rênivîsa kurdî, bi tîpên latînî yan yên erebî, nebûne. Ez dihizirim ku divê hemû zarokên kurdan fêrî van bèn kirin weku xezîneyeka neteweyî û parçeyek ji nasnameya wan a kurdî. Ez gelekî kêfxweş bûm gava min berî çend salan dît ku Kurdsat, kanala tv'yê ya YNKê, rênivîsa latînî (bi ç û ş jî!) di weşanên xwe da bi kar tîne. Divê hêza televîzyonê di nasandina tiştên ku ji xelkî ra di esil da bîyanî ne, kêm neyê dîtin.

Ez hizra sistemeka perwerdeyê dikim ya ku tê da hemû zarokên kurdan, li seranserê Kurdistanê, wekhev hînî kurmancîyê (bi rênivîsa latînî û erebî) û soranîyê (bi rênivîsa erebî û latînî) bèn kirin. Alfabekeya sêyem jî heye ku kîrîlî (alfabeya “rûsî”) ye û li welatên Sovîyeta berê dihat bikaranîn. Ew îro hêdi hêdi bi alfabekeya latînî tê guhartin. Bala xwe bidinê ku ez peyva “rênivîs” lê ne “alfabe”yê bi kar tînim. Hemberbûnêka yekbiyek, di navbera rênivîsên latînî, erebî û kîrîlî da heye û her sê, baş bi kêrî kurmancî û soranîyê jî tînin. Divê ez bibêjim ku alfabekeya êzdî ya kêmnaskirî jî heye.²

Bernameya perwerdeya kurdî ya ku ez hizir dikim dê beşek ji proseseka mezintir be ya ku bi giştî tehemila dualî û qebûlkirina cudayîyê peyda dike. Divê rêzgirtina dualî ya zaravayên hev, hezkirina jidil û zanîna zaravayên din bê çawa ji ya me cuda ye, beşeka bîngêhîn a vê bernameyê be. Bila em li dû gavên Hejarî (Ebdilrehman Şerefkendî; 1921-1991), helbestvanê soranî ji Mukrîyanê li Kurdistana Îranê, biçin. Wî bi xebata xwe, çapên giring yên berhemên helbestvanên klasîk ên kurmanc, Feqîyê Teyran (teqrîben 1590-teqrîben 1660), Melayê Cizîrî (1570-1640) û Ehmedê Xanî (sedsala 17ê) derxistine.

1 Ez vê nivîsa xwe, diyariyî hevalê xwe yê nemir Birûsk Tuganî dikim.

2 Bin. <http://www.loc.gov/catdir/cps0/romanization/kurdish.pdf>

Bifikire, nifşekî ciwanan ku hem kurmançî û hem soranîyê baş bizane! Hewce bi têkeleka ji her duyan qet tune ye. Ev yek bi siruştî peyda dibe, bêyî maytêkirina (midaxele) sîyasetvanên ku di meseleyên zimannasî da ne pispor in. Mirov dikare bibîne ku ew niha jî çê dibe. Bo nimûne, peyvên soranî yên weku “çapemenî” û “derbirîn” niha di kurmançîyê da bi kar tên. Ev heta berî 1980yan jî nebû. Bi heman awayî, peyvên kurmançî “heval”, “dever” û “bizav” - ku her sê bi “v” ne - niha di soranîyê da tên bikaranîn. Dîrokê, her du zarava gihandine hev. Bi xêra televîzyon û radyoyên kurdî û înternetê, niha rûbirûbûneka berdewam heye ji bo zarava û peyvên ku ji hin komên mezin yên xelkî ra berî niha nenas bûn.

Di pêvajoya 16 salan da ku min tê da çapa pêşîn ya ferhenga xwe ya kurmançî-îngilîzî amade dikir, xuya bû ku ziman di guhartinê da ye. Dema min di sala 1986an da dest bi wê kir, cudabûneka aşkera di navbera kurmançî û soranîyê da hebû. Ber bi dawîyê ve, nêzîkî sala 2000î, diwarên ku di navbera her du zaravayan da hebûn teniktir dibûn. Di dawîyê da, min dît pêdivî ye ku ez wan peyvên ku kurmançîxêv bi kar tînin û deh sal pêştir ji wan ra xerîb bûn, biximê.

Dîtina kurmançî û soranîyê bi çavê ku ew şîrikên wekhev in, ne tenê meseleyeka zimani ye, lê ya civakî ye jî. Brîtanayîyan di dema desthilatdarîyê da li Îraqê (1921-1932) îsrar kir ku tenê zaravayê soranî li xwendingehên kurdî bê xwendin. Vê yekê nerazîbûneka berçav di nav kurmançîxêvan da peyda kir. Hilbijartina zaravayekî li ser hesabê zaravayekî din, bi gotineka din sepandina zaravayekî li ser xelkekî ku bi zaravayekî din diaxive, misoger cudabûnê peyda dike. Hişyarîya li hember hewlên parçekirina kurdan, handereka giring e ji bo ku hiseka hevqirtina neteweyî, li her derê di nav zarokên kurdan da bê çêkirin. Mijara zimani dikare di destên şaş da çêkeka gelekî xeter, alaveka parçekirinê be.

Hin kesan ji bo çareserkirina pirawayîya kurdîyê erebî yan almanî weku pîvan pêşniyar kirine. Hem erebî û hem almanîyê awayên xwe yên nivîsînê yên standardkirî - “fusha” ji bo erebî û “Hochdeutsch” (almaniya bilind) - hene. Bersiva min: pêwendîya vê senaryoyê bi kurdîyê ve gelekî kêmtir e. Zimanê almanî yê standard bi xêra stîlistên weku Martin Luther (1483-1546) û Johann Wolfgang von Goethe (1749-1832) û herweha asta xwendin û perwerdeyê, ku gelekî cuda bû ji ya ku li Kurdistanê hebû, serkeftî belav bû.

Her ziman xwedî dîrok û wargeha xwe ya taybetî ye û rewşa zimanê 'erebî bi kêrî wargeha kurdî nayê. Zimanê Quranê rûmeteka taybetî ku mînaka wê di kurdîyê da yan - di vê mijarê da - di tu zimanekî din da tune ye, daye zimanê 'erebî yê nivîskî. Herçiqas awayê devkî yê hemû zimanan heta dereceyekê ji awayê nivîskî cuda ye, 'erebî ji piraniya zimanên din berçavtir vê dîglosiyê - di yûnanîyê da maneya "du formên zimanekî" - nîşan dide. Weku qaîde, hemû 'erebên xwenda dizanin "fusha" yê - standarda nivîsinê ya ku bi giştî ji Mexribê heta Îraqê 'eynî tişt e - bixwînin û binivîsin. Herweha, her kes ji bo mebestên danûstandinên devkî bi devoka xwe ya herêmi diaxive. Piraniya xelkî baş dizanin ka kîjan "fusha" û kîjan ne "fusha" ye.

Rewşa dîglosî ya zimanê 'erebî dikare bi awayekî din ji bo kurdîaxêvan modeleka bisûd be. Awayekî standard yê kurmançiyê her ji niha ve di prosesa sazûnê da ye, herçend her kes li ser ka divê çî bikeve û çî nekeve zimanê standard, ne lihev be jî. Soranîya nivîskî, ya ku li ser bîngeha devoka Silêmanîyê ava bûye, di rêya standardkirinê da bi hin guncandinan - li jêrê binêre - gelekî li pêştir e. Sîstemeka perwerdeyê ya kurdî dê alîkariya kurdîaxêvan bike ku ew hêsantir formên ferhengî û rêzimanî yên zimanê standard - çî ew kurmançî û çî soranî be - ji yên devoka xwe cuda bikin.

252 | Ji bo wan, yên ku hêj israrê dikin ku divê zimanekî têkel bi terkîbkirina kurmançî û soranîyê di tevlihevîyekê da bê afirandin, bala xwe bidin evên jêr:

1) Navdêrên kurmançî xwedî du zayend (nêr û mê) û du halan (xwerû û tewandî) ne. Soranîya Silêmanî û Kerkûkê ne xwedî zayend ne ji hal e; lê hin şopên zayend û halî di soranîya Hewlêr û Mukrîyanê da hene.

2) Her yek ji van du zaravayan forma pasîvê ya karê bi awayekî cuda çê dike. Bo nimûne, mirov bi kurmançî bi bikaranîna kara alîkar "hat" û radera "dîtin"ê dibêje "Kur hat dîtin". Di soranîyê da, mirov bi paşgira pasîf "-ra" yê û reha dema niha "-bîn" -ê çê dike û dibêje: "Kureke bîn(d)ra".

3) Bi ser da jî, nasyariya morfolojîk weku "the" ya îngilîzî - di kurmançiyê da tune ye; lê di soranîyê da ji bo yekhejmarîyê "-eke" û ji bo pirhejmarîyê "-ekan" hene ku li bêjeyan zêde dibin.

4) Dîgel ku kurmançî xwedî du desteyên cihnavên kesî, yên halê xwerû (ez, tu, ew, em, hûn û ew) û yên halê tewandî (min, te, wî [nêr]/wê [mê], me, we û wan) ye, soranî xwedî desteyeka cihnavên xweser (min, tu, ew, ême, êwe û ewan) û desteyeka paşnûsekên cihnavî (-[i]m, -[i]t, -î/-y, -man, -tan û -yan) e.

5) Kurmancî xwedî dema bê (ayinde) ya serbixwe ye (bo nimûne, *ez ê bibînim*) û ew ji dema niha (bo nimûne, *ez dibînim*) cuda ye. Lê belê di soranî da dema niha (bo nimûne, [*min*] *debînim*) hem ji bo dema niha hem jî dema bê tê bikaranîn.

Kijan ji van formên cuda dê ji bo vî zimanê têkel bê hîlbijartin? Ez weku mamosta ku xwedî tecribeya gelek salan im, di fêrkirina kurmancî û soranîyê da dikarim, bibêjim ku ev hewl dê zêdetir arêşeyan peyda bike ji dêvla ku çareser bike. Ew dê bibe gêlmeka gavanî ya rêşaşker û qedexeker. Sernekeftin dawîya wê ye.

Çend zimanên cotstandard hene, ji wan weku mînak norwecî (bokmâl û nynorsk), albanî (geg û tosk) û ermenî (rojhilatî û rojavayî). Rewşên serbo-xirwat (bosnî jî tê da) û hindî-ûrdûyan ji bo berawirdkirinê hêj minasibtir in, ji ber ku her yek bi du alfabeyan tê nivîsîn ku berawirdî di navbera wan da yekbiyek e. Îca, miamelekirina kurmancî û soranîyê weku du şirikên wekhev, ne rewşeka kurdî ya bêhempa ye û pirawayîya wiha li cihên din jî tê dîtin.

Herçend ez ne piştgirê terkîbkirina kurmancî û soranîyê di yek zimanê têkel da me, hin rê hene ku bi wan her du zarava bî nêzîkkirin. Ev dikare ji bo qisekerên zikmakî û yên bîyanî weku pirseka perwerdeyî di fêrkirina kurdîyê da bê dîtin. Gelek caran diqewime ku di kurmancîyê da bo filan peyvê cihêrengî yan pirteşeyî heye, lê di soranîyê da bi tenê şiklek yan têşeyek heye; yan berevajî, di soranîyê da pirteşeyî heye, lê di kurmancîyê da her yek şikil heye. Di rewşên wisa da, metodolojîya ku ez pêşniyar dikim ev e: ji bona ‘eyarkirin yan nêzîkkirina her du zaravayan, di zaravayê pirteşeyî da, da ku teşeyekê vebijêrin, divêt ku em li zaravayê yekteşeyî binêrin. Pîrî caran, gava ku em wisa dikin, ev kiryar rê xweş dike ku em biryarê bidin bê em dê kîjan peyv yan teşeyê bibijêrin.

Ka em bi nimûneyekê ji warê peyvsazîyê dest pê bikin. Pêşgira “**di-**”yê, bo nimûne “**di-bînim**” û “**di-froşim**”, nîşana raweya xeberî (indicative) ya dema niha ya karên kurmancî ye. Cihêrengî di hembera wê ya soranî da heye. Ji bo vê rewşê li Mukrîyan (Îran) û Hewlêrê (Îraq) pêşgira “**de-**”yê tê bikaranîn, bo nimûne, “**de-bînim**” û “**de-froşim**”. Lê, li Silêmanî û Kerkûkê (Îraq) û Sineyê (Senendec, Îran) pêşgira “**e-**”yê tê bikaranîn, bo nimûne, “**e-bînim**” û “**e-froşim**”.

Di van 20 salên bihurî da, meyla soranîya nivîskî, heta di nav nivîskarên Silêmanîyê da ku devoka wan weku bîngeha soranîya nivîskî ye jî, ji forma bi “**e-**”yê bêtir forma bi “**de-**”yê tê bikaranîn. Ji ber ku soranîyê meyla xwe zêdetir ji “**e-**” daye ser “**de-**”yê, têgihîştina dualî di navbera her du zaravayan da çêtir bûye.

Ka em di warê ferhengê da, li peyvên kurdî ji bo alava malînê binêrin. Peyva “gesik” yan “gîsik” di soranîyê da têra xwe belav e. Gelek guhartoyên herêmî û deynkirinên ji erebî (“melkes” ji “miknese” ya erebî), aramî (“kinoşe”), ermenî (“avlêk”, herweha “siq-avêl” - alavê malînê yê mezin ji bo maliştina kadînê - ji “avel” ya ermenî) û herweha yên din weku “bermalk”, “şicing”, “sivnik”, “sîzik”, “cerîvk”, “sirge” û “gêzi” (Zîlan 1989: 128 [kvast]; Chyet 2003) di kurmançiyê da hene. Bê şik, dewlemendiya dîroka kurdî di cudayiyên ferhengî yên weha da dîyar dibe. Tevî wê jî, karê bijartina peyvekê ji nav vê mişehîya peyvan, coşarker xuya ye. Ma bi rastî weha ye? Ma formeka kurmançî naşibe “gesik” a soranî? Di rastiyê da, yek heye, “gêzi”. “Gêzi” ya kurmançî û “gesik” a soranî aşkera hevreh in. Zêdebarî vê yekê jî, bi kirmanckî (zazakî) “gezi” ye, û bi hewramî (goranî) jî “gizi” ye. Ez dikarim îdiayê bikim ku gava di kurmançiyê da “gêzi” weku têgiha standard ji bo “alavê malînê” bê destnîşankirin, ku berginda wê ya nêzik di soranîyê da heye, fêmkirina dualî dê hebe.

Ka em nimûneyeka din bidin û di kurdîyê da ku li hembera peyva îngilîzî “to say”ê binêrin. Radera wê di kurmançiyê da “gotin” e. Formên cuda yên vê raderê di soranîyê da hene: “wutin”/“witin” li Silêmanî û Kerkûkê, “kutin” li Mukrîyanê û “gotin” li Hewlêrê. Bi hîlbijartina “gotin”ê weku forma standard yan nivîskî, em gaveka biçûk ber bi nêzikkirina kurmançî û soranîyê ve diavêjin. Devokên herêmî nîşanên zimanê zindî ne. Heger pêşniyara min bê qebûlkin, ez dê xelkê Silêmanî û Kerkûkê han bidim ku li ser bikaranîna “wutin”/“witin” û yên Mukrîyanê ku li ser gotina “kutin”ê di zimanê xwe yê devkî da bidomin. Lê, ez dê ji bo axaftina resmî û nivîsînê bikaranîna forma “gotin”ê pêşniyar bikim. Heman tişt ji bo peyvên “alava malînê” jî derbasdar e: Ez piştgirîya avêtina peyvên devokî “bermalk”, “avlêk”, “melkes” û hwd. nakim. Ez hêvîdar dibim ku xelk wan bi berdewamî di herêmên xwe da bi kar binin, wan dewrî nîşên paştir bikin lê peyva standard “gêzi” jî bizanin. Ev rewş nêzikî rewşa dîglosiya erebîyê ya navborî dibe ku her kes bi devokeka herêmî diaxive, lê zimanê nivîsînê yê standard ji Mexribê heta Hilala Bibereket (Fertile Crescent) - yan di meseleya kurmançiyê da ji Semsûrê heta Sersingê - bi heman awayî ye.

Di her sê nimûneyên heta niha da, zaravayek cudayîyeka kêr nîşan dide, lê cudayîya zêde di zaravayê din da heye. Ez bi sehkirina her du zaravayan bi hev ra metodekê ji bo vavartina formên ku dê her du zaravayan nêzikî hev bikin - berjenga standardkirinê - pêşniyar dikim. Ev e ya ku me minaqeşe kirîye:

Kurmancî

- dibînim
- gêzî (avlêk, bermalk, cerîvk, kînoşe, melkes, hwd.)
- gotin

Soranî

- debînim (ebînim)
- gesik (gisik)
- gotin (wutin/witin, kutin)

Nimûneya din, ku ew jî ji warê peyvsazîyê ye, dê diyar bike ku hîlbijartina formekê ji nav gelek forman ya ku digel formeka ketîye zaravaya din li hev dike, her car ne ewqas hêsan e. Ka em bala xwe bidin partisîpa dema bihurî. Em di kurmancîyê da partisîpa dema borî ji raderê - bo nimûne “dîtin”, “dan” - çê dikin bi rêya avêtina paşgira “-(i)n” ya dawîyê - “dît-”, “da-” - û guherîna wê bi “-î” ji bo rehên nedengdêr - “dîtî” - û “-yî” (behdînî “-y”) ji bo rehên ku bi dengdêrekê xelas dibin - “dayî”.

Sê awayên herêmî di soranîyê da hene (MacKenzie 1961-62: v. 1, r. 97, §213). Li Hewlêr û Rewandîzê, nêzikî sinorê di navbera zaravayên kurmancî û soranî da, partisîpa dema borî weku ya kurmancî tê sazîkirin; “dîtin” → “dîtî”, “dan” → “day”. Li Silêmanî, Kerkûk û Mukrîyanê, paşgira dawîyê ya paş dengnedêrê “-û” (yan “-uw”) û ya paş dengdêrê “-w” ye; “dîtû”, “daw”. Li Sine û Warmawayê, paşgira dawîyê ya paş dengnedêrê “-îğ” û ya paş dengdêrê “-ğ” ye; “dîtîğ”, “dağ”.

Her sê awa ev in:

<u>Hewlêr</u>	<u>Sil. Muk.</u>	<u>Sine</u>
dîtî	dîtû	dîtîğ
day	daw	dağ

Forma “-îğ” ber bi kurmancîya jêrîn yan kirmanşanîyê yan kelhûrî ve diçe (Fattah 2000:386) û li derveyî wan deveran zêde nayê nasîn. Piranîya rewşenbîrên soranîaxêv forma “-î”yê bi formeka paşkeftî dibînin. Sepandina wê li ser awayê nivîsînê ya adetî û cihgirtî, ku formên “dîtû” û “daw” wê dinimînin, dikare temamen wê dijberîya cudaker peyda bike ya ku em hewl didin xwe jê dûr bixin. Devoka Hewlêrê û devoka Mukrîyanê li ser gelek xalan li hev dikin. Her du, raweya xeberî ya dema niha bi pêşgira “de-”yê lê ne bi “e-”yê çê dikin, her du, halên tewangê û du zayendên navdêran diparêzin û her du bê cihnavana nîşanê “em”ê ne û tenê “ew”ê bi kar tînin. Lê, Mukrîyan di mijara partisîpa bi formên “-û” û “-w”yan da digel Silêmanî û Kerkûkê hevbeş e. Ev herêm li ser hev piranîya soranîaxêvan himbêz

dikin û herweha standarda nivîsînê ya cihgirtî ya ku niha tê bikaranîn dinimîn. Divê tiştê ku cihê xwe girtiye neyê piştguhxistin yan jî weku em îngilîz dibêjin: If it isn't broken, don't fix it! (Serê neêşe ne hewceyî destmalê ye)

Gava eslê reha dema borî ji yê forma raderê cuda be, hingê forma me bi “forma temamker” (suppletive form) tê binavkirin. Bo nimûne, ka em berê xwe bidin kara “dîtin”ê. Dema niha di kurmancî û soranîyê da ji reha temamker “bîn-”ê çê dibe: “dibînim” (kurmancî) û “debînim” (soranî). “Bînîn” weku rader digel “dîtin”ê di gelek devokên soranî da tê bihistin. Aşkera ye ku divê “dîtin” weku awayê standard bê bijartin çunkî ew di her du zaravayan da heye û ji ber ku “bînîn” di kurmancîyê da nayê bikaranîn. Herwisa, bi kirmanckî rader “dîyayene” ye, û reha dema niho “vîn-” e (vîn-eno = Ew dibîne); bi hewramî/goranî jî, rader “diay” e û reha dema niho “wîn-” e.

“Gotin” kareka din ya xwedî forma temamker e. Mirov çend awayên cuda di kurmancîyê da dibîne: (ez) dibêjim, divêjim, diwêjim, dibêm, divêm, diwêm, dêjim. Forma “dibêjim” her ji niha weku awayê standard hatiye hilibijartin. Îca, ne pêwîst e ku em xwe bi hilibijartina yekê ve mijûl bikin.ⁱⁱⁱ Forma soranî li Silêmanî, Kerkûk û Mukrîyanê “delêm” e. Hewlêrî weku adet “-l-“ dike “-r-“ û “derêm” forma “delêm”ê ya çaverêkirî ye. Awayê li Sine “êjim” e - dibe ku ji “e-[w]êj-im”ê be. Forma “bêj”- bi xwe di soranîyê da bi tenê di forma subjunktîf (dananî) ya devoka Sineyî da heye (îndikatîf: “êjim”; subjunktîf “[gerek-m-e] b-êjim”). Hem di kurmancî hem jî di soranîyê da, navdêr hene ku bi bikaranîna “-bêj”ê hatine çêkirin. Ya/ yê ku stran dibêje di kurmancîyê da “stran-bêj” û di soranîyê da “goranî-bêj” e. Herweha, vegêra/ê çirokên evîndariyê weku *Mem û Zînê* û *Xec û Sîyabendî* “deng-bêj” e. Îca, dema niho ya standard a “gotin”ê di kurmancîyê da “dibêjim” lê di soranîyê da “delêm” e. Ez bi guman im ku mirov karibe forma *debêjim li ser soranîyê ferz bike. Divê em qîma xwe bi bikaranîna “-bêj”ê bînin di peyvên weku “goranî-bêj”ê û hwd da.

Ez hêvîdar im ku min bi van mînakên kurt nimûneyek ji çawanîya standardkirina zimanekî dabe we. Divê çend faktor li ber çav bînin wergirtin: agahiyên zimanî yên hejmareka berfireh a devokan, zanyariyên civakî-zimanî û herweha hêvîkirineka rastbîn ka kîjan form dê ji bo bikarhînerên armanckirî qebûlbar bin. Dilê min geş dibe gava ez di dema vê nivîsê da dibînim ku çiqas kar her ji niha bi pêş ve diçe. Hilibijartina “debînim” ne “ebînim” di soranîyê da û

“dibêjim” lê ne “dibêm” yan “divêjim” di kurmançiyê da û hwd mînakên çirûskdar in ji proseseka ku niha bi rêya xwe da dimeşe.

Min zimanên kêmanîyan ên li Kurdistanê - kirmanckî li hin beşên Kurdistanê Tirkîyeyê, goranî/hewramî li hin beşên Kurdistanê Îraq û Îranê, sûrî û torî (devokên aramîya nû (sûryanî) ya filehên Kurdistanê û tirkmenî li devera Kerkûkê - ji bîr nekirine. Sîstemeka perwerdeyê ya wekhevîxwaz dê perwerdeya bi van zimanên kêmanîyan di asta herêmî da ji berdest bike.

Encam

Weku encam dixwazim bibêjim di prosesa standardkirinê da, ji dêvla ku em formeka cuda ya zaravayekê li ser zaravayekê ferz bikin ku ev yek wê dijberîya cudaker bi xwe ra bîne, divê em hevbeşiyên wan derxînin pêş û wan bi kar bînin. Ev tişt bi perwerde, televîzyon û hwd dikare bê kirin ku dê tesîrê li hişmendîya neteweyî jî bike. Piştguhavêtina rastîya ku zimanê kurdî ji cewhera xwe, zimanekî pirzaravayî ye, dê şaşiyeka taktîkî be. Ez gelek bi micidî pêşniyar dikim ku kes bi wê rêyê da neçe. Ji ber ku sepandina zaravayekî li ser xelkekî ku bi zaravayekî din diaxive, dê miheqeq cudabûnê çê bike. Hişyariya li hember hewlên parçekirina kurdan, handereka giring e ji bo ku hiseka hevgirtina neteweyî, li her derê di zarokên kurdan da bê çêkirin. Mijara zimanî dikare di destên şaş da çekeka gelekî xeter, alaveka parçekirinê be. Ji dêvla vê, divê rêzgirtina dualî ya hemû zaravayan û hezkirina jidil hebe. Ez li şûna afirandina zimanekî têkel yan sepandina zaravayekî, hînkirina her du zaravayan (di her du alfabeyan da) û baldarîkirina li ser standardkirina wan tewsiye dikim. Jixwe qebûlîkirina rewşa ku niha heye jî her ev e.

Çavkanî

Chyet, M. L. (2003). *Kurdish - English dictionary (Fehenga Kurmancî-Inglizî)*. New Haven: Yale University Press.

Fattah, I. K. (2000). *Les dialectes kurdes méridionaux: étude linguistique et dialect[o]logique*. Leuven : Peeter.

MacKenzie, D. N. (1961-62). *Kurdish Dialect Studies*, London: Oxford University Press, 2 vols.

Zilan, R. (1989). *Svensk - Kurdiskt Lexikon (Nordkurdiska) (Fehenga Swêdî - Kurdî, Kurmancî)*. Stockholm: Statens Institut för Läromedel.v

-
- i Min cedwelek ku berawirdîya van sê rênivîsan diyar dike ji bo Kitêbxaneyê Kongresê (Library of Congressê) resim kirîye: <http://www.loc.gov/catdir/cpsd/romanization/kurdish.pdf>. Cedweleka mîna wê di fehenga min da heye (Chyet, 2003: r. xxxix-xl).
 - ii Peyivên din ku ji devereke heta devereke din cuda ne ev in: kiyark (gidark; kari; karkevîk; kufkarik; k'umik) - bi tirkî "mantar"; tevnpîrk (dapîroşk; pêrtêvink; p'indepîr; pîr; pîr hevok; pîrik) - bi tirkî "örümcek"; û barçimok/balçimk/pîrçemek (çekçekile; çil; şevrevînk; şevşevok) - bi tirkî "yarasa".
 - iii "vajanâ (vaj-)" ya kirmanckî ji heman rehê, ya ku hevrehê "vox", "voci" (deng) ya latîni ye ye.

NASANDINA PIRTÛKAN

| 259

Zilan, B. (2023). Kitabê “Deyîranê Qerebegan û Sîwanî Ser o”.

Folklor û Ziman. 3(2), 261-266

ORCID: 0000-0001-6275-5829

KITABÊ “DEYÎRANÊ QEREBEGAN Û SÎWANÎ SER O”

Bîlal Zîlan*

Kitabê *Deyîranê Qerebegan û Sîwanî Ser o* hetê Îdrîs Yazarî ra ameyo nuştene û 2020 de Weşanxaneyê Vateyî ra vejîyayo. 320 rîpelî yo. Kitab hetê mamosta Mehemed Malmîsanijî ra redakte bîyo.

Nuştoxê kitabî Îdrîs Yazar, Qerebegan ra dewa Bircik ra yo. Cora nê mintiqayan hewl zano. Îdrîs Yazarî serra 2011 de dest bi nuştîşê kirdkî kerdo. Nuştêyê eyê verênî rojnameyê Newepel û kovara Şewçîla de vejîyayê. Bêxeyja nê kitabî di kitabê eyê bînî zî estê ke weşanxaneyê Roşna ra vejîyayê. Nînan ra yew kitabê şîiran “Destê Zemanî” yo, o bîn zî “Cimê Aşîkan ra Hewt Hikayeyê Gelêrî” (2018) yo ke xebata arêdayîşî ya. No tecrubeyê eyê arêdayîşî kitabê deyîran de zî xo bi serkewte nawito.

Qerebegan, mintiqaya Mîyaranî (Arıcak) ra vajîyeno. Na mintîqa rojhelatê başûrê Xarpêtî de sînorê Dîyarbekirî (Hêni-Pîran) û Çewlîg (Dara Hêni-Sîwan) de ya. Verê cû girêdayeyê Palî (Xarpêt) bî la 1987 de Mîyaran bi qezaya Xarpêtî. Mintiqaya Qerebeganî 19 dewan û 10 mezrayan ra pêyena.

Sîwan zî rojawanê Dara Hêni de yew mintiqaya ke sînorê Dîyarbekir (Hêni) û Xarpêtî (Mîyaran) de ca gêno. Merkezê Sîwanî dewa Serbê ya ke zafane Sîwan seba na dewe vajîyeno. Na mintîqa zî verê cu pabesteyê Pali bîy labelê badê Komara Tirkîya Çewlîg ra girêdiyaye. 33 dewî û 86 mezreyê Sîwanî estê.

Sîwan û Qerebegan di mintiqayê cîran ê. Nê her di mintiqeyî zî seranser bi kirdkî (zazakî) qalî kenê. Xora nê mintiqeyî mîyanê Kirdaneyî de hesebîyenê. Nê serranê peyênan nê mintiqayan de tayê xebatê arêdayîşî virazîyayî û sey kitabî

* Vekolê Serbixwe, Parêzer. Amed/Tirkîye E-mail: bilalzilan@hotmail.com



çap biy. Ma cêr ra nînan ra yewe danê şinasnayene. Kitabê *Deyîranê Qerebegan û Sîwanî Ser o*, seke nameyê ci ra zî fam beno kitabê deyîran o. Nê deyîri pêro kasetanê (bandanê) deyîrbazanê mintiqaya Qerebegan û Sîwanî ra arêdiyayê. Nuştoxî mintiqaya Sîwanî ra kasetê Mih Ehmedê Huseynî (1950-2014), Mih Zelekî (1950-2008), Elî Sabrî Dîlûnî; Qerebegan ra zî yê Wisê Cimî (b. 1945) û Sofî Ehmedê Dêsmînî (1937-2016) peyda kerdê. Labelê nê deyîri fekê sewbîna deyîrbazan ra zî arê dayî û hem zî varyantê ke YouTube ser o estê înan de zî dayê têver. Înan ra nameyê nê deyîrbazan vejîyeno vernî: Elî Hafîzo Muhyonij (Elîyê

Mehmedê Zur, b. 1945), Erdem Haykiran, Mela Xelîl Îbrahîm Sever, Mih Zelek (Mehmed Sîddîk Beliren), Xet Aşîkon (1938-2020), Ehm Safûyo Mihyonij (mîyanê kasetê Sofî Ehmedê Dêsmînî de). Mavajî, Deyîra Mîsfay Kuçûn fekê Nac Erebi, Îsmâil Aydin û Ehm' Melekaniyî ra bi hîrê varyantan nusîyaya; deyîra Mihê Qasûnî de ma varyantê Mehmet Moray û Mehmed Herîdonijî zî wanenê; deyîra Dayê Gidîyûno de varyantê Sal Mih Nebû zî esta. Deyîra zerence fekê deyîrbazanê çîya çîyayan ra bi çar varyantan nusîyaya. No hawa hetê varyantan ra yew dewlemendî vejîyaya orte.

Bi na xebata folklorîke hem deyîri vindîbiyayîş ra ameyî xelisnayene, hem zî kultur û kamîya şarê ma dewrê nesla newe bîyo, hem zî dewlemendîya ziwanê ma ameya pawitene. Îdrîs Yazarî destpêkê kitabî de ehemîyetê xebata arêdayîşî ser o wina nuşto:

“Folklor seba heme mîletan kerraya bîngeyên a. Eke a kerra çayê xo şedeynaye nêbo, ser o çîyêk zî awan nêbeno. Mîletê ke serdest ê heme çîyê înan bi ûsul qeyd û tesnîf bîyo. La seba mîletanê bindestan ma nêşkenê eynî çîyî vajî. Bi taybetî seba mîletê ke hem bindest û hem zî heme çîyê înan qedexe bîyo, payramendişê înan, neqilbiyayîşê kulturê înan zehmetêko pîl o. Eke dest nêerzîyo ci, verba zemanî vindî beno şino. Bi nê şîûrî 2013 de mi dest bi xebata deyîranê ma û 2014 de zî meseleyanê

Cimê Aşikan kerdbî. Hetêk ra ez kasetanê Cimê Aşikan ser o xebitîyayêne hetêk ra zî mi kasetê verên yê deyîran sax kerdêne. Axir yê Cimê Aşikan ra hewt hîkayeyî Weşanxaneyê Roşna ra sey kitab neşr bî. Û nê deyîran ra “Zerenci” û “Lawko”, her yew bi varyantêk Newepel de weşanîyabî. Sebebê tercihkêrdişê min yê kasetan no bi ke mi waşt bimojna ke tayê “hunermendan”ê neweyan senî kultur texrîb kerdo. Çiyêko bîn zî o bi ke medyaya sosyale de tayê merdiman goreyê xo çiyêk bestine deyîranê ma wa û ser o yew hîkaye pêardêne. Coka mi waşt ez deyîrbazanê verênan ra deyîran bigoşdarî û bi hîkayeya înan binusî.”

Kitab goreyê tewiranê deyîran hewt qisman ra ameyo meydan. Zafê deyîran bi varyantanê xo yê cîya cîyayan nusîyayê. Yewna xusûsiyetê kitabî yê muhîmî zî no yo ke zafê deyîrî pa bi hîkayeya xo nusîyayê. Bi cigêrayîşêko hewl tayê hîkayeyê deyîran ameyê teshîh kerdene zî. Cêr ra deyîran ra tayê nimûneyî ameyê dayene.

1. Deyîrê Heskerîşî: No beş de nê deyîrî estê: Eskerî, Lawko, Begê Hînî, Leylay Melay Seferûn, Zerenci, Zeynay Hes Xûn, Dayê Gidîyûno, Hawara Nêribî, Merzêl, Nîgeno.

“Aşm awkewta aşma zerdi
Şewqê xwi daw’ Palî ser di
Çi keyneka bextî ver di
Qelemay mi çare di” (*Leylay Melay Seferûn*, r. 41)

“Way lê mi rî, Zerenc mi rî
Êla dayk o bawkê, wulay, tu gawir î
Êla qay yin nêdiyo, êla çimsay m’, derdê zerrî
Wulay zerr şîrin a, way, sey şekerî
Ti say nîya, gidî, e tu burî
Ax, wulay ti bey nîya, herê, e tu buy kî” (*Zerenc*, r. 56)

“Daykey dayê, gidî sarey mi dejawo
Keyney, gidî sarey mi dejawo
Mi sarey xwi pîştî, wulay, rageyrawo
Mi kerrî bêwî verû nawo
Mi derdê xwi kerrî bêwî rî vawo
Allaw serî mi rî, ax, çî nêvawo

Dar ew bir o, wulay, kelibîyawo
Kerro bêwe, gidî, la hemîyawo
Gidî derdê mi girûn o, aaay...” (*Dayê gidîyîno*, r. 66)

2. **Deyîrê Kayî:** No beş de nê deyîrî estê: Fatimay Mi, Eyşûnay mi, Fatay Îb Axûn, Lay Sêrvey, Mînay Hecî.

“Hay day dayê, hay day dayê / Hay day dayê, Mînay Hecî
Bin’ Kasûnê ma cûmî ya / Bin’ Kasûnê ma cûmî ya
Mînay Hecî vinî biya / Mînay Hecî vinî biya
Kûmî k’ dîya kûm nîdîya / Kûmî k’ dîya kûm nîdîya
Mih Mih Şahîn’ vûn’ “mi dîya” / Mih Mih Şahîn’ vûn’ “mi dîya”
Hay day dayê, hay day dayê / Hay day dayê, Mînay Hecî” (*Mînay Hecî*, r. 103)

3. **Deyîrê Lejê (Pêrodaişê) Dewijan:** No beş de nê deyîrî estê: Mist Kalûn, Hecî m’ leyro, Elay Kalûn, Qasim Axay Kelhûnûn, Mela Hes’ Rizûnî, Daykey Leyro, Heso Leyro, Mihê Qasûn, Elê Qasûn, Mehmed Meydînûn, Henfî Zuri, Huso Birawo, Mihê m’ Leyro, El Ref.

264 |

“Lêle ser’ Aldunî kaş û kuş î
Bin’ Aldunî kaş û kuş î
Gilî El Hesî birişî
Lêle lacê m’ kîsto sey qerquşî
Dar hin çin a ez bin di ruşî” (*Mihê Qasûn*, r. 146)

“Êle sêr Suveyrûn dehlê derg î
Bin’ Suveyrûn dehlê derg î
Lêle dişmên biray m’ yen sey verg3i
Erzên kekê m’ derbay mergî
Erzên biray m’ derbay mergî” (*Mehmed Meydînûn*, r.170)

4. **Deyîrê Lejê (Pêrodaişê) Vera Dewlete:** No beş de nê deyîrî estê: Deyîra Keyeyê Mela Xelîlî, Deyîra Keyeyê Îsayûn û Reşê Mundarûn, Ehmedê Musayê Axûn, Lê Dayê, Misfay Kuçûn, Qas Kûsî. Deyîrê nê qisimî mucadele û kamîya kirdan (zazayan) bi hawayêko eşkera nawnenê. Mavajî, deyîranê *Deyîra Keyeyê Mela Xelîlî* û *Ehmedê Musayê Axûn* de herbê Şêx Seîdî ra dima behsê zulm û tedaya Elî Barût û Delu Fikrî beno ke nê di qumandanê dewlete bî.

“Gidî şûn o, gidî şûn o, gidî şûn o, lo Melekûn o
Gidî dayê korê, kerrê wulay mi va vûn Elî Heyder imew lo Qerebegûno
Gidî wulay vûn Reş aw bi[n] ra vêrt şîyo Siwûno
Gidî vûn adir kerd Şelay Heydûno
Gidî wulay vûn kila sur vecyayî asmênûno
Gidî şûn o, gidî şûn o, gidî şûn o, lo tu rî vûno
Gidî wulay vûn Elî Barût imew Hênî miyûno
Gidî arê kerd axa û axelerê Kurdîstûnyo
Gidî şûno, gidî şûno, gidî şûno, lo Melekûn o
Gidî dayê korê mi va serê Diki şarestûn o
Gidi binê Diki lo Kurdîstûn o
Gidî willay in hukmatê tirkû tada dînê gawirûno” (*Deyîra Keyeyê Mela Xelîlî*, r. 190)

“Ax gidî leyro leyro leyro, leyro leyro, leyro...
Êla leyro leyro, Ehmedê mi leyro leyro leyro...
Leyro cahilê mi leyro heywax leyro
Gidî leyro, corê çemûn mij-dimon o leyro
Eskerê Delu Fikrî eskerê tirkûn o leyro
Lêle leyro, ez nêzûna Delu Fikrî teres ma ra se vûno leyro
Delu Fikrî bîw qesabê ma **kurdûno** leyro leyro Ehmedê mi leyro
Heywax leyro, ax leyro cahilê mi leyro, heywax leyro” (*Ehmedê Musay Axûn*, r. 213)

5. **Şiwareyî:** Bermîyê Zeyna Xizal, Wisif Axa, Fexr Dayza, Emînay Mi, Ehm Kalûn. Deyîrê nê qisimê badê mergî vajîyayî û zaf xemgîn ê:

“Rayer Palî çî kerre wo
Darbay biray m’ da zerre wo
Birayê mi se ra bewo?
Key mi vêşa birîndarê mi

Rayer Palî hûkî-mûkî
Ehm kewt sey barûn’ lûkî
Ehm ew Feyzî wa pûr turi kî
Herinday biray mi vinî kî
Wa dişmenê ma zaf keyf nîkî” (*Bermîyê Zeyna Xizal*, r. 261)

6. **Deyîrê Karî:** No beş de tena deyîra Meşke esta. Wexto ke meşke nîrenê na deyîre vajîyena.

7. **Qesîdeyî:** No beş de axîretî ser o tayê qesîdeyî estê: Bira Bira, Qebra Tarî, Şêxê Ma.

Semedo ke mintiqaya Kirdane de tesîrê keyê Şêx Selahedîni (lajê Şêx Seîd Efendî) zaf o, ey ser o zî beytî (qesîdeyî) vajîyayî. Nînan ra yewe mîyanê kasetê Sofî Ehmedê Dêsimî de bi vengê Ehm Safû yê Mihyûnîjî qeyd biya:

“Şêxê ma şêxê kurdûn o / La Ella, heyrûn Ella
Şêx ûmewo Qerbegûno / La Ella, heyrûn Ella
Zikir dawo caylûno / La Ella, heyrûn Ella
Towbe dawo caylûno / La Ella, heyrûn Ella

Şêxê ma şêxê kirdûn o / La Ella, heyrûn Ella
Şêx ûmewû kewt’ Kurdîstûno / La Ella, heyrûn Ella
Vori varena, zimîstûn o / La Ella, heyrûn Ella
Debon’ xaçê rayerûno / La Ella, heyrûn Ella

Mirîdê xewsê mi gellek î / La Ella, heyrûn Ella
Îmdadê şêxî çîher melek î / La Ella, heyrûn Ella
Gelo qûmo, ma xwi r’ se kî? / La Ella, heyrûn Ella
Vengê şêxê ma kewto felekî / La Ella, heyrûn Ella” (Şêxê Ma, r. 306-309)

Peynîyê kitabî de bîyografîya deyîrbazan û nameyê qeza, dewe û mezrayanê ke nê deyîran de vîyarenî ca gênê.

Seke Îdrîs Yazarî zî kitabê xo de vato, ey waşto ke nê deyîran qeyd bikero û tahlukêyê vindîbîyayîşê ra bixelisno. Wina aseno ke ey putanê (domananê) kirdan rê mîrasêko hewl verdayo.

NASANDINA PIRTÛKA “MERYEMNÎGARÊ”

Mustafa Zengin*

Li gor *Pêşgotina* pirtûka Meryemnîgarê, ev berhem yek ji berhemên xebata perwerdeya folklorê ya sala 2017an e. Ev perwerde ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve hatiye lidarxistin û di encama wê perwerdeyê da ji 10 berhemên folklorê gihîştine ber destê Weqfê. Pirtûka Meryemnîgarê jî yek ji wan berheman e ku di sala 2019an da bi edîtorîya Bahoz Baranî hatiye çapkirin. Çîrok û xebroşkên di pirtûkê da ji aliyê Evîndar Şevînê ve li herêma Mêrdînê li Qosarê hatine berhevkirin. Şîndar di sala 1986an da li navçeya Çînarê ya Amedê hatiye dinyayê. Li Zanîngeha Enqereyê beşa civaknasîyê xwendîye û endamê lijneya kovara “Folklor Me”yê ye. Pirtûka Meryemnîgarê ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem da, yazdeh çîrok, di beşa duyem da jî heşt çîrok hene. Çîroka *Meryemnîgarê* ya ku navê xwe daye pirtûkê, bi du varyantên hindik ji hev cuda di beşa yekem da cih digire. Herweha çîroka bi navê “*Emo û Tisê*”yê jî bi du varyantên xwe di pirtûkê da cih digire.

| 267

Pirtûk bi çîroka *Meryemnîgarê*yê dest pê dike. Ev çîrok bi du varyantên cuda di pirtûkê da cih digire. Herçiqas her du varyant di gelek waran da weku hev bin jî, hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê vegotin û honandina çîrokê ve çend cudahiyên wan jî hene. Mirov dikare weku mînak bide ku li gor varyanta pêşî di varyanta duyem da temayên dînî li ber çavan dikevin. Di varyanta pêşî da weku kesên dîndar û nimêjkar qala qehremanên çîrokê lawê axayî û birayê wî yê şîrî nayê kirin. Lê di varyanta da duyem da ew kes weku kesên dîndar û nimêjkar xuya dikin. Dibe ku di vir da nêzîkatîya civakî û dînî, asta perwerde û temenê zarbêjen çîrokê bibandor bin. Ji ber ku zarbêjê varyanta pêşî kesekî ciwan û xwendekarê zanîngehê ye, lêbelê zarbêjê varyanta

* Vekolerê Serbixwe. Riha/Tirkiye E-mail: zengin.mstf01@gmail.com



duyem, kesekî navsalî ye û weku şêx tê nasîn. Çîrok bi nifireka li kurê axayî dest pê dike û bi rêhevaltîya birayê wî yê şîrî û cirdonekî dewam dike. Di vê serpêhatîyê da lawê axayî dide pey keçeka bi navê Meryemnîgarê û bi saya sebra birayê xwe û saya zanyarî û biaqilbûna cirdonî digihije mirazê xwe.

Di çîroka *Hesen û Hisênê* da behsa serpêhatîya du birayên cewî dike ku navê wan Hesen û Hisên in. Temaya serdest hezkirin û dilsoziya birayan û malbatê ye. Hesen ji aliyê kalekî sêrbaz ve tê mezinkirin lê ew dixwaze vegere cem malbata xwe. Ji vir şûnda serpêhatîya wî dest pê dike û di vê

serpêhatîyê da gelek bûyerên siruştî û dersiruştî tên serê wî.

Çîrokeka din ya pirtûkê çîroka *Mihemedê Gavanê* ye ku behsa gavanekî û qîza axayekî ye. Çîrok têkildarî cudahiya civakî û çînî ya zengîn û xizanan e. Gavanê ku bi dayika xwe ra diji, bi saya hungulîskeka efsûnî pir zengîn dibe. Bi bawerîya zengînbûnê diçe qîza axayê gund ji xwe ra dixwaze û pê ra dizewice. Lê qîza axayî gava bi kerametê hungulîskê dihese, wê digire û bi yekî din ra direve û diçe. Gavan dîsa weku berê xizan dibe, lê hungulîskeka din peyda dike û ew dîsa zengîn dibe. Vê carê hem heyfa xwe ji keça axayî digire hem ji wê serpêhatîya berê dersê werdigire û êdî tenê bi dayika xwe ra diji.

Çîrokên bi navê *Bihemed û Ahmed* û *Mîrbihemedê* jî weku çîrokên birayan tê vegotin. Di çîrokê pêşî da ji aliyê civakî û çandî ve temayên gundîtî û bajarîtîyê, zengîni û xizanîyê serdest in. Li gor çîrokê birayê bi navê Bihemedî ku li gund diji û karê ajalvanî û cotkarîyê dike, ji ber çêbûna xelayê neçar dimîne û tê bajarî û bi birayê xwe Ahmed ra dest bi bazirganîyê dike. Lê bajar zêde li wî nayê û li vir hinek karesatên mezin tê serê wî. Hevjîna wî direve cem yekî din lê ew ji bo îsbatkirina xwe ya civakî diçe hevjîna xwe dike û tê bi yeka din ra dizewice. Di çîroka din da jî temayên weku mîrxasî, zanyarî, tecrubedarî, hesûdî û hefygirtinê serdest in.

Çîrokên bi navê *Mîrbihemed* û *Mîr Mihemed* û *Gulîzarê* jî aliyekê naverokê ve gelekî dişibin hev. Di her duyan da jî serpêhatîya sê birayan tê gotin û temayên

zanebûn, mêrxasî, evîn, desthilatî û xayîntîyê berbiçav in. Di her du çîrokan da jî her sê bira rastî belayekê tên û di dawîyê da birayên piçûk wan rizgar dikin. Lê her du birayên mezin xayîn derdikevin û birayên piçûk li pey xwe dihêlin û dixwazin hezkirîyên wan li xwe mahr bikin. Birayên piçûk ên di her du çîrokan da jî, zana û jîr tevdigerin û xwe xilas dikin. Di dawîya çîrokan da jî diçin heyfa xwe digirin û hezkirîyên xwe ji destên birayên xwe derdixin.

Çîroka *Mîr Mihemed û Erebxanê* behsa serpehatîyê du kesên mêrxas dike. Çîrok herçiqas behsa mêrxasî û dirustîyê bike jî, alîyekî metafîzîk ê çîrokê jî heye. Ji ber ku di çîrokê da keça cinan jî heye û bi zanîna xwe ya siberojê alîkarîya Mîr Mihemedî dike. Çîrok bi behsa çenebûna zarokê paşayekî dest pê dike. Di çîrokê da bi navê Mîr Mihemedî lawekî paşayî çê dibe, lêbelê di dawîyê da ji ber xayîntîya paşayî Mîr Mihemed û hevalê xwe yê bi navê Erebxanî, bi leşkerên paşayî ra şer dikin û Mîr Mihemed bavê xwe yê paşa dîkujê.

Di her sê çîrokên bi navê *Dudêr, Memlîcan û Tenaflîlayê* da jî mirov dikare bibêjî ku temaya şerê başî û xerabîyê, hesûdî û zikreşîyê berbiçav e. Qehremanên sereke yên her sê çîrokan jî jin in û ew şer û lihevnekirina heye jî di navbera jinan da ye. Çîroka pêşî qala jinekê dike ku hatîye ser hewîyê, lêbelê dayika hewîyê ji ber ku zarokên bûka nû çê dibin hesûdîyê dike. Çîrok bi vê hesûdî û xerabîya dayika bûka mezin û başîya bûka nû dewam dike. Lê di dawîyê da bi alîkarîya keçeka mîrê cinan ya bi navê *Dudêrê* başîya bûka nû bi ser dikeve. Her du çîrokên din jî bi heman awayî diherike û bi serkeftina başîyê bi dawî dibe.

Beşa duyem bi çîroka *Mêrû Kêçê* dest pê dike. Ev çîroka helbestkî ye . Di çîrokê da *Mêrû û Kêçê* bi hev ra dijin lê *Mêrû* dimire. Paşê ji *Kêçê* heta *Nêrî, Siwar, Dar, Garis, xwendîyê garis, keça wî û jina wî* bi rêz li ser *Mêrû* dixwînin. Herçiqas xwendina wan a helbestkî li ser mirîyekî be jî, çîrok zêdetir weku pêkonekekê ye û xemgîniya dostan nîşan dide. Çîroka *Sêbelê û Qumçelê* jî çîroka du bûkên hewîyên hev û xwesûyekê ye ku di navbera wan da hesûdî heye. Xwesû pêşîyê ji bûka mezin a bi navê *Sêbelê* ra dibe bela û piştî ku lawê wê bi keça bi navê *Qumçelê* ra dizewice, hewl dide wê ji aciz bike. Lê ji ber ku *Qumçelê* zana û serwest e û bi dek û fenan dizane, bi bûka mezin ra dibe yek û hemû listikên xwesîya hesûd xera dike. Ev çîrok hem behsa başî û xerabîyê dike, hem balê dikişîne ser zehmetîya birçîbûnê û hem jî di şexsê her du bûkan da nîşan dide ku gava zanîn û tifaq hebe, serkeftin jî dê çawa were.

Çiroka bi navê *'Emo û Tisê* jî bi du varyantan di pirtûkê da derbas dibe. Herçiqas her du weku du varyantên cuda xuya dikin jî, ya rast di navbera her duyan da tenê di warê gotinê da çend cudahiyan piçûk hene. Bi giştî û ji aliyê naverokê ve, ji aliyê meqsed û honandina çirokê ve her du varyant jî hema weku hev in. Bi kurtasî li gor çirokê mêrekî bi navê *'Emo û hevîna wî* ya kêmaqil ya bi navê *Tisê* heye. *Tisê* jî ber wê kêmaqilîya xwe dibe sebaba ji destçûna qûpekî zêr ku heta herî dawiyê dibe sebaba hepskirina mêrê xwe. Lê mêrê wê dîsa bi saya kêmaqilîya wê rizgar dibe. Çirok dide zanîn ku kêmaqilî û nezani herçiqas carinan bi kêrî mirov bê jî, gelek caran belayan tîne serê mirovan.

Çiroka *Qîço, Miço û Piçoyê* jî çiroka sê bira û axayekî ye. Çirok qedir û qîmeta zanebûnê û guhdarîkirina wê nîşan dide. Li gor çirokê bavê her sê birayan berîya ku bimire, şiretekê li wan dike ku sê rê hene lê divê ji wan rêyan yek, ya xerab e û wê bi kar neynin. Piştî mirina bavê xwe birayê mezin ê bi navê *Qîço* bi ya bavê xwe nake û dikeve wê rêya xerab. Lê ev rê gelek belayan tîne serê wan û dibe sebaba mirina her du birayên mezin. Tenê birayê piçûk, yê bi navê *Piço* bi zanebûn û tecrube tevdi gere û xwe ji kuştinê xelas dike.

270 | Çiroka bi navê *Pîrê û Rêvîyê* jî li ser temayên wekî çavnebarî û xerabiyê disekine, behsa xerabîya qerfîkirinê û hesta heyfgirtinê dike. *Rêvî* her tim tê şîrê pîrekê dixwe û dirijîne, lêbelê rojekê pîrê derfetê dibîne û terîya roviyî jê dike. Ev jî ji bo rêvî dibe qebheteka mezin û hevalên rêvî qerf û henekên xwe pê dikin. *Rêvî* jî bo ji vê şermê xilas bibe, dikeve nav hewldaneka mezin û heyfa xwe ji hevalên xwe digire. Di çiroka *Çûko û Tûtûkê* da jî çûkek heye ku her tim bi girî û ponijînê tiştan ji mirovan distîne. Lê di talîyê da qîma xwe bi bilûrekê tîne. Herçiqas mirov dikare bibêje, di çirokê da behsa fenokî û çavnebarîyê tê kirin jî, di dawîya çirokê da mirov dibîne ku kêmaqilî çî tîne serê mirovî. Çiroka dawî ya pirtûkê çiroka bira û xwişkêka bi navê *'Elik û Fatikê* ye. Ev çirok balê dikişîne ser deskeftiyên zanîne û başbûna bîaqilbûnê. Ji ber ku li gor çirokê xwişka bîaqil, ya bi navê *Fatikê* xwe û birayê xwe yê kêmaqil ji destê pîreka ku dixwaze wan bikuje xilas dike.

Di encamê da dikare bê gotin ku çirokên di pirtûkê da bi piranî li ser temayên şerê başî û xerabiyê, hesûdî û bîbawerîya mirovan, hesta hezkirinê ya malbatî û evîniyê, başîya tifaqê û hesta heyfgirtinê disekine. Ji zehmetîya xwendina çirokan diyar e ku berhevkar pirtûkê jî bo parastina devoka herêma çirokan gelekî bi baldarî tevgerîyaye û ev yek dikare di vekolînên li ser zimannasiyê da bê bikaranîn.

Herweha alîyekî erênî yê pirtûkê ye ku ew bêjeyên di çîrokan da derbas dibin, lêbelê ne bi kurmancî ne yan jî bi devoka wê herêmê ne, bi jêrenotan hatine danasîn. Dîsa tiştêkî din ê erênî ew e ku kunyeya her çîrokê hatiye dayîn. Bi gotineka din, nav, cihê jidayikbûnê, temen û asta perwerdeya zarbêjan û ew wan çîrokan ji kê hîn bûne û herweha cih û dîroka berhevkirina çîrokan hatine nîşandan. Herweha dibe ku hêja be, em balê bikişînin ser wê yekê ku hinek çîrok tenê ji zarbêjekê/î hatine guhdarîkirin û qeydkirin. Weku mînak, tenê ji zarbêjê bi navê Feysel Ozkanî bi qasî pênc çîrok hatine neqilkirin. Herwiha gelek çîrok jî ji endamên malbatekê hatine guhdarîkirin û qeydkirin. Herçiqas di warê berhevkirina çîrokan da ev yek di warê metodolojiyê da weku hêsanîyekê bê xuyakirin jî, di warê sosyokulturel da tenê nêrînekê dide nîşanê xwîneran. Lêbelê di encamê da dikare were gotin ku pirtûka Meryemîgarê di warê çîrokên li herêma Qosarê da dikare bibe çavkanîyeka hêja û sûdewer.

RÊBAZA NIVÎSÎNA GOTARAN

- Nivîs divê, wekî belgeya Microsoft Word, li ser kaxeza A4ê, di mezinahîya 12 pûntoyan da û bi her du alîyan paldayî be. Di navbera risteyan da divê navber 1.5 be.

- Dirêjahîya gotaran divê ji 25 rûpelî zêdetir nebe.

- Divê di gotaran da ev rêza serenavan bihê şopandin: Sernavê gotarê, navê nivîskarê/î, kurte, metina gotarê, çavkanî û eger hebe pêvek.

- Divê kurte hem bi kurdî, hem jî bi îngilîzî bihê nivîsin û di dawiyê da “bêjeyên sereke/key words” hebin.

- Ji bo jêgirtin û referansan divê sistema APA 6ê bihê şopandin.

- Şandina gotaran, pêvajoya nixandî û weşandinê li ser <https://dergipark.org.tr> yê dê bihêne birêvebirin.

- Di pêvajoya nixandîna da hekem û nivîskar hev nas nakin.

272 | - Berpirsariya bîr û boçûnên di gotaran da, ya xwediyên gotaran e.

- Rastnivîsîna gotarên ji bo diyalekta kurmancî, dê li gor Rêbera Rastnivîsînê be ku ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê ve hatiye weşandin.

Nîşandana Sernavê Gotarê û Navê Nivîskar/Nivîskaran

1. Sernav divê di navendê da û bi tîpên mezin be.

2. Navê nivîskarê/î/an divê di bin sernavê gotarê da li aliyê rastê bihê/n nivîsin. Eger sazîyeka nivîskarê/î/an hebe, divê li jêrenotê bihê destnîşankirin.

3. Di serê gotarê da divê kurteyeka di navbera 100-200 bêjeyan da hebe û 4-5 bêjeyên sereke hatibin diyarkirin. Herweha divê îngilîziya kurteyê jî piştê ya kurdî tê da hebe.

Di çerçoveya APA 6ê da, ji bo rêbaza nîşandayîna çavkanîyên curbicur hin agahîyên sereke:

1. PIRTÛK

Pirtûkên ku nivîskarên wan yek kes in:

Paşnav, N. (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk* (hejmara çapê heger hebe.). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Mînak:

Pertev, R. (2018). *Folklor û nasnameya kurdî ya neteweyî* (1898-1946). İstanbul: Avesta.

Freud, S. (1914). *The psychopathology of everyday life*. (A. A. Brill, Trans.). London: T. Fisher Unwin.

Di nava metinan da:

Mînak:

Pertev (2018) di wê xebata xwe da tegiha “cewherîgerî”yê bi kar diîne (r. 167).

“Celadet jî wek Dr Lonnröt li Kalevalayeka kurdî digeriya ku kurd xwe pê şanaz bikin” (Pertev, 2018, r. 301).

Pirtûkên ku nivîskarên wan ji yekê zêdetir in:

a. Pirtûkên ku nivîskarên wan du kes in:

Paşnav, N. , & Paşnav, N. (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk* (hejmara çapê heger hebe.). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Mînak:

Greenbaum, S. , Geral, N. (2009). *An introduction to English grammar* (3rd ed.). UK: Routledge.

Di nava metinan da:

Greenbaum û Geral (2009) li ser vê bawerîyê ne ku ... (r. 74).

... (Greenbaum & Geral, 2009, r. 88).

b. Pirtûkên ku nivîskarên wan sê kes yan jî zêdetir in:

Mînak:

Paşnav, N. , Paşnav, N. , & Paşnav, N. (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk*. Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Yıldırım, K. , Pertev, R. , û Aslan, M. (2013). *Ji destpêkê heta niha folklorê kurdî*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

Tomblin, S. , MacLeod, N. & Sousa, S. R. , & Coulthard, M. (2012). *Proceedings of the International Association of Forensic Linguists*. Birmingham: Centre for Forensic Linguistics.

274 |

Di nava metinan da:

Mînak:

Yıldırım, Pertev û Aslan (2013) dibêjin ku... (r. 193).

Tomblin û yd (2012) amajeyê bi vê xalê dikin ku ... (r. 17).

... (Tomblin & yd, 2012, r. 4)

Pirtûkên ku ji zimanekî din hatine wergerandin:

Paşnav, N. (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk*. (werg. N. Paşnav). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Hassanpour, A. (2005). *Kürdîstanda dil ve milliyetçilik (1918-1985)*. (werg. Î. Bingöl. , C. Gündoğan). İstanbul: Avesta.

Freud, S. (1914). *The psychopathology of everyday life*. (A. A. Brill, trans.). London: T. Fisher Unwin.

Di nava metinan da:

Mînak:

Hassanpour (2005) di xebata xwe da... (r. 67).

Freud (1914) tekezîyê li ser vê xalê dike ku... (r. 109).

Pirtûkên ku edîtorên wan hene:

Paşnav, N. (Ed.). (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk* (hejmara çapê). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Mînak: Aspinall, V. (Ed.). (2014). *Clinical procedures in veterinary nursing* (3rd ed.). Edinburgh, Scotland: Elsevier.

Kanegsberg, B. , & Kanegsberg, E. (Eds.). (2011). *Handbook for critical cleaning* (2nd ed.). Boca Raton, FL: CRC Press.

Di nava metinan da:

Mînak:

Aspinall (2014) dibêje ku ... (r. 11).

... (Aspinall, 2014, r. 19).

Beşek yan gotareka ku di nava pirtûkeka bîdîtor da ji hêla nivîskarekê/i ve hatîye nivîsîn:

Paşnav, N. (sal). Navê gotarê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. Di nava N. Paşnav. (Ed.), *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk* (eger hebe hejmara çapê, rûpelên destpêkê û xelasbûna gotarê). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Mînak: Palmer, F. (2007). Treaty principles and Maori sport: Contemporary issues. In C. Collins & S. Jackson (Ed.), *Sport in Aotearoa/New Zealand society* (2nd ed, pp. 307-334). South Melbourne, Australia: Thomson.

Mînak: Carter, R. , Hughes, R. , & McCarthy, M. (1998). *Telling tails: Grammar,*

the spoken language and materials development. In B. Tomlinson (Ed.), *Materials development in language teaching* (pp. 67-86). Cambridge: CUP.

Di nava metinan da:

Mînak:

Palmer (2007) di derbarê vê mijarê da weha tîne ziman ku ... (r. 318).

... (Palmer, 2007, r. 318).

Beşek yan gotareka ku di nava pirtûkekê da ji hêla du nivîskaran ve hatîye nivîsîn:

Paşnav, N. , & Paşnav, N. (sal). Navê gotarê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk ne îtalîk. Di nava N. Paşnav (Ed.), *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk, û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk*. (eger hebe hejmara çapê, rûpelên destpêk û xelasbûna gotarê). Cihê çapê: Navê Weşanxaneyê.

Mînak: McKinney, C. , & Smith, N. (2005). Te Tiriti o Waitangi or The Treaty of Waitangi: What is the difference? In D. Wepa (Ed.), *Cultural safety in Aotearoa New Zealand* (pp. 39-57). Auckland, New Zealand: Pearson Education New Zealand.

276 |

Di nava metinan da:

Mînak:

McKinney û Smithî (2005) di gotara xwe da têgiha . . . (r. 39).

... (McKinney & Smith, 2005, r. 39).

Pirtûkên online:

Paşnav, N. (sal). *Navê pirtûkê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk*. Hejmara 'doi'yê.

Mînak:

Kay, G. N. (1999). *Fiber optics in architectural lighting: Methods, design, and applications*. doi:10. 1036/0070349320

2. GOTAR

Gotarên ku nivîskarên wan yek kes in:

Paşnav, N. (sal). Navê gotarê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. *Navê kovarê bi awayê îtalîk û tîpên destpêka her bêjeyekê mezin*. Hejmara kovarê, rûpelên destpêk û xelasbûna gotarê.

Mînak:

Malmîsanij, M. (2005). Pîlonê xwi ra vaci “Teslîmbîyayîşê Şêx Evdirehîmî çin o”. *Vate*, 5(25), 38-71.

Dubreuil, G. (1962). Les bases psycho-culturelles du tabou de l'inceste. *Canadian Psychiatric Association Journal*, 7/5, 218-234.

Di nava metinê da:

Mînak:

Malmîsanij (2005) di wê baweriyê da ye ku ... (r. 42).

... (Malmîsanij, 2005, r. 38-39).

| 277

Eger nivîskarên gotaran du kes yan zêdetir bin:

Paşnav, N. , Paşnav, N. , & Paşnav, N. (sal). Navê gotarê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. *Navê kovarê bi awayê îtalîk û tîpên destpêka her bêjeyekê mezin*. Hejmara kovarê, hejmara rûpelên destpêk û dawîyê yên gotarê.

Gabbett, T. , Jenkins, D. , & Abernethy, B. (2010). Physical collisions and injury during professional rugby league skills training. *Journal of Science and Medicine in Sport*, 13(6), 578-583.

Di nava metinê da:

Mînak:

Gabbett û yd, (2010) di vê baweriyê da ye ku ... (r. 580).

... (Gabbett û yd, 2010, r. 580).

3. MAGAZÎN (Nivîsara kovareka populer, bêhekem, bihejmar)

Paşnav, N. (sal û meh). Navê nivîsara ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. *Navê magazînê/kovarê bi awayê îtalîk û tîpên destpêka her bêjeyekê mezin*. Hejmara magazînê, hejmara rûpelên destpêk û dawîyê yên nivîsarê.

Mînak:

Pringle, H. (2011, April). Lofty ambitions of the Inca. *National Geographic Magazine*, 219(4), 34.

Semerçioğlu, C. (2015, Haziran). Sıradanlığın rayihası. *Sabit Fikir*, 52, 38-39.

Kurij, S. (2003, Payîz). Çewlig de erdlerz. *Vate*, 1, 78-83.

4. TEZ

Paşnav, N. (sal). *Navê tezê bi awayê îtalîk û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk*. (Teza master/doktorayê). Navê zanîngehê, Cihê çapê.

Mînak:

Omer Ehmed, B. (1999). *Têns le dayalêktî jorîy zimanê kurdî da (govara Badîni)*. (Teza masterê). Zanîngeha Selhedîn, Hewlêr.

Johnson, S. (2013). *Style strategies* (Master's thesis). UCOL, Whanganui School of Design, Whanganui, New Zealand.

Mann, D. L. (2010). *Vision and expertise for interceptive actions in sport* (Doctoral dissertation). The University of New South Wales, Sydney, Australia. Retrieved from <http://handle.unsw.edu.au/1959.4/44704>

Di nava metinê da:

Mînak:

Omer Ehmed (1999) di xebata xwe da demên rêzimanî analîz dike û dibêje ku . . . (r. 11).

Omer Ehmed ji bo lêkera hebûnê “bêhêz” gotiye (1999, r. 56).

Di raweya mercî ya borî da li Behdînanê ji dêvla “dê”yê, “da” dihê bikaranîn (Omer Ehmed, 1999, r. 63).

5. ROJNAME

Paşnav, N. (sal, roj û meh). Navê nivîsê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. *Navê rojnameyê bi tîpên îtalîk*, hejmara rûpelên destpêk û dawiyê yên gotarê.

Mînak: Hêzil, S. (2020, 16ê Adarê). Edebîyat û prestîj. *Xwebûn*, r. 5.

Di nava metinê da:

Mînak: Hêzil (2020) di nivîsara xwe da amajeyê bi bandora prestîjê ya li ser terîfa nasnameyê û jixwe-bawerîya girseyê dike (r. 5).

Mînak: ... (Hêzil, 2020, r. 5)

Rojnameyên online:

Paşnav, N. (sal, roj û meh). Navê nivîsê ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk û ne îtalîk. *Navê rojnameyê bi tîpên îtalîk û destpêka her bêjeyekê mezin*, Adresa malpera rojnameyê

Mînak:

Rogers, C. (2011, November 26). Smartphone could replace wallets. *The Dominion Post*. Retrieved from <http://www.stuff.co.nz/technology/gadgets/6038621/Smartphone-could-replace-wallets>

| 279

6. FERHENG

Eger çapkîrî be:

Paşnav, Nav. (sal). Navê ferhengê bi tîpên îtalîk (hejmara çapê). Cihê çapê: Navê weşanxaneyê

Mînak:

Îzoli, D. (2013). *Ferheng kurdî-tirkî tirkî-kurdî* (ç. 7). Diyarbekir: Deng

Eger online be:

Navê ferhengê bi tîpên îtalîk. (sal). Adresa jêgirtinê

Mînak:

Cambridge dictionaries online. (2011). Retrieved from <http://dictionary.cambridge.org/>

Di nava metinê da:

(Cambridge dictionaries online, 2011).

7. WIKIPEDIA:

Navê mijara bi awayeka îtalik û ji bilî tîpa pêşî ya bêjeya destpêkê û navên taybet, bi tîpên biçûk. (sal). Dîroka jêgirtinê, jêgirtin ji Wikipedia:Linka mijarê

Mînak: *Neteweyên Yekbûyî*. (2019), 29ê Adara 2020an, jêgirtin ji Wikipedia: https://ku.wikipedia.org/wiki/Neteweyên_Yekbûyî

Mînak: *Moodle*. (2011). Retrieved November 28, 2011, from Wikipedia:

<http://en.wikipedia.org/wiki/Moodle>

Di nava metinê da:

(*Neteweyên Yekbûyî*, 2019).

8. LÎSTEYA DAWÎ YA ÇAVKANÎYAN

Divê ku di dawîya gotarê da, listeya çavkanîyan ji rûpelekî nû dest pê bike û alfabetîk be, bêyî ku çavkanî ji hêla cureyê ve (pirtûk, gotar, rojname û hwd) ji hev bihên veqetandin).

Dema ku du berhemên nivîskarekî hebin di listeya dawî ya çavkanîyên dawîn da pêwîst e li dewsa nav û paşnavê nivîskarê/î xêzeka dirêj bihê nivîsîn.

Mînak:

Amêdî, S. B. (1987). *Rêzmana kurdî, kirmancî ya jorî û jêrî hevberkirî* (ç. 1). Bexdad: Daru'ş-Şuûni's-Seqafîyye el-Amme.

————— (2012). *Rêzimana kurdî, kurmançiya jorî û jêrî ya hevberkirî. Hevberkirina kurmançî-soranî*. (latînzekirin. M. Xalid Sadîni). Stenbol: Dîwan.

Eger ji aliyê heman nivîskarê/î di salekê da gelek berhem hatibin weşandin, dê weha bihên nişandan.

Mînak:

Uzun, M. (1998a). Alfred Nobel û xelata nobelî ya edebîyatî. *Vate*. 4, 39- 48.

Uzun, M. (1998b). Yelge. *Vate*. 6, 29-35.